

LÊKOLÎN

Li ser Ehmedê Xanî

Weşanên

Înstîtûta Kurdî

Lêkolîn

Kovara Înstîtûta Kurdî ji bo lêkolîn û zanist-Hêjmara 12 Bihara 2008

Berpirsiyarê giştî
Fehmî Balayî

Sernivîsar
Fevzi Özmên

Desteya bireveber
Cemal Ballıkaya
Yeko Ardil
Alî Huseyîn
Rukiye Özmen

Berg:

lekolin@hotmail.de
www.institutakurdi.com

Înstîtûta Kurdî
ISBN: 3-930943- 59 - X

NAVEROK

Pêşgotin

Hevpeyvîn

Jan Dost.....

*Xebatên li ser Ahmedê Xanî û berhemên wî
- ji destpêkê heta dawiya 1995-ê –*

Mûrad Ciwan

Pêşgotin

Xanî: tovê zexim, hestep, di sêsedşaliya xwe de

Sala 2007 an, sêsedşaliya Ehmedê Xanî mohra xwe li salê xist. Xanî li tevahiya salê belabû, nivîskar, lêkolîner xistin nav tevgerê, bû dabaşa konferans û semîneran, di rojeva rojname, televizyon, radyo û weşan û çapeniya kurdî de wek xaleke navendî cihê xwe girt. Ne bi tenê ev, belê dageriya sala piştî xwe jî û di “Festîvala Ehmedê Xanî “ de li Amedê gulana 2008 an derkete asta ji bo îro hew jê jortir.

Di salvegera sêqirnî de Ehmedê Xanî, Mem û Zîna wî, berhemên wî, bûn materyalên analîz û lêkolînan, axaftin û teblîxatan, meqale û hevpeyvînan.

Kesên şarezaya, gotinên xwe gotin, pisporan şîroveyan xwe pêşkêş kirin, weşanxaneyên kurdî, di pirtûkên yekcildî de Xanî çapkirin. Kitêbxaneya kurdî bi vê Salvegerê, ber û encamên wê, neteweyîtir, dewlemendtir û xaniyanetir bû.

Ji xwe 15-20 salên dawî bi aliyekî xwe jî bûne salên salvegeran, pîrozbahî, şev, mitîng, konferans, kongre, festîval û çalakiyan, televizyonên çendzaravayî, radyoyên coğrafya fireh û weşan û çapemeniya hercoreyî.

Ji van salan re hinek ronesansa kurdî, hinek rabûna Kurdan û sedşala Kurdan dibêjin. Ev çendî rast e yan

na ew dabaşeke din e, belê şik û guman tune ku têkiliya vê bi xwurtbûna tevgerarizgarîxwazî re, hişyarî û organîzebûyîna kurdan û medya satelîtî re dîrekt heye.

Salvegerên me zêde dibin. Salên me, meh bi meh bi watetir dibin. Her sala dubihure bi awayekî didexise sala piştî xwe. Her sala tê li salên berî xwe meznahiyekê zêde dike, tiştêkî bi ked û bi kêr dixê ser, jê re dibe saxlemî û qewîniyek, dibe gerantî û demanek, zewr û xelegeke nû li ser riya berdewamiyê.

Em Kurd êdî ne bi awayê berê, belê bi reng û bi coreyekî din dijîn. Bi çavekî din dibînin û guhên me jî ji yên bav û kalên me ferq dikin. Hişyartir, miçtir û liserxwetir in.

Li welatê me û di nav Kurdan de îro, zeman û çerxa felekê bi celebekî din digere. Doh û îro ev ger ne mîna hev e. Ger li aliyê me ye, li xêra me ye û em ji doh zêdetir serdestê wê ne.

Îro bi leztir e û tu ji kîjan alî de lê binerî mohra Kurdan hildigre, şeqlêke kurdreng lê dixwiye, dibiriqe, lê tê kolan, lê tê nivîsandin.

Mîna ku Kurdan jiyana bi qubale girtibe û heyfa hezarên salan hilînin, mîna gêrikên moristanan bi şev û rojan dixebitin û çendî ji dest wan tê, hêz û taqeta wan dighiyê, zemên û salan bar dikin mîna ku wuha bêjin ji zemên re: soz û ahd li me be ku em dê her bêhnîk û kêlîka te tije, mişt û li dev derbas bikin. Roja tiştêkî biked nekeviyê, bi xwe re ji bo me û li dijê dijmin tiştêkî neyîne tune, nemaye.

Kesê û kesa, hinekî bi baldarî dijî, çavên wî, wê, ne şelbitîne û nan ne bi guhê xwe belê bi cihê rast dixwe, reş û sipî ji hev derdixe, zane doh êvarê çî xwariye, bi vê rastiye dihesê, dibîne.

Di nav vê rastiye de em radibin û rûdinin, zarokên welatê me mezin dibin, cîlên nû û siberojê mezin dibin, roj li me derdikeve û diçe ava.

Berê, rojên me salvegerên wan bibîr dianîn, em bi hatina wan dihesiyan gelekî kêmbûn.

Kêmbûn li aliyekî. Bibîranînên ewên hebûn jî bêreng, bêdeng û heta tu bêje bes, bi rebenî bûn. Çarçeweya wan teng, coxrafya wan lokal, herêmî, deverdeverî û belekbelekî bûn. Ne welatgîr û ji awura neteweyî bikêmanî û biqusûr bûn, korik û bêşewq bûn, zêdetir simbolîk bûn.

Bibîranîn û pîrozbayîyên îro li giş perçên welat û li her cîh û devera Kurd hene, li welat û li derveyî welat tene bihîstin, di lêdana bi milyonan dilên Kurd de geş û gurr dibin.

Rojên di jiyana me Kurdan de şopên dîrokî çêdikin, giranî û wezneke wan heye ne çendek, belê bûne bi dehan û pîrozkirina wan, beşdariya di wan de, berfirehî û seranseriya vê beşdariyê jî ne bi tenê li Kurdistan, belê di nav gelên cîran û dîr de jî deng didin. ..

Her şahî û her salveger nîşana guhertinên mezin, destkewtên dîrokî, zindîbûn û balixbûna neteweyî û jiyaneke bi hiş û hişmendane ye.

Tiştên heta îro kêmbûn, lewaz, netemam û nîvrêbûn, îro temam dibin. Kurd balixtir in, hişyartir û serwextir

in ji her car. Êdî kes nikare pişta Kurdan deyne.

Kurd li xwe, li hev, li rojedîrokiyên xwe, li kesayetî û mezinên xwe, serok û rêberên xwe; çi rewşenbîrî û fikrî û çi jî siyasî û leşkerî, xwedî derdikeve û ev çendî pêwîst û jiyanî ye dibîne, his dike û bi roj, meh û sala derbas dibe re serwextir dibe.

Sêsedşahiya Xanî, çalakî û bîranînên li der û dora wê, li welat û li derveyî welat, wek faktorekî yekîtiya Xanî dixwest, tifaqa Xanî hesretmayê wê bû, rola xwe lîstî û piştî sêsed salan jî be, kesek çendî dikare girîng be, piştî mirina xwe jî çendî kaniya jiyanê, serbilindayê, xerc û çimentoyê neteweyî be, careke din di kesayetiya Xanî û vê salvegerê de hate peyitandin.

Kes û netewe

Vê jî em li rastiyeke din nêzîk kirin. Rastiya ku hinekî jî kes in, yên neteweyekî dikin netewe.

Gava pirs tê ser kes û rola kesan, cîh û wezna wan ji bo neteweyekî, pircaran bivê nevê, hinek pirs dinuqutin dilê mirov:

Gelo bi qasî ax, dîrok, folklor, ziman û ekonomiya hevbeş ku çend stûnên bingehîn in di çêbûn û avabûna neteweyekî de, nisbeteke kesayetiyan mezin; kesayetiyan mîna Xanî, Mîqdat, Hecî Qadirê Koyî, Celadet, Cegerxwîn, Emîn Batû, Mezlûm, Necmedîn Buyukkaya, Egît, Zekiye, Sema, Wedat û Mûsa jî ne pêwîst in, ne faktorekî pêncem bin gelo ?

Ji bo ku netewe neteweyekî temam û hemdem be, gelo hinekî jî ne kesayetî ne, yên ku neteweyekî dikin netewe?

Gelo bê rewşenbîr û zanayên têkoşer, kapasîteyên mîna Xanî, neteweyek çendî dikare netewe be, çendî navê netewetiye heq dike ?

Kesayetiye mîna Xanî bi hesanî çênabin.. Ji çend sed salan carekê tîn. Kesên wuha êdî ne herkes in. Ew jî wek herkesî di aliyê fizîkî de seriyek, du çav, du guh û dilek bin jî, di wan de damarên jiyana siberojê bilaş û gewd dibin. Çarenûsa welat û milyonan bi wan ve tê girêdan, jiyana, rûmet û serbilindayî di wan de dijene.

Kesên wuha, dipekin derveyî zeman. Zeman hew kare bi wan, ji wan re serî datîne, ji wan re kar dike, ji bo wan diherike. Ne zeman li wan, belê ew li zemên siwar in.

Zemanê mûtîh û sernerm, destên xwe ji wan re datîne ser hev û dema pêjna wan tê, xwe dide tenîştê, rê dide wan, “kerem bike” dibêje, “êdî tu fenafîlahî yî, mertebe û rutba te ya kilasîkan e, tu azad î, êdî tu di nav sînorên welat û gelê xwe de hilnayî, tu malê cîhanê yî, wîzeyaya te heta heta ye, baweriya bi te temam e, tu hevtayê pêxemberan û ji qencên xwedê yî. Fermana ji bo te ji jor de ji me re hatiye ev e, belê ne kême ne zêde ev e. “

Kesayetiye wuha xwe bi xwe parêzerî û berdevkiya xwe dikin. Ew ji bo gel û welatê xwe û bi dereca xizmet û kirinên xwe ji bo timamê cîhanê nejbîr dibin, abadîn û hetahetayî dibin. Zeman bi wan biqîmet û hêja dibe, navê xwe duguhere, dibe dîrok, ango zemanê bihiş, ronak, diyar, sayî û qeydkirî.

Ku wuha bû, êdî tim çav, guh û bal li ser wan in. Şair wan dikin helbest, peykertiraş wan nemir dikin,

lêkoîner wan dikin pirtûk û arşîvan. Her kes ji aliyê xwe dibe pale, xizmetkar û berdevk ji wan re.

Jiyana wan dibe filîm, navê wan xelkê radike, dadixe kolan û meydanan, tîne ba hev, dike yek. Mirov ji wan re temene dibin, îbadetê dikin, diçin sucdê.

Gel ji bo wan dikeve şer, posterên wan meydanên navdar dixemilînin, di bîr û hafize xelkê de, xwendevan û kategoriyên gel de, qar dibin. Navên wan li cîhên bilind diçirisin, dibin nivîs û reklam. Di bang û qêrînên sedhezaran de dibin “bijî !”, dibin silogan, dibin gotinên ji awura wate û naverokê barkirî, biteqil û mîna risas.

Helbet her kes gotina “bijî” heq nake. Ev gotin ne ewçendî erzan e. Belê yê ku heq kir jî divê jê re !”bijî !” bê gotin. Xesîstî û quretî ne pêwîst e, parsûstûrî bikêr naye. Tu dixwazî ev kes siyasî be, nivîskar yan şervan be, sportmen yan jî hunermend be.

Bijî mafê herkesî ye ku di karê xwe de bi ser dikeve û li gora misyona xwe rola xwe dilîze. Ji xwe ku heq kir jî kes nikare jê bistîne, rê li gotina wê bigre, ew dibe hêzeke madî. Êdî ew ne bi tenê gotin û helwestek e, hêz û enerjîyek e, motor û handayînek e jî.

Di gotina “bijî” de teqdîrkirin heye, nirxandin û hêsgandînin heye. Miletê cihê wê hat û nizanibe bêje “bijî !”, wê mîna sturhên keran biqele. Kesê nizane bêje bijî ne li dinyayê ye, baş û xerab ji hev dernaxe, lipaşmayî, bêhest, bêpîvan û bêmezên e. Ji ber ku teqdîrkirin hişmendî ye, cesaret e, bi fikirkirina li ser

siberojê ve girêdayî ye, meseleyeke wîjdanî û mirwetê ye jî.

Gelê kurd di van salên dawî de gelek mirovên mezin û bikêrhatî derxistin, li hêja û gewreyên xwe, li xwedîşop, ciwamêr û ciwanikên xwe xwedî derket, xwe ji wan re kire mertal, kir çembera ji agir li dora wan û bi bedêlên giran ew bi tenê ne hiştin.

Destkewt û encameke din:

Ev peryoda salên li jor hate binavkirin bi taybetî salên nav 1995 û 2008 an ji awura lêkolîneriya li ser Ehmedê Xanî jî salên afrêner û angaje ne.

Lêkolîneriya Kurd di gelek şax û waran de, çî bi hejmar be û çî jî ji awura kûrayî û berfirehiya dabaşan be ne mikun e bala her kesê vê eniya xebatê dişopîne, nekişandibe.

Di konferans, panel, semîner û bernameyên televizyon û radyoyan de, li zanîngeh, înstîtût û akademiyan de axaftin, teblîxat, pêşniyaz û dersên hatin pêşkşêkirin bûne pirtûk û di refên pirtûkxaneyên me de bûne dewlemendiyeke nû û ketine ser yê berî xwe.

Bi gotinên Celadet Bedirxan “ tovê berî bi 300 salan hatibû çandin” şîn tê, bi ser erdê dikeve, êdî ne bêparastin û ne bêxwedî ye, geş dibe, gurr dibe.

Ew rojên me dîroka xwe, jiyana kesayetî û serokên xwe, berxwedanvan û serhildêrên xwe ji pênûsên biyanî, mîna yên Garzoni û Moltke, A. Le Coq, Oskar Man, Hugo Makas û Roger Lescot, Nikîtin, Rambot, Roswelt, Lazaryev, Hesretyan, M, Fanny, Robert Olson û hwd. nas dikir, bi temamî nebe jî bi rêjeyeke

xwiya li pey me dimînin. Cihê lêkolînerên me bi her sala dubihure re xwiyatir, hejmara berhemên îmzeyên wan hildigrin jî zêdetir dibe. Ev jî baweriya netewe bi xwe û zanayên xwe xurt dike, dibe dilxweşî, serbilindayî jê re.

Ji vê awurê divê mirov Lêkolîna hejmar 12 bigre dest. Ev hejmar li ser Ehmedê Xanî ye û ji du xebatên binirx û bikêr hatiye pê: Ya yekê hevpeyvîneke dirêj bi Jan Dost re ye û ya duhem jî biyografiyeke berfireh e ku ji aliyê Murad Ciwan ve hatiye amadekirin. Destên herduwan jî xweş û terr be, temenê wan dirêj, tendurustiya wan baş û jiyana wan berhemdar û afirêner be.

Redaksiyona Lêkolînê

Hevpeyvîna Înstîtûta Kurdî li Almanya bi Jan Dost re

1- Rewşa gelê kurd û rewşa navneteweyî di serdema E. Xanî de û bandêra wan li ser Mem û Zîna E. Xanî?

Piştî şerê Çaldêranê di tebaxa 1514 an de. Artêşa Sefewiyan şikesteke mezin xwar û tevaya wilayeta Diyarbekir (di gel bajarên mîna Mêrdîn, Urfa, Reqqa û Mûsil) kete destê Osmaniyan. Ji wê çaxê de piraniya Kurdan ketin bin siya fermanrewayiya Osmaniyan piştî ku sultan Selîm şertê wan ku girêdayî mîrek û serokên êlên xwe bimînin, pejirand.

Berî wî şerî Kurd di navbera herdu imperatoriyan dijmin de (Sefewî û Osmanî) dabeş bûbûn. Di şerê Çaldêranê de hakimê Hesenkêfê melik Xelîl ku zavayê şah Ismaîl bû (6) li hêla sefewiyan şer dikir. Li aliyê Osmaniyan Mîr Lale Qasim, mîr Şerefê mîrê Bedlîsê û waliyê Diyarbekrê Xan Mihemedê ku di şer de hate kuştin, hebûn (7).

Kurdistan wekî cografîyayeke taybet, bûbû navbirra wan herdu imperatoriyan dijhev û ew cografîya bûbû lanetek li ser gelê kurd yê ku girêdanên wî jî parçe bûbûn û her beşek bûbû destikê kêra imperatoriyeke. Kurdistan jî meydana şer bû, sal nedîçû ku li eniyên şer yê rojhilatê dewleta Osmaniyan şerek li dar

neketibûya. Lê ziyankar tenê gelê Kurd bû.

Peymana Qesra Şêrîn:

Bi wî awayî gelek sal dibuhurîn û welatê Kurdistan wêran dibû. Mîrîtî qels û lawaz dibûn heta ku herdu imperatoriyan peymaneke aştiyê sala 1639 an imze kirin ku di dîrokê de bi navê peyman **Qesra Şêrîn** hate naskirin. Li gor wê peymanê Rewan(Yêrîvan) li sefewiyan vegeriya û tevaya Iraqê bû para Osmaniyan.

Tiştê ku bala mirov dikişîne ew e ku ji wê peymanê û vir de li gor jêderên dîrokî êdî agirê şer li eniya rojhilat sar bû û heta di jiyana Xanî tevî de jî şûrek li wê eniyê nehate kişandin û gulleyek nehate teqandin! Lê em dibînin ku Ehmedê Xanî di Mem û Zînê de behsa (herdu terefan) û şerê wan dike wekî ku wî bi xwe şer dîtîbin û di jiyana wî de qewimî bin. Bêguman Xanî yê ku derdê wî derdekî netewî bû çîrok û stran û serpehatiyên demên şer dibihîstin û encamên şer li ber çavan bûn û şopên ku wan şeran li pê xwe hiştibûn gelekî kûr bûn ku bi salan ew şop nedîçûn. Bê guman Xanî dê Şerefname xwendibe û dê destanên şeran û tarîxa qirêj ya sultan û şah li welatê xwe ji devê dengbêj û kalemêran bihîstibe loma jî wî her di pêşgotina Mem û Zîna xwe de behsa wî şerî kiriye mîna ku hîn li dar e(vegere malikên 221 heta 225).

Berî wê peymanê jî herdu imperatoriyan her yekî ji alî xwe de xwestin mîrnuşîniyan qels bikin û serxwebûna wanî mayî jî têk bibin û wan bixin bin çengên xwe. Şah Ebbasê yekem kurd di şerên xwe yê hundir û derve de bikarnîn. Ew li himber Mafî û Nankilîyan ajotin şerekî giran û ew di kela Rewandizê de qir kirin.

Yê ku serokatiya vê helmeta şahanî dikir jî yekî kurd bû bi navê Ehmed kurê Heloxanê Erdelanî(8). Şah Ebbasê ku Biradostî di Kela Dimdimê de sala 1608an qir kirin, êlên Kurdan mîna navbirr koçberî sînorê xwe û Ozbekan kir û ew li ser sînorê Xurasana rojhilat bi cih kirin da ku ew êl bibin mertal ji bo sînorên dewleta wî ya berfireh(9).

Bêguman Xanî ne bêagah bû ji van bûyer û serpehatiyan. Her wisa ne dûrî cihên bûyeran bû jî. Bi xwe di nav de bû û di her rêyekê re û li ber her zinarekî û di her gelî û newalekê de şopa şerekî hebû. Her ber û dar bûbûn şahidên cengên giran ku li ser devê dengbêjan bûbûn destan û di civatan de dihatin gotin. Xanî ev bûyer mîna dîmenin ku taze li ber çavên wî qewimîbin wisa anîne ziman:

Bifikir ji `Ereb hetave Gurcan
Kurmanciye bûye şubhê burcan

Ev Rom û `Ecem bi wan hesar in
Kurmanc-i hemî li çar kenar in

Herdu terefan qebîlê Kurmanc
Bo tîrê qeza kirîne amanc

Goya ku li ser hedan kilîd in
Her tayife seddek in sedîd in

Ev qulzemê Rom û behrê Tacîk
Hindî ku bikin xurûc û tehrîk

Kurmanc-i dibin bi xûn mulettex
Wan jêk vedikin misalê berzex
(malikên: 220-225)

Rewşa Osmaniyan li eniyên rojava:

Di jiyana Xanî de (1651-1707) pênc sultanên Osmaniyan hatin ser textê hukumdariyê. Mihemedê çarem (1648-1687) û Silêmanê duyem (1687-1691) û Ehmedê duyem (1691-1695) û Mustefayê duyem (1695- 1703) û Ehmedê sêyem ku Xanî di dema wî de wefat kir.

Qonaxa hukumdariya van sultanên bûbû destpêka lawazî û sistbûna imperatoriya osmanî. Êdî stêrka Ali Osman ji ezman dadigeriya û diçû ava. Erê li rojhilat agirê şer sar bû û bû dema ku êdî xwedan hiş di encamên şeran de bifikirin, lê li rojava agirê cengên giran ji nû ve hîlbûn û imperatorî êdî pîr dibû. Li hundir jî serkêşiyên gelek mîr û paşayan û serhildanên Yenîçeriyên êdî dewlet zûtir pîr dikir.

Sala 1651an ku sala tê de Xanî ji dayik bûbû, Italiyan giravên Tenedos û Lemnos yên li devê Dardanêl dagîr kirin û leşkerên Osmaniyan şikestî ji dorpêça Viyannayê vegeeriyên. Li pê wê, peymanê pîroz di navbera Papa û çend dewletên ewropî de li dar ket û êdî têkiliyên Firansa û Osmaniyan jî ber bi xirabbûnê ve çûn. Sala 1686an osmanî ji bajarên Poda û Best yên Meceristanê reviyên. Sala 1694an Osmaniyan li pêşber nemsawiyên li Solenkamen şikeseteke mezin xwarin û revî revî bi şûn de hatin. Li her hêlê êdî osmanî bi şûn de dihatin û imperatoriya wan êdî dikurisî. Di wan deman de Ehmedê Xanî Mem û Zîna xwe dinivîsî û doza hişyariyê li gelê xwe û mîran dikir. bêguman hayê wî ji van bûyeran hebû. Wî dizanîbû ku êdî osmanî jar dibin, dizanîbû ku bilandina Osmaniyan û mijûliya

wan bi eniyên rojava re fersendeke dibe ku careke din ji Kurdan re neyê. Meziniya Ehmedê Xanî ev e ku ew şêxekî zemanê xwe bû jî, lê hîç derdê gelê xwe ji bîr nekir. Berê xelkê neda cihada (Gêwir) li rojava. Li ser menberan negote wan herin tev li eskerê mensûr yên(Sultên) bibin û bihişt û horiyên wê li pêşiya we ne. Wî dixwest bihiştê li erdê ji bo gelê xwe pêk bîne. Hîç Xanî negot ev dewleta em tê de û di bin sîbera sultanên wê de dijîn dewleteke islamî ye û xiristyan şerê wê dikin, divê em niha dengê xwe nekin û her û her piştê bidin vê dewletê. Ew zulmê dike xem nake, lê dijminê me xiristyan in! Na wî ev hizr nekirin para mejiyê xwe û berovajî van hizrên bi hezaran şêx û melayên Kurdistanê yên wê demê û vê demê, ew rabû û got ku em milletekî bextreş in. Eger stêrika bextê me jî biçirisiya û camêrek ji nav me rabûya dê niha dewleteke kurdî mezin ava bikira. Ma hîç fersendên wisa dubare dibin gelo! Na . De îca namûse li hakim û emîran ku dest bidin hev û dewleta me ava bikin. Lê namûs nehate hakim û mîran û xewnên Xanî wisa têk çûn û hesretên wî di gel wî binax bûn.

2- Xanî çendî serdestê dem û qonaxa xwe ye, çendî pirs û pirsgirêkên gelê kurd naskirine û hewla wî ji bo çareserkirina van pirsgirêkan çend e, çawa ye ?

Guman nîn e ku bîr û baweriyên Xanî ne çêlik û zayîdeyên bûyerên Kurdistanê û cîhanê tenê bûn lê bi ya min ku gelek çavkaniyên teorî hene Xanî pîrr sût û havil ji wan girtine. Xanî di nerîna min de nûnerê şêweyekî taybet ji ramanê bû, nûnerê fikreke netewî bû

ku êdî serî di nav rewşenbîrên wan deman de hildabû. Xanî diyardeyek e, divê em wî di çarçova mêjûya edebî û çandî ya rojhilatê de bixwînin. Û divê em li bingehên ku wî bîr û baweriyên xwe derbarî milletperwerî û azadî û Xwedê û hebûnê de li ser ava kirine, bigerin. Divê em çavpêketineke bi lez li nexşeya çandî ya wê serdema ku bû şahidê zayîna vê berhema bêhempa bixin.

Li rojhilata di dema Xanî de sê zimanê serdest hebûn. Yek jê zimanê Erebî bû. Zimanê pîroz, zimanê Quranê û dînê islamê ku bi milyonan misilmanên ji her milletî mecbûrî fêrbûna wî bûn. Ew zimanê ku şaristaniya islamî-Erebî û bi sedhezaran kitêb pê hatibûn nivîsîn û roleke giring di pêşxitina civakên islamî de lîstibû. Zimanê din yê Farisî bû ku li ser destê hin kesên xîretmend û bi piştigiriya mîr û sultanên Eceman di dirêjîya sedsalan de hate sîqal kirin û bû zimanê wêjeyê ji Stenbolê heta Hindistanê. Zimanê sêyem yê Xwedêî(Osmanî) bû ku ew jî zimanê dagîrkerên welatê Ehmedê Xanî bû.

Di nav van zimanan de zimanê kurdî jî êdî nasnameya xwe saz dikir û şerê hebûnê û xweparêziyê nû li dar xistibû, lê bi çekin hindik û siwarin hindiktir. Ew li ser destên nifşekî pêşeng ji şairên mezin ku hestên xwe bi zimanê dayikê derbirrî bûn. Bi zimanê xwe yê sêwî û bêxwedî û lipêmayî wan derî li ber nifşên li pê xwe vedikirin û êdî ew ziman ji ezmûna xweibatkirinê bi serkeftin derketibû meydanê û dîwanên hêja yên kesên mîna Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran û xezeliyên Eliyê Herîrî hatibûn nas kirin û êdî xelkê ew ji ber dikirin û li

civatan dihatin xwendin. Vê yekê baweriya bi ziman li ba rewşenbîrên wê demê xurt kir û ew lê hay bûn ku zimanê kurdî jî zimanê nivîsnadinê ye û hestên mirovan û xweşiya evînê û şewata wê dikarin bi wî zimanî jî werin derberrîn. Xanî di pêşiya Mem û Zînê de destnîşanî wan hersê şairên navborî kiriye û xemgîniya xwe da xuya kirin ku mîrê nezan guh dabûya wî dê navê van mezinan bilind bikira û ew vejandina.

Xanî ew her çar zimanê ku me li qelem dan qenc dizanîbûn. Di her çar zimanan de jî serdest bû û ew li ber wî bûbûn hespên xweşkêş. Wî gelek sûd ji wan wergirt. Di rêya Erebi re li felesefe û mantiqa islamî ya ku li ser bingehê Gîrîkî ava bûbû, haydar bû. Kete bin tesîra sofîyên mezin. Nakokiyên ku di hundirê dîne islamê de, tîr û beşên mezhebên islamî nas kirin û zimanê Quranê di destê wî de bûbû hevîrek ku çî bixwesta dikaribû jê saz bikira. Di Mem û Zînê de ew zanîna wî ya pirr, kifş û berçav e. Wî di berhema xwe de gelek peyvên Erebi bi kar anîne ku tenê di Quranê de hene, her weha peyvên bi kar anîne (Mîna peyva Yûh ji bo rojê) ku êdî Ereban bi xwe ew di nivîsên xwe de bi kar nedianîn. Di rêya Farisî re jî çavên wî li gencîneyên çanda îranî vebûn. Destanên mezin xwendin û çîrokên herêmê nas kirin. Wêjeya fêrkariyê ya ku li ser destê Seedyê Şîrazî gihiştibû kemalê nas kir. Ê nas kir çawa zimanekî mîna Farisî ku bi hatina islamê re êdî sekerat kir, bi hevkarîya (mîr û şairan) ji mirinê filitî û dîsa li ser lingan rawestiya.

Wî malika Firdewsî di Şahnameyê de ku dibêje:

Besî renc-i burdem der în salî sî
Ecem zinde kerdem bedîn Parisî!

Xwend û çavnasî milletperweriyê bû û wî jî got:

Ev name eger xirab e ger qenc
Kêşaye di gel wê mi du sed renc!

Bê guman Xanî zimanê Xwedêî jî paşguh nekiribû. Di rêya vî zimanê dagîrkeran re çavnasî wêje û tarîxa Osmaniyan bû. Wî bi zanebûn û biryar ev hemû ziman û xweşiya wan û şan û şerefa nivîsandin bi wan li pey xwe hişt û avête pişt guhê xwe û dest avête nivîsîna bi zimanê xwe yê sêwî û (Sifrê xwe yê xef) ango destana Mem û Zînê nivîsî(êşkera kir). Wî xwest xitaba gelê xwe bi zimanê gelê xwe bike. Wî dizanîbû ku her pêxemberek hatiye û bi zimanê qewmê xwe doza xwe kiriye. (Her pêxemberek ku me ew hinartî, bi zimanê gelê xwe pêxemberî kir, da ku ji wan re zelal bike).

Mîrê mêjûnas Şerefxanê Bedlîsî yekemîn kitêb di tarîxa Kurdan de û li ser Kurdan bi zimanê Farisî nivîsî. Ew zimanê ku mîna me got, di çimê belavbûn û geşbûna xwe de bû û serdestiya wêjeya rojhilatê heta Hindistanê dikir. Lê Xanî ev yek nepejirand û bi êşkeretî di pêşiya destana xwe de got ku wî piştî xwe da zêr(Farisî) û berê xwe da sifr (kurdî) û tê de xebitî û xwest wî sifrê xwe yê xef û veşartî û rengçûyî spî bike û daxîne bazarê! Wa bawer dikim ku ew wisa bersiva Şerefxan dide û dibêje ku xweziya te jî ew berhema hêja bi vî zimanê me yê sêwî nivîsîbûya. Her weha ew dibêje ku bi Farisî (ji ber ku wek zêr e) her kes dikare

berhemên qenc pê biafirîne, lê yê ne ku zêde jêhatî û zîrek be nikare ji sifr (zimanê kurdî) berhemeke hêja biafirîne.

Di bawerîya min de ku Xanî dê Şerefname xwendibe û ketibe bin tîn û tesîra wî. Ev jî dihêle ku em bibêjin pêşengê milletperweriyê Şerefxan e, ne Xanî ye. Şerefxan ji ber ku mîrekî xwedan xîret bû, projeyeke wî ya mezin hebû ku federasyonê di nava Kurdan de saz bike (wî xwest yekîtiyê û ittifaqê bixe nav Kurdan û doza avakirina eniyê hevbêş kir di navbera mîrnuşîniyên Kurdan de û dixwest ku ferderyoneke mezin ava bibe û navenda wê jî cizîra Botan be, lê vê projeya wî bala mîrekên Kurdan nekişand).

Şerefxan bi xwe jî di pêşgotina Şerefnameyê de bîr û baweriyên xwe yê netewî anîne ziman û hoyê nivîsîna berhema xwe dane ber çavan. Ku em pêşgotina Mem û Zînê û ya Şerefnameyê bidin ber hev dê bibînin ku mebesta herdu nivîskaran yek e. Herduyan jî li ber çavê xwe vejandina pêtên di bin ariyê de danîbûn û dixwestin mîratê Kurdan yê wêjeyî û dîrokî yê li ber mirinê û windabûnê vejînin û ji pencên jibîrkirinê rizgar bikin. Lê di gel ku di dawiyê de mebestên herduyan yek in, cudahiyeke bingehîn di navbera wan de heye. Şerefxan dixwest mêjûya binemalên mezinên Kurdan yê ku hatine ser texê fermanrewatîyê binivîse (da ku nav û deng û şanê malbatên Kurdan yê xwedan roleke mezin di jiyana Kurdistanê de li pişt perdeyan nemîne). Lê Xanî:

Kêşaye cefa ji bo yî `amê.

Yanî wî dijwarî û zorî ji bo tevaya milletê xwe dîtiye.

Wî negot: kêşa ye cefa ji bo yî mîran. Her weha ew dibêje: min ev berhem danî, ne ku şareza me û wêjevanekî zana me, lê ji milletperweriya xwe û eşîrperestiya xwe min dest avêtiye qelemê!

Yanî ne ji qabilî û xebîrî
Belkî bi te`essub û `eşîrî

Şêweyê ku van herdu pêşengan (Şerefxan û Xanî) pêşgotinên xwe pê nivîsîne dide zanîn ku Xanî ketiye bin bandora Şerefxan (ku ew nimûneyek ji ronakbîrên wê demê ye) û her wisa dide zanîn jî ku hin mijar hebûn bala rewşenbîrên wê demê dikişandin û êdî xemxuriya wan bû ku zanibin çima ev bindestî û çima ev paşketina wêjeyê û sêwîtiya ziman! Erê bêguman di civatên wan rewşenbîran de nîqaşên wisa li dar diketin û gelek guftûgo çêdibûn. Lê ji ber ku li ba me tiştê nehatiye nivîsandin em nizanin heta kîjan radeyê dê ev iddiaya me rast be. Tenê em dikarin ji nav xêzikên berhemên xwe yên berê rastiyên dîrokî derînin. Dîsa di pêşgotina Şerefnameyê de hedîsek li ser zimanê pêxember heye, dibêje ku pêxember nifir li Kurdan kiriye, da ku ew hîç nebin yek. Çiku herifîna cîhanê di yekîtiya wan de ye! Tiştê balkêş ew e ku Şerefxan vê hedîsê mîna rastiyekê bawer dike û dibêje: û ji wê rojê de Kurdan nikarîbû dewleteke xwe ya mezin saz bikin!.

Ev yek dide xuyakirin ku yekîtiya Kurdan ji berê de mijareke germ bû ku him li ba neyarên Kurdan û him jî li ba Kurdan dihate guftûgo kirin.

Şerefxan di pêşgotina xwe de dibêje: kurd bi ya hev nakin û li pey hev naçin, ittifaq û alîkarî di nav wan de

nîne. Xanî jî vê gotinê bi malikekê weha dibêje:

Lew pêkve hemîşe bê tifaq in
Dayim bi temerrud û şiqaq in

Şerfexan nelihevkirina Kurdan vedigerîne nebûna serekekî serfiraz û xurt û dibêje: ji ber ku niha li nav Kurdan bi giştî serekek nîne ku hemî li pê wî biçin û fermanên wî bi cih binin, piraniya wan bûne xûnrêjên hev û guh li qanûn û zagonan nakin û ji bo pûçtîrîn sebeb serî hildidin. Di deveke din de jî bûyereke balkêş tîne ziman ku divê em gelekî li ber rawestin. Ew dibêje ku piştî şerê Çaldêranê sultan Selîm ji Idrîsê Bedlîsî xwest ku Kurd yekî ji nav xwe hilbijêrin da ku hemî êl û hoz di bin ala wî de bin. Idrîsê Bedlîsî ji sultan re dibêje: her yek ji Kurdan dibêje ez û ne kesekî din. Kes bi ya kesekî din nake. Xanî jî di vê xalê de gotinên Şerfexan dubare dike û hîn wêdetir diçe û hêvî dike ku serekekî mezin rabe û dewleteke aram hukum bike û guhdêriya wêje û zanîne bike û şerekî li himber neyaran li dar bixe.

Ev herdu pêşeng eynî bingeha psîkologîk ya kesayetiya kurd tînin ziman û herdu jî eynî sifet û sinçan didin gelê kurd. Şerfexan dibêje: piraniya komên wan bi cesaret in û camêr in û comerd in di gel xîreteke mezin û serfiraziyeke bêsinor êdî xwe dihavêjin tehlukê û xwe li xeterê diqelibînin, da ku destê niyazê û lavan dirêjî nerm û nerindan nekin û alîkarî û qenciya wan nexwazin. Xanî eynî van gotinan lê bi şêweyekî vehandî û menzûm dibêje:

Camêrî û himmet û sexawet
Mêrînî û xîret û celadet

Ew xetm e ji bo qebîlê Ekrad
Wan daye bi şîrê himmetê dad

Hindî ku ji şeca`etê xeyûr in
Ew çendî ji minnetê nefûr in

Ev xîret û ev `uluwwê himmet
Bû mani`ê hemlê barê minnet

Lewra ku hemîşe bêtifaq in
Dayim bi temerrud û şîqaq in

Li vir mirov nikare bibêje ku ev diziya bîr û baweriyane, lê ji ber ku herduyan wêneyê yek milletî kişandine lewra jî herdu wêne gelekî dişibihin hev.

Li rex Şerefnameya ku ez bawer dikim dê Xanî xwendibe, wî hin jêderên din jî dîtine ku ji bîra wî ya netewî re bûne bingeh û li ser ava kiriye. Helbestên melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran ax û zewiyek bûn ku tovên kurdayetiyê tê de şîn hatin û qebilîn. Ne ji ber mijarên di helbestên wan de lê ji ber zimanê ku ew helbest pê hatine nivîsîn. Em dizanin ku ziman ew e ramana ku bîr û hişmendiya milletekî di xwe de diguncîne û sîqal dike. Ew zimanê ku li ber windabûnê bû kete destên van kesên ku xwedîtiyek qenc û dilovane lê kirin û jê re bûne bav û dayik. Mixabin ku bavîtiya wan têrê nekir ku mîratê nivîsandî hemî biparêzin. Şerên ku li qada welatê wan diqewimîn ji bavîtiya wan xurttir bû. Û gelek berhem ketin koncala jibîrbûn û windabûnê. (Şerefxan behsa mîrekî Kurdan dike ku navê wî Yaqûb beg bû û dibêje ew li ser rêya sofîyan bû û rewnabêjekî jêhatî bû ku dîwanek derbarê tesewwifê bi kurdî li pey xwe hiştibû). Ev

destnîşankirin belgeyeke dîrokî ye ku gelek dîwan û kitêb ji holê rabûne yan bi hoyên şer û cengên Sefewî û Osmaniyan û nakokiyên Kurdan bi xwe jî, û yan jî bi hoyê nezaniya mîrên Kurdan û guhnedana wan ji wêjevan û zanayên Kurd re.

Li vir dixwazim xaleke giring bînim ziman û bibêjim ku netewayetî û kurdperwerî pêşî li Bedlîs û Bazîdê hate meydanê lê li herêmên mîna Amîdiyê û Cizîra Botan ne heta wê astê xurt û diyar bû! ez bawer im ku Bazîd û Bedlîs her di nava hêtûna şeran û nakokiyên de bû. xelkên wan herdu hêrêman ketibûn ber pêlên imperatoriyan û nakokiyên wan. Di siya Sefewiyan de dinivîyan û li ser dengê daholên Osmaniyan ji xew radibûn. Van guherînên li pey hev û berdewam bêguman roleke erênî di pêşxitina hestên netewî li ba rewşenbîrên Kurdan lîst. Êdî ew qenc bi kesayetiya xwe ya serbixwe hest dibûn. Li hêla din yanî li herêmên ku hinekî dûrî şer û agirê cengê bûn, wêjeyeke ciwan hate meydanê lê netewayetî dengêkî zeîf bû di nav dengê wêjevanan de. Melayê Cizîrî wisa bi nav Kurdistanê derbasî qesîdeyên xwe dike. Ew nebûye mijara wî mîna ku yara wî û keziyên yara wî û derdên evînê li ba wî bûne mijara sereke. Ez vê dibêjim ne ku ji qedrê melayê Cizîrî kêr dikim. Ew bejna herî bilind e di şeweyê hunerî de di kurdiya klasîk de û tenê nivîsîna wî ya bi kurdî besî wî ye ku wî bike pêşengek ji pêşengên ku bingeha wêjeya kurdî danîn. Erê nivîsandin bi zimanê dayikê bese da ku hişmendiyê ji nû ve ava bike û bixwehestbûnê xurt bike. Ma dema ku wî digot: dev ji Şîrazî berdin û werin qesîdeyên min bixwînin, ne digot: werin kurdî bixwînin!

Yên mîna Melayê Cizîrî bi dîwana xwe ya ciwan û yên mîna Feqiyê Teyran bi berhemên xwe yên nêzîkî berhemên gelêrî mîna Şêxê Sen`an û Bersîsê `abid rê li ber derketina Xanî vekirin . Xanî pala xwe da van pêşengan û behsa wan jî di pêşgotina xwe de kir, wî berhemên wan û nirxê berhemên wan baş dizanîbû. Projeyeke mezin di bala wî de bû û dizanîbû ku ev proje bêyî (mora) mîr nakeve pratîkê, lê:

Çibkim ku qewî kesad e bazar

Nîn in ji qumaş-i ra xerîdar

Û:

Teb`ê Xanî sedefa gewherê `irfan e welê

Metnixwanek nebitin sahibê me`na çi bikit?(dîwana Xanî)

Û:

Dilê Xanî eger çi gencexan e

Şukur qet kes nego Xanî bi çendan!(dîwana Xanî)

Û:

Genca me di dil guher tijî ne

Herçende `eyan xezeffiroş in!

(Dîwana Xanî)

3- Xanî kapasîteyek e, xurtiyek fikrî û rewşenbîrî ye. Ev ne bi tenê Kurd dibêjin, belê jî aliyê kurdnas û rojhilatnasên welatên cîran û Ewropayî jî heta bi cîhekî xurt hatiye qebûlkin.

Gelek kes wî bi Firdewsî, hinek jî bi Şekspîr û Hwd. re muqeyese dikin. Çima Xanî bi tenê, gelo di zemanê Xanî de kesekî din derneketiye ji nav Kurdan, yan hene em nas nakin?

Xanî xwedan karîzmayeke wêjeyî ye! Kêm nivîskar vê yekê dikarin bi dest bixin. Rast e. Kurdnasan gelekî nixrên wî û giraniya wî nas kiribûn. Yûsêf Abgarovîç Orbellî dibêje ku Xanî di asta Firdewsî û Rostavellî de ye, ji xwe dibêje ku sê helbestvanên mezin yê Rohhilatê hene yek ji wan Xanî ye!! Di nav Kurdan de û di zemanê Xanî de helbet rewşenbîr û nivîskar hebûn, yek ji wan hevalê Xanî bi xwe Ismaîlê Bayezîdî ye, lê ew ne bi giraniya Xanî ne. Xanî felsefeyek û rêyek ji kurdariyê re dît. Wî bingeha fikreke netewî ji bo milletekî danî, loma jî cihekî wî yê taybet heye û bala her kesî heta mamosteyên biyanî jî kişand. Lê di nerîna min de ku hîn divê em bi xwe bala xelkê bikişînin ser giraniya Ehmedê Xanî, divê em festîvalên taybet ji bo danasîna Xanî li dar bixin û divê ewropî vê kesariya mezin nas bikin.

4- Bi qasî roj û sala jidayikbûna Xanî roj û sala wefata wî jî hê ne bûye xwediyê teqezîyeke temam. Xaleke din ku ne bêtîqas e, temenê Xanî yê dema Mem û Zîn nîvisiye, di van derbaran de dîtînen te?

Sala ji dayikbûna Xanî diyar e, çiku wî bi xwe di dawîya Mem û Zînê de gotiye ku sala hezar û şêst û yekê koçî ji dayik bûye ango 1650 yan 1651 zayînî. Sala wefata wî ne diyar e. Lê hin dibêjin ku ew di sala 1707 an de çûye rehmêtê! Ew xwe dispêrin iddiayeke rehmetyê Elaedîn Seccadî ku dibêje li ser kêla gora Xanî wisa hatibû nivîsandin: Tare Xanî ila rebbihî. Yanî Xanî ber bi xwedayê xwe ve firiya. Ev hevoka Erebi bi hesabê herfan digre beranberî 1119 koçî ango

1707 zayîmî. Lê em nikarin vê iddiayê weke rastiyeke qebûl bikin her weha em nikarin wê red jî bikin. Ji ber ku rastiyeke din di nav destê me de nîn e.

5- Xwendina Xanî çûye, li ku, li ba kê xwendiyê, gelo derketiyê ji Kurdîstanê, wek nimûne çûye Stenbol, Bexdad, Şam yan jî Misrê?

Derketina wî ya ji Kurdistanê her çendî me delîl û belge di dest de nîn in, lê em dikarin texmîn bikin ku ew ê bi kêmanî ji Bayezîdê derketibe. Şêweyê xwendina berê wisa bû, diviyabû xwendekar li pey ilim û zanîne biçê. Ji welatê xwe dûr bikeve û here li ba seydayekî bi nav û deng icazeya xwe ya ilmî werbigre. Lê çûna wî ya Bexdayê, Stenbolê Şamê! Ez bi xwe nikarim tu bersiveke zanistî bidim. Gelek ji lêkolîneran dibêjin ku çûye Misrê û Qudsê û Stenbolê û nizanim ku jî. Lê mixabin bêyî ku tu belgeyan li ber destê me raxînin. Mamoste Hejar û Elaeddîn Seccadî û gelekên din van iddiayan wisa bê delîl dibêjin. Lê vê dawiyê pirtûkeke birêz Ebdulla Varlî derket ku gelek agahî têde hene û li gor gotina Varlî ew xwe dispêre belgeyên Osmaniyan yê kevin. Li wir mirov dikare rastî detayên jiyana Xanî bibe.

6- Bi piranî di zemanê Xanî de şair berhemên xwe jî bo Sultan û şahên herêmê dinîvisînin û gelek caran jî berhemên xwe hinekî jî di bin bandêr û zexta deshelatdaran de amade dikin. Di vî alî de Xanî wek cihêyî û xweseriyekê berçav dibe, şîroveya te?

Xanî ne helbestvanê Baregahê bû. Dengê wî ji dengê gelê wî bû. Ew dilşewitîyê belengaz û rebenê

kurmancan bû, îca wê çawa di eynî demê de li ber destê mîr û paşan, şah û sultanawaza xwe bigota? Bilindiya Xanî ji vir tê ku ew alîgirê doza gelê xwe bû û pêşberiya zulma li dijî Kurdan dikir. Erê wî berê xwe da mîrê dema xwe (Mîrza beg), lê tenê dixwest wî hişyar bike, ne ku destê xwe li ber wî vedigirt. Wî dixwest mîr rabe ser piyan û li ber Osmaniyan serî hilde! Xanî bi fikrên xwe şoreşgerê jî bû. Digote Kurdan vê qedera xwe qebûl nekin û perdeya bindestiyê biçgirînin. Rê jî wisa naskiribû ku zanîn û şûr e.

7- Kesek yan jî hin kesên ku Xanî ew ji bo xwe kiribin nimûne çî Kurd, çî jî ji xelkên din hene, hebin kî ne?

Wek nimûneya edebî Xanî her kesê beriya xwe ji bo xwe mîna kaniyekê nas dikir û av jê dianî. Kesekî binavkirî nîn e. Her weha ew tevneke mîna ya Firdewsiyê Faris dirêse û hemû zanayên beriya wî tesîr lê kirine.

8.-Damara Xanî di nav rewşenbîr û şairên kurd de. Ji zemanê Xanî ber bi roja me de. Hinek vê heta Evdîlah Pêşew tînin tu çî dibêjî?

Ehmedê Xanî bi Mem û Zîna xwe bû ekoleke wêjeyî û netewî ku gelek şair û nivîskarên li pê wî hatin, peyrewiya wî kirin û bi teşîya wî bîr û bawerî û hestên xwe ristin. Gelekan mîna wî di pêşgotinên destanên xwe de gilî û gazin ji Felekê kirin û bi ser zimanê kurdî yê bêxwedî de giriyan. Lê bi rastî tu kesî nikarîbû xwe bigihîne asta wî ya hunerî û ramanî.

Ji van kesên ku em dibêjin dê tesîreke rasterast ya Mem û Zînê û Ehmedê Xanî li wan hebe ev in:

Mele Ismaîlê Bayezîdî:

Hemî lêkolîner dibêjin ku Mele Ismaîl şagirdê Xanî bû. Ew jî li Bazîdê hatiye dinê û di serdema Xanî de jiyaye. Dr. Blec Şêrgo dibêje: ew ji xelkên Bazîdê ye û sala 1654 an ji dayik bûye. Li pê rêya Ehmedê Xanî çûye. Ferhengeke biçûk bi zimanê Erebi, Farisî û kurdî nivîsiye navê wê Gulzar e. Helbestin wî yên ciwan û xurt bi zarê kurmancî hene! Sala 1709 an wefat kiriye û gora wî li Bazîdê tê naskirin.

Aliksander Jaba dibêje: ew ji şairên Kurdistanê ye, jî Bazîdê û jî şagirdên Ehmedê Xanî ye. Sala 1654 an ji dayik bûye û sala 1121(Koçî = 1709 zayînî) miriye. Ji bo zarokên Kurdan ferhengeke duzimanî Farisî û Erebi bi navê Gulzar li pê xwe hiştiye! Her weha helbestên wî û xezeliyatên wî gelek in. Ew gelekî navdar bû. Li Bazîdê miriye.

Ku em gotina Jaba û ya Blec Şêrgo bidin ber hev dibînin ku herduyan jî gotiye Ehmedê Xanî mamosteyê Mele Ismaîl bûye. Lê ku em li sala jidayikbûna wan dinêrin dibînin ku Ehmedê Xanî bi sê çar salan tenê ji Mele Ismaîl mezintir e . wê demê em dikarin bibêjin ku ew du hevalên hev bûn û fikr û bîr û baweriyên wan yek bûn. Projeyê ku Xanî ji bo kurdîkirina berhemên fêrbûna zimanê Erebi û diyanetê dest pê kiribû, Mele Ismaîl jî li gel wî dixebitî. Mixabin ku berhemên Mele Ismaîl heta niha ne diyar in ku em zanibin ka heta kîjan radeyê tesîra Xanî lê bûye.

Mele Mehmûdê Bayezîdî:

Li Bazîdê sala 1797 an ji dayik bûye. Xwendina xwe li wir qedandiye. Zanayekî dema xwe bû ku di şêst saliya xwe de çûye Erzerûmê û li wir bi konsolosê Rûsya Alikşander Jaba re hevaltiyeke mezin û berhemdar dike. Ew herdu li gencîneyên wêjeya kurdî yên winda digerin û bi dehan helbest û çîrokan ji windabûnê rizgar dikin. Yekemîn car Mele Mehmûd li gor daxwaza Jaba Şerefnameyê werdigerîne kurmancî.

Her weha wî tarîxa kurdî ya piştî şerefnameyê nivîsiye lê ev kitêb hêjî winda ye. Berhema wî ya herî navdar(Adat û risûmatnameê Ekradiye) kitêbeke gelekî hêja ye ku behsa civaka kurdî ya koçer dike. Kitêba wî ya di rêzimana kurdî de jî bi navê(Tuhfetul xi llan fî zimanê Kurdan) heye. Ku hêj nediyar e. Alîkariya Jaba dike û ferhenga Kurdî Firensî amade dikin.

Di bawerîya min de xebata Mele Mehmûd pêkanîna daxwazên Xanî bûn ku zimanê kurdî were parastin û her pê were nivîsandin. Mele Mehmûd bi wan kar û xebatên xwe li ser şopa Xanî çûye û ew jî bûye pêşengek ji pêşengê pexşana kurdî.

Selîmê Hêzanî:

Destana wî ya bi navê Yûsif û Zuleyxa ku sala 1168 ê koçî(1755 zayînî) nivîsiye dide zanîn ku ew gav bi gav li pê Xanî ye. Hema kopiyeye ji Mem û Zînê ye. Heta ku gelek malik yên Mem û Zînê bi xwe ne. Ji van malikên li jêr qenc diyar dibe ku Selîmê Hêzanî gav bi gav di şopa Ehmedê Xanî de ye:

Herdem bi temerrud û şîqaq in
Bê ol in bi hev ra bê tifaq in

Kurdên bi zemînê xwe seza bûn
Sahib huner û we pehlewana bûn

Lêkin ejî mame çar û naçar
Nîn in ji qumaş-i ra xerîdar

Sernameê name namê Ellah
Wahid tuwî bê şerîk û yektah!

Û bi vî awayî destana Yûsif û Zuleyxa diçe. Lê wa diyare ku ew şairekî gelekî qels e û nikare ji hişê xwe hîç cumleyekê bibêje.

Hacî Qadirê Koyî:

Ji Koysenceqa li Kurdistana başûr e. Sala 1817 an ji dayik bûye. Di zaroktiya xwe de li mektebên camiyên Koysenceqê xwendiyê û pişt re çûye Serdeşt û Mehabad û Şino. Sala 1863 an icaze wergirtiye û vegehiyaye Koysenceqê. Pişt re berê xwe daye Stenbolê û li wir xwe gihandiyê malbata Bedirxaniyan û bûye mamosteyê zarokên wan.. Berî ku ew biçê Stenbolê tu meylên wî yên netewî nebûne, lê li wir çav bi Mem û Zîna Ehmedê Xanî ya ku li ba Bedirxaniyan bû, dikeve û tesîreke mezin lê dibe. Ew jî mîna Xanî dibe xemxurê gelê xwe û zimanê kurdî. Bi giraniya Xanî dihese û li ser piştê Mem û Zînê ya ku di mala Bedirxaniyan de bû dinivîse:

Eman qedrî bizanin em kitêbe
Le dunya êstekî hemtay nemawe

Le Kurdan xerî Hacî û şêxê Xanî
Esasî nezmî kurdî danenawe!

Şêx Ebdurrehmanê Axtepi:

Şêx Ebdurrehman kurê şêx Hesênê Nûranî ye. Ji şêxên mezin yên terîqeta neqşenbendî bû. Sala 1850 li Axtepe ya qezaya Serçinara Diyarbêkrê ji dayik bûye. Kitêba wî ya navdar Rewdenne`îm e ku tê de behsa çîroka Mîracê dike. Sala 1910 an her li Axtepe wefat kiriye.

Ku mirov pêşgotina Mem û Zînê û bîr û baweriyên di Rewdenne`îmê de dide berhev dibîne ku Axtepi pir bi Xanî tesîr bûye. Rewşa siyasî ya Kurdistanê di dema Axtepi de mîna rewşa siyasî ya di dema Xanî de bû. Mîrîtiya Botanê têk çûbû û di navbera Osmaniyan û qacariyan de êdî nakokiyên serî hilda bûn. Loma jî fikrên Xanî bi wê zûtîyê tesîr li Axtepi kirin.

Axtepi di Rewdenne`îmê de dibêje:

Ji van qesdê min nîne `erzê huner
Welê da li dunya bimînit eser

Ku turk û Ecem qet nebên carekê:
Nehin kurdî şair di misra`ekê!

Bizanin ku şair ji Kurdan hene
Ji `uşşaqê turk û Ecem zêde ne

Welê bêxwedan in nehin me reîs
Ku meqbûl-i bin nik wî şî`rê selîs

Me jî ger hebûya xwedanek çunîn
Guhernas û qîmetşunas û emîn

Ji Kurdan gelek şairê sihredar
 Bi nexme dihatin wekî mûsîqar
 Welê çon me dîotin ku em bêkes in
 Ji bêçaregî kes bi me nahesin

Me anî qet´ kir kalam metîn
 Me xame hılanî ji nezmê şêrîn!

Binêrin li şî`ran heçî zaniye
 Çi terkîbekî sîrfê Kurmanciye

Ji kurmanciya xwe me anî nîzam
 Me`ella û şêrîn û efşe kalam

Wekî din jî dîsa Axtepî mîna Xanî behsa bazara kesad
 û bêxwedîtiya şî`rê li ba Kurmancan dike û gotinên
 Xanî dubare dike:

Xerîdar-i nîn in ji bo cewheran
 Ketin ber piyan cewherê defteran

Qewî teng e meydana me şairan
 Kesad hate bazara me sahiran!

Şêx Mihemmed Can(Xakî)

Xakî birayê şêx Ebdurrehmanê Axtepî ye. Li Axtepê sala 1858 an ji dayik bûye û li ber destê bavê xwe şêx Hesên xwendiyê. Çûye Şamê û li wir bûye xelîfeyê Mewlana Xalidê Neqşebendî. Wî destana Mecnûn û Leyla(Leyl û Mecnûn) sala 1884an nivîsiye. Di beşa sebebê telîfa kitêbê de xuyaye ku tesîra Xanî qenc lê bûye. Ew jî wek Xanî dibêje ku eger mîrekî me Kurdan hebûya dê Turk û Ereb û Ecem di bin fermana me de bûna. Ew jî gilî û gazinan ji demê dike û dibêje ku milletperweriya wî hiştiye ku dest bihavêje qelemê û bi

kurdî binivîse. Ew wisa dinivîse:

Peyda bikira ger me emîrek
Sahibhuner û xwedan-i şîrek

Ev turk û Ereb, tetar û Faris
Carek bibûna li ber me naqis

Her şa`irekî zebanê Kurdan
Qet nayê ji halê wan xeberdan

Emma ku xwedan ji bo me nîne
Nêv Rom û Ereb ne ademî ne

.....

Hasil ketime te`essuba wan
Xîret me kişandî bi qelb û can

Ne ku heye tu qabilliyet
Belkî me heye hinek ji xîret.

Wa diyar e ku Xakî heta bi kêşe û qafîye gelekî nêzîkî
Ehmedê Xanî ye û li ser rêya wî heta dawiyê meşiyaye.

Şêx Mihemmed Eskerî:

Kurê şêx Ebdurrehmanê Axtepî ye. Sala 1898 an ji dayik bûye û li ber destê bavê xwe û pişt re birayê xwe şêx Kerbela di medreseya bavê xwe de li Axtepe xwendiyê. Sala 1952 li gundê Çolê(Çewlê) wefat bûye. Dîwaneke wî ya helbestan û destanek bi navê (Iqdê Durfam) li pê xwe hiştiye.

Ew hilm û kelbeoxa netewî, agirê milletperweriyê di berhemên wî de gelekî diyar û ber biçav in. Di destana `Iqdê Durfam de dibêje:

Di vî wextî de şem`a `ilmê kurdî
 Qe natîse, nema tê zeyt-i , min dî

Evê qîza bi zêr û Zînet û qenc
 Ber û sîne qed û qamet wekî genc

Dizanim iltifatê nadinê kes
 Ji ber ehlê huner kê m in muderres

Gelek şêrîn e ev ezmanê kurda
 Derîxa me ji dest yekcarî berda

Hêjayî gotinê ye ku şêx Eskerî, yek ji wan kesên ku
 mijûlî rastkirin û civandina destnivîsên Mem û Zînê
 bû. Wî gelekî xebat ji bo bidestxistina destnivîseke rast
 ji Mem û Zînê kiriye. Di pêşiya destnivîseke Mem û
 Zînê de dibêje:

Bilcumle kitab û şî`rê Kurdan
 Bê qedr-i dibûn li cumle erdan

Ew ketne ziyade ber piyan tev
 Reşbext-i we mane şubhetê şev

Me d`xweste kitabeke Mem û Zîn
 Derdestî bikim ezê cegrexwîn

Pirr se`yî mi kir ji bo yeke rast
 Peyda nekirî me bê kem û kast

Axir du sê nusxe min civandin
 Lê her li me wan ceger helandin

Ev nusxeê Zîn û Mem temami
 Teşîh-i me kir heçî me zanî

Bê guman yê n ku ketine bin tesîra Mem û Zînê û bîr û
 baweriyên Ehmedê Xanî ji van kesên ku me navên wan

anîne bêtir in. Di yekem hijmara rojnameya Kurdistan de hin beş ji Mem û Zînê hatin weşandin. Di Hawarê de jî wisa. Cegerxwîn û Hejar û Hêmin û xeyrî wan ketin bin tesîra xurt ya Xanî û heta vê dema me jî ew tesîr berdewam e û dê her berdewam be.

9- Bandêra Xanî li ser Seîdê Kurdî?

Seîdê Kurdî kesayetiyê ku mixabin tevgera me ya siyasî wî ji bîr dike. Dîsa mixabin ku tenê islamî wî dikin rêberê xwe. Ew nimûneyê gelekî pêwîste ji bo islameke welatparêz û bi kêrî Kurdan were. Ji bo pirsra te erê bandêra Xanî li ser hebû. Ew bi seetan diçû li ber kêla serê wî rûdinişt û ji ruhê Xanî ilham werdigirt. Lê di nivîsên Seîdê Kurdî de ez rastî fikreke dîrekt nehatime ku bibêjim ew sedî sed ji Xanî hatiye standin. Lê hema jiyana seîdê Kurdî ku insaneke ji bo belengazan têkoşerî dikir ne dûtî jiyana Ehmedê Xanî ye.

10- Lîberalîzm û individualîzm di dîtinên Xanî de ?

Xanî mirovekî dilê wî gelekî fereh e. Ji tevaya mirovayetiye re fikiriye û dilê wî li ser serencameke qenc e ji bo temamê xelkê. Ne tenê ji bo Kurdan lê ji bo hemû alemê. Ew ji ber tesewwufa xwe daxwazê ji Xwedê dike ku kesekî nebe nav agirê dojhê. Dixwaze ku Xwedê mirovan hemûyan(helbet dijminan jî) ji agir biparêze. Li aliyekî din ew gelekî bi tolerans e, di mesela evînê de. Evîndariyê mîna qederekê dibîne û qet nake eyb. Berovajî wê evîndaran diparêze û heta sînorekî jî têkiliya di navbera du evîndaran de real û durust dibîne.

11- Dîtinên Sokratî. Dema ji xwe re dibêje Xaniyê nezan?

Gelek ji zanayên berê xwe bi nezaniya xwe didane nasîn. Her imzeya wan ev bû: flankesê bêqedr û nezan!! Li ba filosofên Grîkan ev yek hebû ku digotin: her çiqas mirov zana dibe, ewqasî nezantir dibe. Mebesta wan ji vê yekê ku dawîya zanîne nîn e û ancax kesên zana tê digihin ku ew dûrî pêgirtina rastiyê ne. Xanî jî ji ber ku zanayekî gelekî mezin bû, êdî tê derdixist ku rastî dûrî wî diçe û dike nake tê nagihîje û nagihê bersiva pirsên mezin mîna çima ev dunya heye, çima insan belengaz in û çima ku hezar çima bi dû de tên.

12- Berhemên Xanî, hinek pirsên informatîv û agahdariyan in?

Xanî li pey xwe ji bo me Nubuhara Biçûkan hişt, her wisa Eqida Imanê, dîwaneke helbestan û Mem û Zîn. Dibe ku hin berhemên wî yên din jî hebin û heta niha winda bin, lê rojekê bê dê ew jî diyar bibin. Di dawiyê de em dê firehtir li ser bibêjin.

13- Nivîsandinên bi mebest, bi plan û fikirlêkirî, ne ji bo bêhnderxistinê, belê bi mebestên perwerdekarî, siyasî yan jî neteweyî?

Xanî bi Mem û Zîna xwe him plankiribû ku kitêbekê ji bo Kurdan li pey xwe bihêle û rêyeke xelasiyê bo wan deyne, him jî ew kitêb yan jî ew nivîs ji bo bêhnderxistinê nivîsîbû. Ew bi xwe dibêje ku wî xwestiye bi rêya çîroka Mem û Zînê derdê dilê xwe bibêje:

Zînê û Memê bikim behane
Şerha xemê dil bikim fesane

Xanî li ber xwe projeyeke mezin danîbû. Ew jî kurdîkirina islamê, lê mixabin kesekî ku bi destê wî bigirta ji mîrîtiya kurdî nebû, loma jî projeya wî nîvkuştî ma û neçû serî.

14- Ji cîlê zeman û serdema xwe zêdetir ji bo nîfşên wêbêyê nivîsandiye, dibêjin hin kes. Dîtinên te?

Muxatebên Xanî tevaya milletê Kurd bû. Mîr û wezîr, zengîn û feqîr, şêx û mela û feqî û gundî û rênçber û rewşenbîr. Lê di serî de wî berê xwe dabû otorîteya kurdî û ew bi gunehê bindestîya Kurdan tawanbar dikirin. Wî ji bo kesên dema xwe jî ji bo yên ku wê bên jî nivîsî bû. Loma jî nivîsên wî her zindî û vêketî ne, maye kesê ku destê xwe bavêje wan û gewheran ji navê derîne. Yek caran bala xwe didimê ku xitaba Xanî ji mirovayetiye tevî re ye. Yanî di aliyên xwe yên felsefîk de netewe li ba wî nîn e, mirovayetî bi ferehbûna xwe ve mijara fikr û xebata wî ye. Mînak di pêşgotina Mem û Zînê de ji Xwedê dixwaze ku insanan hemûyan ji agir rizgar bike ji ber ku gunehê wan ne bi destê wan e!!

15- Dema Xanî dema aqil û mêjiye. Zemanê Descartes û gelek zanayên din e. Rola aqil û giraniya aqil çend e, Xanî çendî agehdar e ji hemdemên xwe, li Rojava dema behsa vekirina deriyê zihîn dike, dema behsa girîngiya xwendinê û xwedankitêbbûnê dike, têkiliya nav xwendinê û aqil, rola xwendinê ji bo aqil?

Ev yek li ba Xanî xwe disipêre bingehke islamî, yanî vekirina derê zihn ne tenê daxwaza fîlosofên rojava bû. Di quranê de doza fikirandina di hebûnê de heye, doza vekirina deriyê zihn û têramîna di gerdûnê de di mexlûqatên Xwedê de di fikra islamî de heye. Ez ne di wê baweriyê de me ku haya Xanî ji fîlosofên rojavayî yên dema xwe hebû. Bingeha Xanî û fikrên wî yên felsefîk bingehke rojhilatî ye. Îmamê Xezzalî. Ibnu Sîna. Ibnu Ruşd û Ibnu Erebi û mutesewwifên din jêder û çavkaniyên wî bûn. Helbet haya wî ji felsefeya yûnanî ya kevin jî hebû. Çiku felsefeya islamî bi xwe li ser hîmên ya yûnanî avabûbû.

16- Aliyê perwerdekarî û aqil li ba Xanî, aliyê pedagojîk û metod?

Xanî du namîlke(kitêbok) ji bo xwendevan û telebe û feqiyên medreseyan danîn. Min berê jî got ku mebesta Xanî kurdîkirina Îslamê bû. Wî Eqîda Îmanê ji bo xwendekaran danî, her weha Nûbuhara Biçûkan ji bo fêrbûna zimanê Erebi(bi taybetî ferhenga quranê) nivîsî. Di van berheman de Xanî şîretên exlaqî jî li xwendevanan dike. Yanî ne tenê zanîn lê exlaq jî hedefa wî ye.

17- Dersên li medreyên Kurdistanê dihatin xwendin û hebûn û nebûna berhemên Xanî di nav wan de?

Herdu kitêbên Xanî(Eqîda Imanê û Nubuhara Biçûkan) di nava rêza kitêbên perwerdeyê de bûn. Heta niha jî li hin medreseyan tene xwendin. Her weha şerh jî li ser Eqîda Imanê hatin nivîsîn(mînak Mele Ehmedê Qoxî rêberê sanî li ser şerha kitêba Eqîda Imanê ya Xanî

nivîsiye û ew berhemeke hêjaye) her weha çend caran Nûbuhar hatiye çapkirin û li her çar parçeyên Kurdistanê jî belav bûye û hatiye naskirin.

18- Agehdarê rewşa gel e, dibe ku li paytextan jî geriyabe û dîtibe ku kesê bêdewlet çendî bi kapasîte dibe bila bibe, nirxekî wî tune ye û ev bûbe sebeb û tehnek ji bo wî, da ku dest bavêje qelemê?

Xanî eşkere kiriye ku hedefa wî ji Mem û Zîne danasîna milletê kurd e û beyankirina têkiliya wî ya bi wêje û zanîne re ye. Her weha xwestiye bibêje ku milletê kurd ne di dema hovîtiyê de ye, ew milletekî di nav de çîrokên payebilind yê evînê diqewimin, temamen mîna Farisan û Ereban û xelkên din e. Wî bi Mem û Zîne piştgiriya Kurdan kiriye û bêguman hin tahne vegerandine, çiku ez bawer dikim, ji wê demê de milletên derûdora Kurdan, Kurd bi nezanî û hovîti û bêkîtêbî tawanbar dikirin.

19- Mirov dibîne ku hêrseke wî heye li himberê desthelatdarên serdest. Xanî hez ji wan nake û nexwestiye têkeve ber siya wan û di riya wan re mîna hin kesên din riya modeyî û nebaş, ne bi şexsiyet bineqîne. Ev tiradisyoneke rewşenbîrî ye, ev tercîh û neqandinek gelekî bi şuûr û hişmendane ye, ji bo vê tu çi dibêji?

Xanî mînaka rewşenbîrê têkoşer e. Rewşenbîrê guhertinxwaz e. Rewşenbîrê ku her li hêla gel radiweste û dijîtiya desthilatdariyê û zulmê dike. Di vir de tiştê balkêş ew e ku Xanî di gel ku desthiladarîya biyaniyan bo xwe kiribû hedef û doza liberrabûna wê

dikir, desthilatdariya hundur ji rexneyên xwe bêpar nekiribû. Yanî wî ne tenê Osmanî û Ecem di bindestiya Kurdan de tawanbar dikirin, di heman demê de mîrên Kurdan jî rexne dikirin û digot: ku gunehê we jî heye. Ew dikare ji bo rewşenbîrên vê dema me bibe mînakekî berbiçav. Yanî rewşenbîrê Kurd yê ku li himber neyaran têkoşînê dike, divê çavê xwe ji şaşiyên desthiladraiya kurdî re jî negire.

Fîlosofê îtalî Antonio Gramsci her mirovî bi rengekî ji rengan rewşenbîr dibîne, lê dibêje ku ne her kes dikare wezîfeya xwe ya civakî bibîne û roleke girîng di guhertinan de bilîze. Avayî li ser vê baweriya xwe têrma (Organik intellectuals) derxiste meydana wêje û felsefeyê. Li gor wê têrmê hin rewşenbîrên mezin hene wezîfeyeke wan ya mezin di civakê de heye. Ew cûre rewşenbîr bi tu awayî ne dûrî doza gel û tevgerên civakî û siyasî ne. Di bircên bilind de dûrî civakê rûnanin û pişta xwe nadin êş û jan û hêviyên xelkê. Di vê mijarê de Gramsci nêzîkî mutesewwufên mezin yên mîna Geylanî û Hellaj dibê. Wan jî digot ku : derdê me rihetiya mirovan e, yan bi gotina Erebî ya Geylanî: hemmuna rahetul xelq!

Eger em Xanî bi vê rastkêşê bipîvin em dibînin ew yek ji girîngtirîn rewşenbîrên rojhilatê yên wezîfedar e. Wî bi xwe gotiye ku ew ji bo xelkê derdan dikêşe:

Saflî şemirand vexwarî durdî
 Manendî durrê lîsanê kurdî
 Înaye nizam û intizamê
 Kêşaye cefa ji bo yî `amê

Yanî wî zimanên serdest yên Erebi Farişî û osmanî li pê xwe hiştin û bi wan nenivîsî û dest avête qelemê û bi kurdî nivîsî, wî ev zehmetî û cefaya nivîsandina bi kurdî ji bo xelkê kiriye!

Di vê çarçovê de Xanî ne tenê li ser eniya derve şer dikir û xizmeta gelê xwe bi ronîkirina bîr û hişê wan dikir. Ne tenê bala wan dikişand ser xeterên derve. Wî hundur jî ji bîr nekir û bi eynî cesareta ku pê pirsên mezin derbarî mijarên felsefîk ji Xwedê dikirin û bi eynî cesareta ku pê doza serhildaneke mezin li himber Rom û Eceman dikir. Bi wê cesaretê rexne li hakimên Kurdan jî dikirin. Rexneyên tund û tûj li mîrê dema xwe jî dikir. Wî qet ne digot: de bila be, şerê me yê esasî li himberî neyarekî mezin e, bila em çavên xwe ji şaşiyên mîr û serekên xwe re bigrin, wî ne digot niha em di halekî de ne ku ne layiq e em rexneyan li mîrên xwe bikin. Lê berovajî vê nerînê heta jê hat wî mijara bindestiyê û perîşaniya Kurdan weke yek mijarê didît. Cudayî nexiste navbera dijminê derve û yê hundur. Ji xwe mîrên Kurdan mîna hevkarên desthilatdarên derve didît û digot: Namûs e li Hakim û emîran!!

Bi vî awayî Xanî xwest rola xwe ya mezin di guhertinên bingehîn de bilîze. Li eniya ziman, wêje û kurdîkirina diyanetê, li eniya hundur û rexnegiriya civakê û mîran, û di eynî demê de li eniya derve xebateke bê rawestan dikir. Xanî heta ku karibû otorîteya rewşenbîr ji bo xizmeta gelê xwe bi kar aniyê û negotiye: ma wê rexneyên min şairê reben çi guherînan çê bikin!

Li vir ez minasib dibînim ku Xanî û Cizîrî hinekî bidim

ber hev. Melayê Cizîrî jî yek ji rewşenbîrên demên me yên pêşîn bû. Ew jî yek ji pêşengên afirandina wêjeyê kurdîzman bû. Lê di aliyê xwe yê wezîfedariya rewşenbîrî de gelekî li pişt Xanî bû û belkî jî roleke wî ya nebaş di avakirina zihniyeta piştgiriya desthilatdariyê de hebû. Di du helbestên xwe de pesnê mîre Cizîra Botan kiriye û jê xwestiye ku dijber û muxalifên xwe bikuje!! Ew dibêje:

Ê ne wek go bê ser û pa bit di benda xizmetê
Ma di çewgana te her pergende û meqhûri bî!!

Cizîrî li vir eşkere dibêje: divê her kesek li ber mîr mîna gogê be û mîr çawa bixwaze wê gogê bavêje dê bavêje, yê ne wisa be bikeve ber qehr û xezeba mîr.

Di helbesta din de dibêje:

Ê ji emrê tey mukerrem serkeşî kit şubhê şem`
Ber serê tîxê te û meqtûlê mûkarê te bî

Ê ne dewletxwahê hezret bit ji nêva can û dil
Şubhetê ehlê şeqawet qehr û azarê te bî

Her kesê ne j`can du`ago û senaxwanê te bit
Girtiyê qeyda te û amancê nûbarê te bî!!

Dibêje yê ku li ber mîr rabe divê mîna mûmekê li ber şûrê wî bihele û were kuştin! Yê ku ne dilxwazê mîr be divê qehr û zordariya mîr bibîne, yê ku ne pesinkarê mîr be û jêre nebe zirneçî û daholvan divê di hebs û zindanan de be û bibe hedefa tîran û were kuştin! Di vê helbestê de Cizîrî alîgiriya xwe ya ji mîr re dîsa dubare dike û dibêje.

Li vir mebesta min ne ew e rexneyan li Cezerî bikim bi

qasî ku vê diyardeyê bînim ziman. Diyardeya ronakbîrê li ber siya siyasetmedar veketî û sînoren têkiliyê bi desthilatdariya hundur ve. Diyardeya rewşenbîrên ku di sîya hakimê kurd de dimeşin û jêre dibin borîzan û şûrê wî radikîna da ku muxalifan ji ber wî ve bikujin yan dengê wan tunne bikin. Li rex wê jî diyardeya rewşenbîrê netirs ku dizanin ew jî bi pêûsa xwe, bi peyva xwe û bi tesîra xwe ya li civakê hêzeke mezin in û divê otorîteya gotinê ku ne kêmî ya çekan e bi kar bînin.

20- Helbet kesekî rewşa xelkê, bihevrenebûna xelkê û tifaq û bêserokaytiya xelkê ji xwe re kiriye derd, çima ne bi zimanê xelkê belê bi zimanekî bilind û ne yê xelkê nivîsandîye. Gelo ji ber wê ye ku xîtabî mîrek û mezinan dikir û yan jî gelo ji ber ku bi tenê ji bo siberojê û cîlên wêbêye dinîvisand?

Li ser zimanê Xanî mirov dikare bibêje ku Xanî bi qesdî û zanebûn bi wî zimanî nivîsiye. Ew zimanê astbilind zimanê dîwanên mîran û meclisên şair û aliman bû. Muxatebê Xanî yê sereke, zana û mîrên Kurdan bûn loma jî bi zimanekî bilind ango zimanê wan bi xwe bi wan re axivîye. Lê dîsa jî di nav de zimanê gel jî bîr nekiriye. Di gelek cihan de ziman nêzîkî ruhê gel e, zimanekî gelêrî ye. Mirovê bixwaze dikare li Mem û Zînê vegere û bi dehan mînan derîne. Mesele dema ku Beko dixwaze Memo germ bike û raza dilê wî derîne, wisa ji Mîr re dibêje:

Go min diye ya Memê hebandî
Kîjek(Qîzek) Ereba ye lêvdeqandî!!

Ev sedî sed bi zimanê xelkên ji rêzê ye, ne zimanekî edebî ye. Û weha gelek mînak hene.

Li aliyê din wî dixwest esasekî ji bo zimanê edebî deyne. Wî bi xwe gotiye ku min zaravayên kurdî têkel kirin:

Buhtî û Mihemmedî û Silîvî

Hin la`l û hinek ji zêr û zîvî

Tersî-`î kirin wekî biçûkan

Înane bi qeyserî û sûkan

Ev hewldana yekem e, li gor zanîna min ku wêjevanekî kurd bi zanebûn zaravayên kurdî li nav hev xistine da ku zimanekî wêjeyî ji bo tevaya Kurdan deyne.

Her weha wî di rêya pirkirina peyvên Erebî û Farisî xwestiye bibêje ku ew çendî di van zimanan de şareza ye.

Xanî bi wan herdu malikên ku di dawiya Mem û Zînê de hatine, ku me li jor tesbît kirine, zimanê ku pê berhema xwe nivîsiye berçav dike. Ew dibêje ku wî zimanê Erebî û Farisî têkelî hev kirine (Bi hezl û bazî) ango wekî lîstik û nîşandina hunermendiyê û hakimiyeta li ser wan zimanan. Bi rastî jî zimanê Erebî û yê Farisî ku di Mem û Zînê de hatiye bi hostatiyeke mezin derbasî berhemê bûne. Wî ne tenê peyvên Erebî û Farisî yên naskirî xistine berhema xwe. Lê heta jê hatiye peyv û gotinên wan herdu zimanan yên ku tenê di ferhengan de hene û nayên bi karanîn jî bi karanîne. Mînakên me yên ji zimanê Erebî ev in:

Yûh: yûh gotineke Erebî ku Ereb bi xwe wê nema bi kar tînin. Ji bo navê rojê hatiye bi karanîn

Kubbar: peyveke Erebî ji bo tiştê mezin di Quranê tenê de hatiye bi karanbîn.

Deyyar: ji bo niştecih tê bi karanîn. Ew jî peyveke quranî ye.

Serser: bi tîpa Sad ê, bayê sar û zuwa ku peyveke quranî ye.

Nisfîyye: pîşekariya paqijkirin û şayikkirina gewher û mirwariyan. Bi qasî ku ez di berhemên Erebî de geriyam e, min tenê di kitêbeke klasîk de dîtiye.

Û weha gelek peyvên din.

Balkêş e ku Xanî peyvên Xwedê hindik bi karanîn e. Du nîvmalik tenê û çend peyv bi Xwedê ne. Ev bi serê xwe mijara lêkolînekê ye.

Malika duyem ku Xanî tê de dibêje:

Buhtî û Mihemmedî û silîvî

Destnîşanî sê devokên kurdiya kurmancî dike. Buhtî devoka ku Cizîrî pê nivîsiye û bêguman Xanî kilîta vê devokê bi dest xistibû ji ber ku him li Cizîrê mabû him jî berhemên berî xwe yên bi wê devokê xwendibûn. Devoka Mihemmedî jî ku Emînê Osman dibêje ew devoka Xanî bi xwe ye û li derdora Hekariyê ku eslê Xanî ji wê herêmê bû belav bû. Devoka Silîvî jî devoka ku ji çemê Dicle heta bi sînorê Bazîdê belav e. Cudatîyên di navbera van devokan de zimanzan dikarin bipên û lêkolîneke berfireh derbarê zimanê Mem û Zînê de binivîsin.

Ya pêwist ji bo me ew e ku Xanî gava yekem ji bo zimanekî standard avêtiye. Wî bi vê gava xwe ya

pêşeng xwestiye ku berhema wî li ba piraniya xelkê were famkirin. Ne ku bibe berhema herêmekê û girtiya êleke ji êlên Kurdan. Gava yekem bû ku Xanî rê li ber devokparêziyê girt û derîyên zimanê kurdî vekirî hiştin. Zaravayên kurmancî yên ku wî dizanîbûn di berhema xwe de têkel kirin û devokek di ser ya din re nedît. Ne mîna hin (Zimannezanên) me yên îro ku zaravayê gundê wan yan dapîra wan zaravayê (herî rast e) û her berhemê bi kodika xwe dipîvin! Xanî dixwest zimanekî ku tevaya kurmancên wê demê tê bigihîjin werîne meydanê. Wî xwest bi vê gavê zaravayan nêzîkî hev bike. Wî bi hesanî digot: neşim, û (nikarim) jî bi kar dianî. Digot nekar, û natewan jî li rex wê datanî. Biwerîne digot û bîne jî! Ji bo (çima) ev çend cûre peyv bi kar anîne:(bo çi? Ji bo çi? Ji bo çira? Çira?). (Bêje. Bibêje. Bibê. Bê) her çar gotin li ba wî hene! (Hin, Hinek, hindek, Hinde) ev hemî durr di vê kana gewheran de diçirisînin.

Niha em dikarin li şopa Xanî herin û bi zanebûn ji her zaravayî, zimanê xwe yê standard ava bikin û zengîn bikin. Rikberiya zimanî ji holê rakin û êdî ji pozê xwe dûrtir bibînin.

Li ser zimanê Xanî nakokî derketin meydanê. Dr. Izzedîn Mustefa Resûl dibêje ku zaravayê Xanî botî ye: Xanî destana xwe di esas de bi zaravayê botî nivîsîye ku ew jî şaxek ji şaxên kurmanciya bakur e! Lê Reşîdê Findê di kitêba xwe de ya ku sala 1986 an bi Erebi li Bexdê derxistibû wisa lê vedigerîne: ji ber ku Ehmedê Xanî xwediyê desthilatdariyeke xurt bû ne tenê li ser zimanê kurdî lê li ser zimanên rojhilatê yên cîranan jî,

em dikarin bibêjin ku şahesera wî Mem û Zîn tevneke hevgirtî û lihevhatîye ji her zarave û zimanî.

Mixabin gelek çaran hin kesên ku Mem û Zîn xwendine, zimanê Xanî yê têkel mîna kêmaniyekê dibînin. Ew kes dixwazin bi pîvanên rexnegiriya îro û li gor şert û mercên êkolên nûjen vê berhema klasîk bipîvin. Ew Mem û Zînê ji sedsala hivdehan hildikişînin û tînin didin ber pertavên rexnegiriya îro ku karekî nerast e.

Min bi xwe bala xwe daye gelek rewşenbîrên Kurd yê Erebînivîs ku şaşitiyeke mezin di heqê Xanî û berhema wî de dikin dema ku şert û mercên afirandinê yê di dema Xanî de binpê û paşguh dikin. Ew nizanin ku ev berhem berhema dem û cihê ku pîr cuda ye ji dem û cihê me yê îro. Bêguman teoriyên Aristo yê di kitêba wî (Hunera helbestê) yê derbarî ciwaniya helbestê de ne mîna teoriyên T. S. Eliot in. Textê (Brokost) yê rexnegiriyê ji bo bejna Xanî gelekî biçûk e û divê yan destên wî jê bibin yan jî piyên wî da ku ew text êdî bibe li gora bejna wî!

Divê em zanibin ku zimanê kurdî di wê demê de nû rêya xwe diçirand. Di nav wan zimanên serdest de, li ser destê klasîkên me ew mîna gundiyekekî ku ji nişkê ve derbasî bajarekî mezin bibe û nizanibe berê xwe bide ku, xwe bi zorê derbasî asta nivîsandinê kir û berhemên hêja hatin meydanê.

Zimanê Erebî êdî kemilî bû û li cîhana islamî ji sînoren Ispanyayê heta Çînê çûbû. Êdî bûbû zimanekî pîroz û pêlêkirina rûpelekê ku herfên Erebî li ser bin, gunehekî mezin bû. Bi sedan û ji her milletî (Suryan, Kurd,

Ecem, Xwedê, Cihû) xizmeta vî zimanî dikirin, ew pêş dixistin, berhem bi Erebbî werdigerandin. Erebbî di demke kin de bû zimanê felsefeyê, zimanê tîbbê, zimanê stêrnasiyê û zimanê her cûre zanistên wê demê naskirî piştî ku tenê zimanê helbestê bû. Bêguman ne tenê ji ber ku ew zimanê Quranê bû wisa pêş ket, lê mîr û sultan û xelîfeyan gelekî alîkariya rewşenbîran kirin û heta di dema wergerê ya pêşî de, di serdema Ebbasiyan de giraniya her kitêbeke wergerandî zêr didane wergêr!

Zimanê Farisî jî zimanê imperatoriyeke bû ku her carê diçû li ber dergehên Atina yê hespên xwe ditewilandin. Erê ew tûşî negbeya islamê bû û hindik mabû ji holê rabe lê li ser destê sultanên Samanî û Xeznewiyan dîsa li ser piyan rawestiya û ji berê geştir bû.

Dr. Zebîhullah Sefa dibêje: (mîr û sultanên serdema Samaniyan heta ku Selçûqî hatin, û sultanên Muxulan li Hindistanê mal bi ser nivîskar û şairan de dirijandin. Alîkariya her kesê ku xizmeta zimanê Farisî dikir, dikirin. Heta tê gotin ku hinek şair mal û samanekî mezin bi dest xistibûn û wekî sultan jiyana xwe dikirin. Dibêjin jî ku Rûdikî malê xwe li ser piştî çarsed deveyî bar dikir. Ê `Unsurî(Nivîskarê destana Wamiq û `Ezra) kêr û kevçiyên metbexa xwe ji zêr çêkiribûn!)

Bila em bibêjin ku ev agahî hemî ji mubalexeyên mêjûnivîsan in. Lê rastiyeke di wan de heye. Bêguman piştgiriya ziman li ba Faris û Ereban dihate kirin. Bazara zanîne li ba wan milletan ne mîna bazara ku Ehmedê Xanî qumaşê xwe tede daxiste ber destê kesên ku buhayê qumaşê wî nizanîbûn. Li ba xelkê bazar

germ û li ba Kurdan jî kesad bû!

Zimanê osmanî jî di gel ku ne mîna yê Erebî û Farisî gihiştî bû jî, lê dîsa li qadeke mezin û fere hatibû belav kirin. Zimanê imperatoriyekê bû ku hîrehîra hespên leşkerê wê ji guhên qiralên Ewropa dernediket û li ber deriyê Viyanayê şingêşinga şûrên wan b û. Di gel wî hawî jî osmanî ji tesîra Erebî û Farisî nefilitîn. Heta yekî mîna Fuzûlî helbestên xwe ji peyvên Erebî û Farisî dagirtibûn.

Îca eger Ecem bi wê hêza xwe û osmanî ku hêza herî mezin bûn di wan deman de ji bin giraniya Erebî derneketin, wê rewşa zimanê kurdî çi bûya! ew zimanekê ku hîç kesek guh lê nake û ne mîrek û ne sultanek piştgiriye dide kesê ku pê dinivîse! Tenê çend siwar li ser piştê hespin lawaz derketin meydanê û tozeke sivik bi xwe xistin! Kê dê guh li wan bikira?

Êdî li ba piraniya Kurdan bi xwe jî zimanê kurdî zimanekî ji bo têgehiştina rojane bû. Nedihate bala wan ku ew ziman jî mîna yên din pê tê nivîsnadin, heta ku di nav hinek kurd de hedîsek li ser zimanê pêxember bi vî awayî belav bûbû:

Dibêjin rojekê Fatma ji bavê xwe pêxember pirsîye: ma ji bilî Erebî ziman hene? Pêxember gotîye: erê, gelek in û di nav wan de kurdî jî heye! Fatma pirsîye: û kurdî çi ziman e? Hîn wisa dengê derî tê, Fatma diçe derî vedike dibîne yek li ber derî rawestiyaye û dipirse: Metê Memed li mal e? Fatma matmayî tê ba bavê xwe û dibêje: yek li ber derî ye wisa dibêje! Pêxember dibêje: ey keça min. Ewê li ber derî Cibrayîl e û bi zimanê kurdî axivîye. De here bêje: erê li mal e!

Ev hedîs bi xwe ne rast e, lê em ji wê tê digihin ku kurdî jî mîna zimanekî xwe di nav zimanên din radikir û dixwest isbata hebûna xwe bike. Dixwest piştgiriya taybetiyên xwe bike û cihêrengî û cudatiya xwe biparêze. Dixwest bibêje ku ez ne zimanê diz û rêbirra me. Ez ne zimanekî kovî me ku ji nivîsandinê re nabim. Şerê zimanê kurdî ji kevin de dihate kirin. Di berhemên kevin de em îşaretin biçûk lê pirwate dibînin ku çawa ev ziman ketibû ber pencê dijminan û dixwest wî tunne bikin.

Şairekî Ereb hebû ku leqeba wî Şeytanê Iraqê bû (Di serdema atabegiyên Xwedê de)di helbesteke xwe de dev avêtiye Kurdên Hewlêrê û ew bi keran şibihandine û têra xwe qerfên xwe bi zimanê kurdî kiriye.

Bêguman mîratê dijmintiya zimanê kurdî li rojhilatê belav bûbû û hayê Ehmedê Xanî û klasîkên me jê hebû loma jî dest avêtin qelemên xwe û milên xwe hilmalan û dest bi piştgiriya vî zimanî kirin û nivîsîna bi kurdî li ba wan bû startejîyeke di ser her tiştî re. Êdî nivîsîna bi kurdî li ba wan bû şerê man û nemanê û bi tena serê xwe û bêyî ku piştgiriye ji mîrekî yan hakimekî kurd bibînin berhemên xwe nivîsîn. Gavên ku wan avêtin şoreşek bû di mêjûya kurdî de ku baweriya Kurdan bi zimanê kurdî xurt kir.

Xanî zimanê kurdî bi durdiya binê peyalê ya gerrek şibihand û di gel wisa jî, di gel gerekî û şêlûbûna wê meya han Xanî (vexwar) û meya pak (Erebî û Farisî) li pê xwe hişt. Di spîkirina sifr de (nivîsîna bi zimanê kurdî de) xebitî û dev ji zêr û zîv berda, lê bi qiriktehlî jî got ku kesî mora xwe li ser wan diravên sifr bixe

nîne!

Bêguman Xanî peyvên biyanî gelekî bikaranîne lê mebesta wî ew bû ku hunera xwe û tewan û şiyana xwe ya mezin di van zimanan de bide xuyakirin, bû. Stratejiyeke pakkirina ziman li ba wî nebû . Û di gel wisa jî xaliya Mem û Zînê xaliyeke kurdî ye bi tayên biyanî hatiye xemilandin û li gor pîvanên klasîk ew xalî bi saya wan tayên rengîn ciwantir û buhatir bûye.

Mirov bala xwe didê ku rêjeya peyvên biyanî, bi taybetî yên Erebi di zimanê çîrokê de li ba Xanî kêmbibe, lê di zimanê felsefe û dîn û tesewwifê de pir e. Yanî derbarê wan mijarên ku Kurdan pê tiştêk nenivîsî bû Xanî bêgav mabû ku pala xwe bide zimanê Erebi û Farişî, ev jî dide xuyakirin ku Xanî berhemên felsefî û dînî û tesewwifê ne bi zimanê kurdî xwendine.

Em nikarin vê yekê ji bo Xanî kêmanî bihejmêrin çiku heta niha me peyvên kurdî yên ku cihê wan peyvên biyanî bigrin nedîtine û peyda nekirine di gel ku bi dehan sazî û instituyên me li Kurdistanê û Ewropayê hene, di gel hezaran nivîskar me hîn jî peyvên şûngir ji bo: Tecellî. Fenaya mutleq. Quwayê cazibe. Hal. Meqam. Keramet. Alemul xeyb. Alemuşşehadet. Ezel...û hwd nedîtine. Ez ne ku dibêjim zimanê me bêkêr e lê dibêjim em bi xwe bêkêr in.

Xanî şairekî li gor karînen xwe zimanê kurdî parastiye û berhemên wî gelek peyvên kurdî yên resen parastine. Mixabin heta niha gelek ji wan peyvan hene ku ciwan û nazik in lê bala nivîskarên me nekişandine û ew hîç nêzîkî wan nebûne û li gewherên ku di Mem û Zînê û berhemên din de hene haydar nebûne. Em wan peyvan

di ferhengên xwe yên nûjen de jî nabînin û tenê xwe qurre dikin û pirrbêjiyan li ser zimanê bûriyên xwe dikin.

Divê em zanibin ku kurdiya me ya îro, ya ku çê xirab paktir e, bi saya wan kesan bûye zimanekî wêjeyê. Ev ziman ne ji ezmanan bi ser me de hatiye, lê hêdî hêdî û di êtûna xebata wêjeyî ya ku bi sedê salan dirêj kiriye de sîqal bûye û bi vî rengê ciwan gihiştiye ber destê me. Divê em êdî nankoriyê nekin û qenciya van klasîkan jî piştguh nekin.

21- Xanî jî mîna Dante dike. Dibîne ku qedrê zimanê neteweyên din heye, belê yê Kurd tune, ew vê zane û ya ku çu rewşenbîr cesaret nake bike, dike. Lê zimanê Dante nêzîkî zimanê xelkê ye. Tu di vî warê de dikarî çî bibêjî?

Berhevkirina Xanî bi Dantê re tiştêkî di cihê xwe de ye. Dantê dema ku piştta xwe da Latînî û bi zimanê gel nivîsî, xwest hestên netewî li ba milletê xwe istismar bike. Xanî jî wisa kiriye. Ez bawerim Xanî dikaribû Mem û Zinekê bi Farisî birêse ku deh carî ji ya kurdî xweştir be. Lê kurdî tercîha wî bû. Em nabêjin çima zimanê wî ewqasî giran e, divê em pîvanên rexneyî yên li gor dema Xanî bikar bînin. Wî dixwest qedrekî wêjeyî di nav gelan de ji bo Mem û Zînê deyne. Berê Memê Alan hebû û bi zimanê gel bû, eger wî jî bi wî zimanî binivîsanda wê tu cudatî xuya nebûna. Me di bersiva berê de bi firehî behsa zimanê Mem û Zînê kir. Ne hewceye em dubare bikin.

22- Ji vê awurê Xanî mirovekî qalibşikên û guhertinxwaz û radîkal e, dema ne bi zimanê

serdestan belê bi yê zikmakî dinîvisîne. Ev şêwe radîkaltî bi awayê xwe mîna radîkalîzma Martin Luther, Jan Huse, Kalvin û Zivingli ye. Radîkalîzma wî ne bi tenê di nivîsandina bi zimanê kurdî de ye, belê di naverokê de jî xwiyaye dema behsa Ereb, Faris û Roman dike ku dê ji me re bikirina xulamî.

Xanî bi xwe behsa qalibşikêniya xwe dike, wî Mem û Zîna xwe mîna gaveke qalibşikênî hesabandiye û dibêje:

Yanî ne ji qabilî û xebîrî
belkî bi te`essub û e`şîrî

Hasil ji î`nad eger ji bêdad
ev bid`ete kir xilafê mu`tad

Safî şemirand vexwarî durdî
manendê durrê lisanê kurdî

Înaye nizam û intizamê
kêşaye cefa ji bo yî a`mê

Ew dibêje ku wî bi vê berhema xwe qalibên kevin şikandin, dest avête zimanekî kurdî ku mîna girrika di binê peyalê de dimîne û bala kesî ji bo vexwarinê nakişîne. Rast e ev gava wî ya ku hûn dibêjin radîkal e ne tenê ji hêla zimên de bûye, lê ew bi naverokê jî gaveke bi cesaret bal bi qalibşikêniyê ve ye. Yanî eger em wî û Cizîrî bidin ber hev, Cizîrî jî bi kurdî nivîsî, lê naveroka Cizîrî evîndarî û xezela ilahî bû, rûhaniyyet bû. Eger em wî û Şerefxan bidin ber hev, em dibînin ku di naverokê de nêzîkî hev in lê di ziman de Xanî li pêştir e. Di vir de nirxên Xanî yên şoresgêrî diyar

dibin. Wî him ziman him jî mijar û naveroka berhemên xwe ji hestên neteweperestî hîlbijartibûn. Bingeşa wî her milletê Kurd û derdê milletê Kurd bû. Ev bû qalibşikîniya wî.

23- Netewîtiya Xanî li pêşiya demê ye. Helbet berî Xanî jî gelek Kurdan bi kurdî nivîsandine, belê Xanî dewleta Kurdî dixwaze û doza yekîtî û rizgarbûna Kurdan dike.

Rast e. Li pêşiya demê ye, ne tenê nisbet bi Kurdan, lê nisbet bi milletên ewropayî ve jî. Bala xwe bidinê Xanî ev naqosa milletperweriyê vekuta di demekê de ku supayên Osmaniyan (cihad) li ewropaya rojava dikirin!! Îcar şêxekî mîna wî di wî quncikê jibîrbûyî jî imperatoriya Osmaniyan bangî milletê xwe bike û dozê li mîr û siyasetmedarên Kurd bike da ku serî hildin û şûr di rûyê sultanê Osmanî û artêşa wî de bilind bikin, tiştêkî divê lê bête kolandin û bingehên vê daxwazê werin naskirin. Wê demê Ewropiyên (Xaçebîn) bi artêşan pêşberiya Osmaniyan dikirin. Xanî yê (misilman)jî bi qelesa xwe! Divê ev yek bibe mijara gelek lêkolînan û zanayên Ewropî jî beşdarî nîqaşên bi vî rengî li ser Xanî bibin. Ji bo wan jî Xanî semboleke berxwedanê ye ku mixabin ne berê ne jî niha guh li vê banga azadiyê ya Kurdan nakin û çavên xwe ji kiryarên dijminê gelê Kurd re digrin. Bala mirov dikişîne ku Xanî bêtir rizgariya gelê Kurd kiribû mijar ji bo xwe, ne rizgarkirina axa welêt! Çawa be azadiyeke Kurdan ya (cografîk) hebû, yanî mîrnuşîniyên Kurdan hebûn ku Kurdan bi xwe ew bi reve dibirin. Heta tê gotin ku Xanî bi xwe jî yek ji karmendên mîrnuşîniya Bayezîdê

bû. Lê derdê Xanî bêtir ji wê nîvazadiya han , serxwenbûn û dewlet bû.

24- Ne bi tenê bi kurdî nivîsî, belê ala dewleteke kurdî jî rakir.

Erê, min niha got ku derdê wî serxwebûn bû. Wî bêdudilî û gelekî zelal digot: em ji bindestê Romiyên derkevin û dewleta xwe bi şûr ava bikin! Yanî xwedî projeyeke siyasî bû jî li rex projeyê xwe yê wêjeyî.

25- Kêmaniyên Kurdan dîtin. Nebûna serokayetiye, bêtifaqî û hevdingirtin, bêxwendin û bêkîtêbbûn..

Wî serokên Kurdan (mîr û desthilatdar û hakim) sûcdarên herî mezin di bindestiyê de didîtin.

Namûs e li hakim û emîran
Tawan çiyê şair û feqîran?

Yanî ev bindestî barê hakimên Kurdan e ku ew dikarin xebatê ji bo rizgariyê bikin, ma qeweta belengazên şair û wêjevanan çî ye û çî di destê wan de heye! Helbet ev yeka wî ne ji bo ku bar ji ser milê rewşenbîr bihavêje bû, berovajî vê wî dixwest rewşenbîr jî bi erkên xwe ve rabin û beşdarî şerê azadiyê bibin. Bi qelemên xwe bi zimanê xwe î bi hêza xwe ya wijdanî û rûhî. Ew bi xwe jî mînakekek baş bû ji bo beşdariya rewşenbîr di şerê azadiyê de. Wek we jî got wî mîna hekîmekî nebza qels ya milletê kurd , û jariya wî vedigerand sebebên esasî yê mîna bêdewletiyê û bêxwedîtiyê û berî her tiştî bêtifaqiyê.

Lew pêkve hemîşe bêtifaqin
Dayim bi temerrud û şîqaqin.

26- şik û goman tune ku Xanî li serokekî digere, zane çendî hewcedariya Kurdan bi serokekî heye, belê serokê ew dixwaze kî ye, yekî çawa ye û xisletên wî çi û ne çi ne?

Xanî giraniyeke taybet daye rola ku serokek dikare di civakê de û ji bo milletekî bilîze. Wî bala xwe qenc dayê ku milletek çiqasî bi hêz be, dilêr û xurt be bêyî serokekî nikare projeyên mezin pêk bîne. Lê kîjan serok?? Em bala xwe didinê ku Xanî doza serokekî dike nêzîkî wî hakimî ye ku fîlosofê mezin Farabî ew ji bo birêvebirina (El medînetul fadile = Dewleta mukemmel) bi nav kiriye. Xanî dibêje ku ew serok divê berî her tiştî têkildarê zanînê be. Jîr be. Xemxurê xelkê be. Serfiraz be. Dadwer be. Dilêr be. Hişmend be... û hdw. Lê ku mirov bala xwe didê dibîne ku kesên rêveberiya milletan di dirêjîya dîrokê de kirine (her wekî Gostav Le Bon dibêje) bi piraniya xwe ne kesên bi fikr û felsefeyê re têkildar in û nikarin têkildar bin !

Nivîskarê Ereba Hadî El Elewî jî dibêje ku tevgerên siyasî bêtir li ser destên serokên xwedan hin akarên taybet in ku di rewşenbîran de nînin. Loma jî peyrewên wan serokan piraniya xelkên kêmsewad in, ji ber ku ew kes xwe dispêrin îdeolojîyê, ne hiş û aqil. Peyrewiya fîlosofê yan ramyarekî li ser bingehe fikiranidin û hiş û mejiyekî fere ye. Peyrewên fîlosofan tim kesên hişmend in ku bi aqil re têkildar in. Ne mîna peyrewên pêxemberan û serokên siyasî.

Hêviya Xanî di mîrê Bazîdê Mîrza beg de hebû ku projeyên wî pêk bîne. Bi kêmanî qedrê wî zanibe û

alîkariya wî bike di bilindkirina asta zanînê de li wê herêmê. Ew nêzîkî desthiladariyê bû û xwe nêzîktir dikir ne ku berjewendiyên xwe yên şexsî bîne cih. Lê wî ji bo tevaya (Kurmancan) xebat dikir û dizanîbû ku projeya wî eger ne di rêya serokekî mezin re be, dê tucarî pêk neyê. Wî him serokekî ku guh bide zanînê dixwest, him jî yekî ku gelê wî ji bin destê Romiyan derîne dixwest. Lê ev daxwazên wî di demekê de hatin ku mîrîtî êdî qels bûbû û destên Osmaniyan ketibûn her devera mîrîtiyê. Mîrza beg ji textê mîrîtiyê avêtin û apê wî Brahîm anîn. Pişt re apê wî jî avêtin. Mîr Mihemmed kuştin û êdî mîrîtî ber bi têkçûnê ve diçû. Hêjayê gotinê ye ku Xanî ne bes doza mîrekî ku li Bazîdê tenê hukum bike dixwest. Wî doza padişahêkî dikir. Padişahêkî xwedan text û tac û dewlet.

Xanî rola xwe ya wek rewşenbîr ji bîr nekir. Wî mîr bi cesaret rexne kir. Çi Mîrza beg be û çi jî her mîrên din. Her ku fersend didît rexneyên tûj li şeweyê mîrîtiyê dikirin. Têra xwe rexne li mîr Zêndîn kirin. Bi wî awayî wî nerînên xwe û baweriyên xwe yên siyasî jî anîne ziman. Têgihiştina wî ya ji mijara serokayetiye re hişt ku destê xwe li ser cihê birînê deyne û derman jî destnîşan kir. Wî dizanîbû ku kesên li dora mîrekî dikarin mîrîtiyê biherifînin û bi gotina wî (qusûrê têxin dewletê). Wî da zanîn ku mîrên jîr her yekî nêzîkî xwe nakin, meger ku wî qenc ezmûn û imtihan nekin. Payeyên bilind nadin her wezîrî. Di mêjûya wêjeya kurdî de Xanî yekem kes bû ku bêtirs rexne li mîrên welatê xwe kiriye. Wî hîç negot de ka niha em çavên xwe ji kêmaniyên mîran re bigrin. Hey welatê me û gelê me bindest e. Wî negot ku armanca bingehîn tenê

rizgarkirina welat û avakirina dewletê ye. Wî li rex doza azadiyê, rexneyên li serokan jî ji bîr nekirin.

26- Xanî tije bang, şîret û mesaj e ji bo Kurdistan.

Erê. Ez her û her Mem û Zînê û berhemên Xanî yên din mîna deryayeke mişt sedef û dur û mirarî dikim. Tenê li me dimîne ku em noqî deryaya Xanî bibin û van gewheran bidin hev û bînin ber ronahiyê.

Xwendevanê Mem û Zînê tê derdixê ku Xanî dest bi xelekek mezin kiriye ew jî Xwedê û hikmeta afirandina gerdûnê û mirovan e. Pişt re dageriyaye xelekeke tengtir ku ew xeleka mirovayetiye ye û piştgiriya mirovan li ber Xwedê kiriye û doza rizgarkirina hemî mirovan ji agirê dojhê kiriye, ji ber ku destê mirov di gunehkariyê de nîne (helbet li gor baweriya Cebriyyetê ku Xanî pê bawer bû). Piştî van xelekên mezin û esasî Xanî derbasî xeleka kurdaiyê dibe û halê Kurdistan tîne ber çavan. Li pey wê êdî derbasî çîroka xwe dibe. Dest bi pesnê mîrê Botanê dike. Herdu xûşkên wî bi xameya xeyalê xwe dikêşe û dadigere ser herdu hevalên hev Mem û Tacdîn û çîroka evîna herçar yaran (Mem û Zîn. Tacdîn û Sitî) bi hunereke bilind li qelem dide. Û di nav çîrokê de jî gelek bîr û baweriyên tîne ziman çî li ser zimanê karakterên xwe û çî jî di dawiya her beşekê de ku nivişkê baweriyên xwe bi xwe dibêje. Dawî dîsa Xanî ber bi jor diçe xwe digihîne xeleka mezin û nêzîkî pirsên felsefî yên mezin dibe. Çawa bi Cebriyyetê (bêviyanî) dest pê dike wisa jî destana xwe bi Cebriyyetê dibe dawî.

Di pêşgotinê de Xanî daye ser şopa klasîkên Eceman û pesnê Xwedê kiriye mîna afrênerê gerdûnê. Qala

afirandina Adem wek nimûneyekî ji afrîdeyên Xwedê kiriye ku hemî tişt di xizmeta wî de ne. Ehmedê Xanî dibîne ku hebûn tev de pencereyeke ku ciwaniya Xwedê û hêz û şiyana wî dide xuyakirin. Loma jî mirovan û her afrîdeyî bêşiyar û bêvîn li ber irade û vîna Xwedê dibîne. Vê baweriyê ji xwe re dike bingeh û Îblîs(şeytanê mezin ku hişt Adem û Hewwa ji bihiştê derkevin) ji gunehê sernetewandina ji Adem re bêrî dike û dibêje ku destê wî tê de nebû(vegera şiroveyan). Pişt re wekî her klasîkekî behsa mezinahîya pêxember Muhemmed dike, hinekî ji jînenigariya wî tîne ziman, mûcizeyên wî dide xuyakirin û bi balkêşî tê ser mijara Mîracê lê ne mîna mûcizyekê. Ew Mîracê wekî bûyerke ku hêj neqewimî be tîne ziman û dozê li pêxember dike ku xwe amade bike daku hilkişe ezmanan û here ber destê Xwedê. Lê ew vê dozê li pêxember dike ne ku here fermanên Xwedê ji bo mirovan bîne. Ew dibêje here van pirsan jê bike. Û çend pirsên giring û felsefî ku bala mirovan dikişînin li ber destê pêxember radixe.

Tiştê balkêş ew e ku Xanî yê bi cebriyyetê bawer û dibêje hîç mirov ne bi destê xwe ye, sed û heştê dereceyî dizîvire û nerînên wî tîne guherîn dema mijar dibe mijara bindestîya Kurdan. Li vir êdî Xanî bi vîn û irade û şiyana milletan bawer e. Ew dibîne ku milletek dikare qedera xwe biguherîne eger bixwaze û dest bihavêje şûr!(Malik 215).

Xanîyê ku hîç vîn û hêzê di mirov de nabîne li ber hêz û viyana Xwedê, êdî bi hişkî vekirî dirame. Li bingehên bindestîya Kurdan digere û serpoşê ji ser

hoyên mana Kurdan ya bê dewlet radike.

Li vir hêja ye ku em wê hedîsa di destpêka Şerefnameyê de bînin ziman. Ew hedîsa ku dibêje pêxember nifir li Kurdan kiriye ku hîç nikaribin bibin yek. Wa diyar e ku ev hedîs di nav Kurdan û xeyrî Kurdan de belav bûbû heta ku Şerexan ew di kitêba xwe de wekî rastiyeke aniyê. Şerexan jî ev hedîsa nerast ji jêdereke Osmanî(tarîxa ku Se'eddînê mamosteyê sultan Murad daniye) wergirtiye. Ev hedîs jî li gor baweriya Xanî (Cebriyyetê) ye. Yanî Kurd li gor daxwazeke xwedayî wisa bêdewlet û neyek mane! Lê em bala xwe didin Xanî ku ew hîç li vê hedîsê ewle nabe, baweriyê pê nayne û wê dihavêje pişt guhê xwe! Doza yekîtiyê dike û çareyên mentiqî ji bo pirsgerêkên Kurdan dibîne. Ew nabêje ku Xwedê wisa kiriye ka em jî stûyê xwe radin û bi qedera xwe razî bibin. Lê şert û mercên hilbûneke dîrokî datîne û dibêje ku serokekî xurt û mezin divê ku bibe xwedan tac û text, hêz û şîyan û vî gelê bindest bide pey xwe û wî li ser piyan rawestîne. Li vir şeweyê cuda yê ramangeriya Xanî eşkere dibe. Ew li Kurdan dinêre mîna beşek mirov ku xwedan hêz û hîkarî û tîn in. Dikarin roleke mezin di guhertina dîroka xwe de bilîzin. Dikarin qedera xwe ya reş biguherin. Ew Kurdan mîna milletekî ji bendên qedere rizgar, dibîne. Ji bo vê jî ew berê xwe nade Xwedê, duayan nake ku gelê wî ji bin destan derîne(di gel ku ew ji Xwedê dixwaze ku mirovan ji dojhê bisitirîne). Ew yekser berê xwe dide gelê xwe û mezinên gelê xwe ku bi destê xwe, xwe azad bikin. Ew hîç ne li hêviya (Çareyên ezmanî) ye, lê ew li erdê li çareyan digere.

Lê dema ku Xanî behsa mirov wek nirxekî û hebûneke taybet di gerdûnê de dike, wî bi yekcarî bê vîn û irade dibîne. Wa diyar e ku Xanî dixwaze bibêje ku mirov bi tena serê xwe hêza wî nîne tu guhertinan bike. Lê dema ku dikeve nava civakê êdî dibe xwedan rol û viyaneke serbixwe. Dikarim bibêjim ku ev herdu astên fikirandinê li ba Xanî ne nakokî ne û nayê wê wateyê ku gotinên Xanî li hev nayên û ne mîna hev in. Lê di baweriya min de dema wî derdên milletê xwe anî ziman, mîna sosyologekî fikiriye. Û dema ku behsa mirov wekî hebûneke serbixwe yan afrîdeyekî Xwedê kiriye, mîna fîlosofan fikiriye. Di vir de ew mîna EL Me`errî yê şairê Ereb e(şairê kor yê ku leqeba wî fîlosofê şairan û şairê fîlosofan bû). El Me`errî digot ku xoyên mirov û kiryarên wî û sinç û exlaqên wî ne bi destê wî ne û ew mecbûrî wan e. Lê dema ku wî zor û sitema desthilatdaran didît, berê xwe dida desthilatdaran bi xwe û digot ev zor û sitem sîc û gunehê wan e, loma jî wî serhildana di rûyê wan de pêwîst û rewa didît.

27-Gazinan ji Xwedê dike, ev bûye şêwe tiradisyonek li ba beşek ji rewşenbîrên Kurd. Fayîq Bûcak helbestek bi navê Gazin ji Xwedê nivîsandîye, Mûsa Anter jî heman gazinan dike û dibêje “Xwedê navê te ne 1001 belê 1002 ne.” Hunermend û dengbêjên Kurd jî wek nimûne Mihmed Şêxo jî gelek caran vê peyvê binav dike, serî lê dide.

Erê Xanî berê xwe dide Xwedê û gazinan bi navê milletê Kurd jê dike. Pirsar bindestiya Kurdan,

mezlûmiyeta wan û hin pirsên felsefîk yên mezin jî jê dike. Xwedê bi xwe wek berpîrsê gerdûnê tevî dibe muxateb ji bo herkesî dema ku erd lê teng dibe. Çare jê tê lavakirin. Ê hin caran gazin û lome jê dibin. Di beşê milletperweriyê de Xanî Xwedê sûcdar jî dibîne,

emma ji ezel **Xwedê** wisa kir
ev Rom û Ecem li ser me rakir!!

Yanî bindestiya Kurdan Xwedê kiriye qederek ji bo wan, ev jî helbet cihê nerazîbnûnê ye. Di baweriyaya min de ev cesareta li ber Xwedê ji bingehek tesewwufî tê. Çiku sofîyên mezin mîna Mensûrê Hellac û Ibn Erebî û heta Baba Tahîrê Uryan jî bi Xwedê re rû bi rû dibin û pirsên mezin jê dikin. Baba Tahîr li ser belengaziya insanan weha dibêje:

Eger destim resed ber çerxê gerdûn
Ez an pursema kî î n çûnest û an çûn?

Yekî ra dadeî sed barî nî`met
Yekî ra qursî cû alûde der xûn!!

Yanî: eger destê min bigihêje çerxa Felekê ezê vê pîrsê jê bikim(Helbet Felek di destê Xwedê de ye û bi xwe ne xweda ye):

Te sed barê nî`metan daye yekî, û yekê din jî kulorek nanê cehî bi xwî nê misdayê dayê!!

28- Xanî pirsan dipirse, di serê xwendevanên Kurd de pirsan çêdike, mêjiyê Kurdan, zana û deselatdarên Kurdan vedixwîne fikirkirinê û derketina ji nav xewarî û tiraletiyê. Bêhna şêweronesansekê ji vir tê, hinekî felsefî ye, ji ber ku felsefe û ronesans hin ekî bi pirsan dest

pê dikin û di serê mirov de pirsan çêdikin.

Xanî avakerê çanda pirsê ye, di mêjûya wêjeya kurdî de. Pirsên felsefî. Yên dînî. Yên civakî û siyasî û heta yên wêjeyî. Wî deriyê pirsan ji bo me li piştê vekir û divê em jî li pê wî pirsînê berdewam bikin. Berê xwe berî her kesî da Xwedê û pirsra afirandina insanan jê kir û ew berpirsiyarê afirandina Îblîs dît. Got ku Îblîs wek mexlûq bêguneh e, guneh yê te bi xwe ye. Ji vê yekê jî Xanî doz li Xwedê kir ku tevaya mirovahiyê, hemû insanan ji agir rizgar bike û tenê(eger pêwist be) Îblîs bavêje nava êgir!!

29- Gelo hayê Xanî ji Selahedînê Eyûbî hebû, hebûbe çend e ? Gelo dema behsa bêeslan dike ku ew jî yanî nasnekirina qencî û xizmetê, bêhurmetiya ji zarwên Selahedin re. Gelo di bala wî de dema balê dikşîne ser bêeslan, kesên bi qedir û qîmetê xizmetê nizanin. Mebesta wî çibû?

Ya din dema mirov bala xwe baş dide dîtin û şîroveyên Xanî, fikreke wuha çêdibe li ba mirov ku Xanî kurdbûn di ser îslamê re digirt, yan na?

Haya Xanî ji Selahedînê Eyyûbî hebû yan nebû! Em nikarin rastiyeke bînin meydanê. Lê ez bawer im ku haya Xanî bi tevayî ji dîroka Kurdan hebû. Wî bêguman lêkolîn li ser dîrokê kiribûn û gihabû rastiyeke. Fikrên wî ne ji hewayê hatine. Fikrên wî ji xwendineke kûr û dîtineke hûrbîn ji civaka kurdî re hatine. Ez jî di wê baweriyê de me ku Xanî kurdbûn di ser îslamê re didît. Yan jî em bibêjin wî

misilmantiyeke kurdî tercîh dikir. Loma jî projeya wî ev bû ku islamê bike dînekî bi kurdî jî. Tefsîr ji gotinên Quranê re danîn di Nubuharê de, Eqîda Îmanê bi kurdî nivîsî. Helbet di nava metodên medreseyan de Eqîda Îmanê bi Erebî dihate dersdan, lê wî got: na madem em musulman in bila em dînê xwe bi kurdî fêr bibin! Ev bi serê xwe şoreşeke. Bala xwe bidinê wî gelê Kurd ji musulmantiyê dûrnexistiye, lê heta wê astê jîr bû ku bi iddiayên Osmanîyan û cihada wan ya sexte nedixapiya. Û dixwest millet jî hişyar bike ku islama Osmanîyan islameke derewîn e, islama berjewendiyên siyasî ye û hew. Dixwest bibêje ku islama Osmanîyan ne diyanet lê siyaset e!

30-Li ser otorîteyê û hewcedariya bi otorîteyekê gelekî disekine û bi awayê corecor tîne ziman. Mirov dikare gelek nimûneyan bibîne û hilçine di berhemên wî de. Otorîte hebûya “ emê nebûna kavi û wêran, kund dê li me nebûna kom” , otorîte hebûya em dê nebûna xizan û nezan. Xezantî û nezantiyê bi bêdewletbûn û bibêotorîtebûnê ve girêdide. Zêdeyî texmînan li ser bêdewletbûnê û encamên wê disekine û wek xalek ji xalên serekî digre dest, pê dadikeve.

Derdê wî ev bû. Eşkera û diyar û wek roja sibeheke havînê ronîdar bû. Dewlet! Dewleteke serbixwe di bin ala serokekî jîr û zana de ku nirxê wêje û zanayan zanibe da ku civakê bi hev re pêş bixin.

31- Xanî li ser çare û çareseriyê jî hinek tiştan dibêje. Li vir behsa şûr, xîret û berxwedanê dike. “Di destê şûrê tazî de ye hukum û ferman”

Erê. Piştî ku wî derd û illet bi me da naskirin, îcar navê derman jî got û şêweyê bikaranînê jî anî ziman. Xanî dibêje:

Ger dê hebuwa me serfirazek
Sahib keremek suxennewazek

Neqdê me dibû bi sikke meskûk
Nedma wehe bêrewac û meşkûk

Herçend-i ku xalis û temîz in
Neqdêne bi sikkeê `ezîz in

Ger dê hebuwa me padişahêk
Layiq bidiya Xwedê kulahek

Te`yîn bibuwa ji bo wî textek
Zahir vedibû ji bo me bextek

hasil bibuwa ji bo wî tacek
Elbette dibû me jî rewacek

Xemxwarî dikir li me yetîman
Tînane derê ji dest leîman

Xalib nedibû li ser me ev Rûm
Nedbûne xerabeê di dest bûm

Mehkûmê `eleyhî we se`alîkak
Mexlûb û mutî`ê Turk û Tacîk

Di van malikê nirxdar de yên ku xwezî û lavên Xanî ne, em rexnegirîya Xanî ji mîr re dibînin. Em li gor van malikan dizanin mîrê ku Xanî rexneyan lê dike ne camêr e ne jî dilêr e, lê berovajî wê destgirtî û tirsonek û girêdayê Osmaniyan e. Guh nade wêjeyê û li ba wî projeya Xanî ya mezin tiştêkî pûç û vala ye.

Tiştê ku bala mirov dikişîne ew e ku Xanî doza welatekî dike. Doza dewletekê û padişahêkî dike. Yanî ne tenê xemxurê mîrîtiya Bazîdê yê. Ew dema ku behsa Tex û Tac û Padişah dike, dixwaze bibêje ku dewleteke mîna ya Osmaniyan berfireh û yekgirtî ji bo Kurdan divê.

Xanî nivîsên xwe bi pûl û diravan dişibihîne û dibêje ku ev pûl û dirav bê qîmet in eger mora padişahêkî ne li ser wan be. Çawa pere bê qîmet in ku xitma sultan yan dewletê li ser nebe , wisa jî nivîsên wî ku ne guhdana mezînekî Kurdan be dê her dîlên kaxezên ku li ser wan hatine nivîsîn bin. Li ba Xanî şert û mercên dewletekê ev in:

32- Belê otorîte, serok, hêz û lihevkerin û bihevrebûyîneke neteweyî û jiyana di bin alekê de.

Ji bo wî serokî jî Xanî hin akarên taybet tîne ziman û dibêje ku divê serokê Kurdan wisa be:

- 1) Serfirazî
- 2- Camêrî
- 3- Dan û standîna xweş
- 4- Ê guhdana kesên bi wêje û zanistê re têkildar

Di van akaran de Xanî û filosof Farabî mîna hev difikirin. Farabî jî di kitêba xwe de (El Medîne El fazile= dewleta tekûz û mukemmel) dibêje ku serokê vê dewletê divê, cirxweş be, zimansêrîn be, edebdost û zanînhebîn be, serbilind be, dilêr û xurt be.

Wa diyar e ku Xanî ji mîrê serdema xwe ne razî bû û ev akar û sifet tê de nedîtin.

Em li ba Şerefexanê Bedlîsî jî rastî vê yekê tên ku nebûna serokekî bi van akaran bûye sebeb ku Kurd bê dewlet mane. Şerfexan dibêje: û ji ber ku di nav Kurdan de kesek ranebûye ku hemî têkevin bin ala wî û bi ya wî bikin û li pey wî herin, piraniya wan bûne xûnrêjên hev û guh li qanûnan nakin!

33- *Sedem û hokar?*

Herweha em dibînin ku Xanî rewşa Kurdan û bindestiya wan vedigerînin du sebebên sereke:

Rewşa hundirîn:

Ew rewş sûcê êlperestî û cudatîyên Kurdan e. Ku hemî êl (ji ber ku navenda fermanrewayîyê nîne) li dijî hev in û kes bi ya kesekî din nake. Di Şerefnameyê de hatiye ku dema sultan Selîm xwestiye mîrmîranekî ji Kurdan bike hakimê tevaya Kurdistanê. Ji Idrîsê Bedlîsî re gotiye: Yekî ji nav xwe hilbijêrin. Lê wa xuyaye ku Kurdan nikarîbû yek hilbijartana. Idrîsê Bedlîsî vedigere cem sultan û dibêje: her yek dibêje ez û ne kesî din. Loma jî divê hakimê Kurdistanê ne Kurd be da ku tevde stûyên xwe li ber wî radin!

Rewşa derve: Ew jî sûcê cîrantiya du imperatoriyan mezin û dijî hev e. Osmanî li aliyekî ku Xwedê û sunnî ne. Û Sefewî li aliyekî din ku Ecem û şîî ne. Ji ber vê jî ev herdu imperatorî mîna du deryayên mezin li ser erda Kurdan li bin guhên hev dikevin û Kurdan di nav pêlên xwe de binav dikin. Qedera Kurdan hiştiye ku ew bibin navber û bend ji herdu deryayên pêldar re û buhayê cengên giran yên her du aliyên şer bi tena serê xwe bidin. Eger em vegerin şerê Çaldêranê wekî di

pêşgotinê de hatî, dibînin ku ji herdu aliyan gelek mezinên Kurdan û zarokên wan hatin kuştin. Xanî Kurdan mîna kilîtên ser sînoran dibîne. Rastî wisa bû. Heta çîrokeke sultan Bazîd heye, dibêje ku dema ji şerekî bi sefewiyan re vegeriya, diya wî jê pirsî: kurê min te ew sînorê mezin ji kê re hişt? Sultan got: min dîwarekî mezin di navbera xwe û Eceman de ava kir. Dîsa diya wî pirsî: kurê min çawa çêbû? Ew sînorê wisa dirêj te çi zû dîwar tê de ava kir? Îca sultan got: dayê min dîwarekî ji goşt û xwînê û hestiyên êlên Kurdan li wir ava kir. Ew dê sînor biparêzin!

34- Pêşnizazên Xanî ji bo van herdû sebebên; ango ji bo van pirsgirêkên navxweyî, bêtifaqî, jixweweyî û berdîberdana Kurdan li aliyekî û herdû împeretoriyên bûne du ferên aşê perçiqandin û hêrtinna Kurdan li aliyê din?

Xanî ji bo ku çareyekê ji astengiya pêşî re ku sîcê Kurdan bi xwe ye re bibîne, doza serokekî hêzxurt dike ku karibe Kurdan tev de têxe bin siya fermanrewayîya xwe. Ji bo çareserkirina astenga duyemîn jî Xanî doza şûrkişandinê kiriye:

Herçî bire şîr-i destê himmet
Zebt kir ji xwe ra bi mêrî, dewlet.

Weha jî dibêje:

Hasil ku dinê bi şîr û ihsan
Tesxîri dibit ji boyî insan!!

35- Xanî di gelek aliyên berhema xwe de behsa Rom û Eceman û behsa neteweyên din dike. Neteweyîbûna Xanî ji vê çencarkirinê tê

xiwyakirin. Nasyonalîzim neteweyên dijmin yan jî bi gotinin nermtir miqayesa navneteweyan dixê rojevê. Mirov bi firehî dikare vê behs bike?

Xanî nabêje em wek milletekî, ji milletên dora xwe çêtir û zanatirin, lê dibêje ku em ji wan ne kêmtir in! Bi çî awayî be em xwedan ziman, xwedan erd û xwedan dîrok in. Dibêje jî ku milletên din bûne xwedan dewlet ne ji ber ku zêde kêrhatî ne, lê fersend bi dest wan ket û hilpekiyan lûtkeya desthilatdariyê. Em jî bê şens û bextê me ji me ra nebû yar:

Kurmanci ne pîrr di bêkemaal in
Emma di yetîm û bêmecal in

Bextê me ji bo me ra bibit yar
Carek bibitin ji xwabê hişyar!!

36- Di qonaxekê de ku ramanên olî fermanrewa ne di nav gelên li Rojhilata Navîn de Xanî cihê û xweser e.

Me berî niha jî got ku yek ji bingegehên fikra Xanî Tesewwuf e. Tesewwuf jî bi cesareta xwe navdar e, helbet ne tesewwufa ku vê dawîya Osmanîyan ew di tekiyeyan de kedî û xwedî kir û kire bencek pê gelên imperatoriya xwe bêhêz kirin. Na tesewwufa Hellac û ya Suhrewerdî û ya Geylanî ku bêtir xelk û insan mijara wê bûn. Tesewwufa ku dijîtiya desthilatdariyê û zulmê dike bû. Xanî eger tenê olparêzek bûya, yanî sunnî yekî li pê (Kitêb û hedîsê) tenê çûbûya, dê hîç behsa pîrsa Îblîs û qedere nekira. Ev her du mijar di baweriya fermî ya sunnî de qedexe ne û gelek kes ji bo

wan hatine kuştin(Xeylan El dimeşqî ji bo qederê, Hellac ji bo fikrên xwe yên corbecor). Pirsê Îblîs li ba Xanî pirseke sereke ye, wî ne tenê bi lez behsê kiriye lê kiriye mijareke mezin ji mijarên xwe yên felsefîk. Xanî weha fikrên xwe tîne ziman:

Meqsûd û muradê dil tu şa yî
emma tu (*tuzillû men teşa*)yî

Herçî te divê bibî zelalê
pabend-i dikî bi zulf û xalê

Herçî ku tu bînî ser hidayet
vêra bikirî bikî `inayet

Hazir wî dibî meqamê me`lûm
ger xadim e wî digêrî mexdûm

Bê secde te ey cenabê me`bûd
Adem kire qiblegah û mescûd

Îsa te kusa gihande ewcan
aya bi çi te hebandî ew can?

Dersa ku bi xef te daye Idrîs
elbette diçû meqamê teqdîs

Îblîsê feqîrê bê cinayet
hindî te hebû di gel `inayet

Her roz-i dikir hezar-i ta`et
lewra ku te da wî istita`et

Wî secde nekir li xeyrî me`bûd
gêra te ji ber derê xwe merdûd

Yek secde nebîr li pêşî exyar
qehra te kire (*muxelledinnar*)

Di van malikên buhurî de Xanî pirsêke mezin ji Xwedê dike. Di vê pirsê xwe de jê ew wêrekiyeke mezintir dide xuyakirin û şopa sofiyên mezin yêna mîna Mensûrê Hellac diajo. Xanî dipirse ka gelo çima Xwedê meqamê Adem û Idrîs û `Îsa yê Mesîh bilind kir bêyî ku ev pêxember çu perestiyê ji Xwedê re bikin? Beramberî wê çima Xwedê Îblîs(Şeytan) ji huzûra xwe bi dûr xist û lanet lê barand di gel ku wî bi hezarê salan ibadet û perestiya Xwedê dikir?

37- Em hinekî li reh û rîşeyên vê pirsê bikolin!

Eger em vegezin koka vê pirsê Îblîs di dirêjahiya tarîxa felsefeya islamî de, dê bibînin ku Xanî ji wan kesên ku li ser tiliyên destekî tene jimartin ku piştgiriya Îblîs kirine û itibara wî lê vegeandine.

Di berhemên berî Xanî de em rastî tefsîrên cihêreng dibin ji bo neçûna secdeyê ji Adem re. Hin ji van tefsîran dibêjin ku Îblîs xwebîn bû ango xwe ji Adem mezintir û qenctir didît. Tefsîrek jê dibêje ku ew nezan bû. Yeka din dibêje ku wî dixwest razên Xwedê nas bike loma jê serî dananî. Tefsîrek jê heye dibêje ku Îblîs bi evîna Xwedê mijûl bû û ji bilî wî ji tu kesê din re serê xwe neditewand.

38- Tefsîra quranê jê heye.

Xwebîniya Îblîs di Quranê de derbas dibe û ev bû bingeha tefsîrên islamî ku dibêjin Îblîs ji ber ku ji agir hatibû afirandin ji Ademê jê gil û heriyê xuliqî bû re neçû sicûdê. Di sûretê El Israa de ayeta 61 an Îblîs ji Xwedê re dibêje: çawa ji bo yê ku te ew ji heriyê xuliqandiye herim secde?

Dîsa di sûretê Sad de ayetên 71 heta 77 Quran dibêje: *Xwedê ji firişteyan re got: *ez dê mirovekî ji heriyê biafirînim* îca ku min ew saz kir û ji giyanê xwe pif kirê jê re secde bibin* firişte hemî secde bûn* tenê Îblîs xwe mezin dît û bû ji gawiran* Xwedê gotê: Ey Îblîs çima tu ji yê ku min ew bi destê xwe afirand re neçûyî sicûdê? Te xwe mezin dît yan tu ji xwebînan î?* Got: ez jê çêtir im, te ez ji agir afirandim û ew jî ji heriyê* Xwedê gotê: de jê(ji buhuştê) derkeve tu lanetlêbarî yî!

39- Alim û zanayên bi vê pirsê re, angû bi pirsê Îblîs re serê xwe êşandine zêde ne, wa xwiyaye.

Piraniya fîlosof û zanayên misilman bi vê tefsîrê girtin û ew ji bo xwe kirin bingeh. Mewlana Celaleddînê Romî yek ji wan bû ku di mesnewiyê de dibêje:

Dema ku Xwedê Îblîs ji bo tawana wî û kişmekişa wî ya bi Xwedê re dûr xist û lanet lê barand got: aax ya rebî! Te ev hemû xwest û niha jî tu min dûr dixî!

Û dema Adem gunehkarî kir û Xwedê ew ji buhuştê deranî Xwedê gote Adem: min ev qeder li ser te nivîsandibû û paşê min tu bi wê kiryarê tawanbar kirî, te çima pirsiyar nekî û li ber min ranebûyî! Adem got: yarebî min ew yek zanîbû lê min nexwst bêedbiyê di huzûra te de bikim, `işqa te rê neda gazinan.

40- Bandêra van nîqaş û tefsîrên cihê li ser agir û axê (heriyê), Îblîs û Adem, sal û sedsalên piştê li ser gelên herêmê?

Her weha ev bû bingeh ji bo nakokiyên di navbera Ereben misilman û Farisên ku koka wan zeradeştî bû.

Di destpêka belavbûna islamê de û têkçûna imperatoriya Sasaniyan de, vê nakokiyê serê xwe hilda. Zerdeştîyan agir diparastin û pîroz didîtin û misilmanan jî digotin ku Xwedê herî pîroztir dît loma jî Adem jê afirand. Helbestvanekî kevn (Beşar Bin Burd 714z/784 z) ku bi koka xwe Faris bû di helbesteke xwe ya Erebbî de berê xwe dide Erebbên misilman û dibêje:

*De zanibin ey koma şerûdan
Îblîs ji bavê we Adem bi rûmettir e*

*Agir bingeha wî ye û Adem heriye
Herî jî mîna agir nikare bilind bifire*

Tefsîra din ku me got tê de Îblîs bi nezaniyê sûcdar e, hin mutessewifan ew anîne ziman. Yek ji wan Ibn Erebbî ye ku di helbesteke xwe jî dîwana Tercuman El eşwaq de dibêje:

*Eger Îblîs roniya rûyê yarê di Adem de dîtibûya
Dê jê re secde bibûya*

Melayê Cizîrî jî li pey Ibn Erebbî çûye û dibêje:

*Senema sur ji semed şewq-i ji heq daye wicûdê
Ger `Ezazîl-i bidîta nedibir xeyrî sicûdê*

Dîsa dibêje:

*Ger di Adem bidiya sirrê `ilim Îblîsî
Hînama ebserehû kebbere hînen we secde*

(eger Îblîs raza zanînê di Adem de dîtibûya
dê jê re, ku çav lê biketa, secde bibûya)

Tefsîra din a ku me got dibêje Îblîs dixwest razên Xwedê kifş bike, li ba şairê Farisî Ferîdeddînê `Ettar tê

dîtin. Wî di kitaba xwe Mentiqutteyr de gotiye:

Îblîs ji Adem re secde nebû, da ku raza ruh ya ku dê Xwedê bida Adem bibîne. Dema ku firişte hemî çûne secdê û serî tewandin Îblîs şipê bû û dinêrî! Xwedê jî dît ku Îblîs raz keşif kir îca ew ji huzûra xwe û ezmanan bi dûr xist û ew kire lanetî. Lê Îblîs kêfxweş bû û got:

Ku min raz bi dest xist û gencîneya pak li ber min xuyabû çi xema min ji lanetê ye??

41- Di nav ewqas tefsîr, şîrove û dîtin de ya Xanî zêdetir lê nêzîk û pê bahwer kîjan bû?

Lê heta vê radeyê xwediyên wan tefsîran nebûbûn alîgirên Îblîs, wan her gazin jê dikirin û digotin ku diva bû ew li ber Xwedê serxwar û di fermana wî de bûya. Belê tefsîra din ya ku Xanî jî pê bawer bû, ew e ku dibêje ji ber baweriya Îblîs bi yekxwedayî ew ji Adem re neçû secdê. Bi gotineke din Îblîs di neçûna secdê de kete navbera ferman û vîna Xwedê. Fermanê got here secdê ji Adem re û vîna Xwedê (iradeya wî) hişt ku Îblîs neçe secdê. Îblîs mecbûr bû ku fermana Xwedê red bike, ji bo ku vîna wî ya ezêlî tesbît bike. Xwedê ji berê de gotibû ez tenê Xweda me, ji min pê ve ji kesekî din re serê xwe netewînin. Li vir Mensûrê Hellac dibêje ku Îblîs mamostayê wî ye ji ber ku Xwedê ew bi agir tirsand jî lê dîsa serî ji kesekî din re dananî.

42- Wa xwiyaye yê girêdayê vê pîrsê giş sînor û normên hene bin pê dike, bi dengê bilind û bê virde û wê de, bê mitale û paxav, helwestê Îblîs dipesînîne û jê re li çepikan dide Mensûrê

***Helace. Gelo felsefeya ew piştta xwe didiyê çiyê
û ji bo tefsîra vî ciwamêrî gotinên te çi ne?***

Hellac da ku tevgera Îblîs tefsîr bike xwe dispêre felsefeya Cebriyetê û di kitêba xwe El Tewaşîn de dibêje ku Xwedê ji ezel de wisa nivîsî bû Îblîs jî ne bi destê xwe de bû û herçî wî kir bi iradeya Xwedê bû. Hellac li ser zimanê Îblîs dibêje: yarebî eger te bixwesta herim secde dê di fermana te de bûma. Her weha Hellac di eynî kitabê de dibêje: eger min zanibûya dê secde min ji agir rizgar bike ezê secde bibûma. Lê ji Cebriyetê bêtir Mensûrê Hellac Îblîs wekî evîndarekî mezin ji evîndarên Xwedê dihejmêre. Ew dibêje: û (Xwedê) jê re got: ey kêmnirx tu secde nabî! Got: ez evîndar im û rast im di evîndariyê de.

Di cihekî din de Mensûrê Hellac dibêje: hezretê Mûsa û Îblîs hevdû dîtin, Mûsa pirsî: tu çima secde nebûyî? Îblîs got: ji ber ku min tenê yek xweda nas dikir.

Xanî herçî ku negihaye radeya Mensûrê Hellac di piştgiriya Îblîs de, lê ew jî bi cegermendî piştgiriya dike û neçûna secde vedigerîne him Cebriyetê û him jî baweriya Îblîs ya bi xwedayekî bi tenê:

*Wî secde nebîr li pêşî exyar
Qehra te kire muxelledunnar!*

Tiştê balkêş ew e ku Xanî ji malika 89 an de dest pê dike di piştgiriya xwe de sist dibe û êdî di pêvajoya destana Mem û Zînê de Îblîs wekî şeytan bi nav dike, ku ew jî jêdera her xirabî û fesadîyê ye.

***43- Ev nav û rengdêrê ku ewqas zana ji xelk û
kulturên cihê di serdem û qonaxên kevin û***

piştretir de, ewçendî pê mijûl bûne, serê xwe li ser êşandine, ango gotina "Îblîs" bi eslê xwe ji ku tê, wateya wê çiyê, di vê derbarê de kurt be jî tiştêkî tu bêjî heye? Ji bo vê pirsê gotina dawî, ji ber ku hê pirsên bi bahweriya me gerek bêne kirin hene...

Di dawî de hêja ye ku wateya navê Îblîs hinekî zelal bikim. Koka vî navî ji fiila Erebî eblese tê, eblese yanî bêhêvî bû. Îblîs jî yanî bêhêvî. Ew ji rehma Xwedê bêhêvî bûye û êdî dê tucarî nekeve bin siya rehma xwedayê xwe!

Lê wekî ku Dr. Izzedî Mustefa Resûl dibêje, Xanî xwestiye serencameke xweşik ji Îblîs re deyne. Ew di dawîya destanê de Beko heta buhuştê dibe, ev jî îşareteke zelal dide ku Îblîs jî mumkine derbasî cennetê bibe.

44- Di bersiveke derbasbûyî de te ji bo şîroveyên li ser cihê agir û axê yan jî heriyê, hinek tişt destnîşan kirin û ev jî hinekî bi nakokiyên di nav Ereb û Farisan ve girêdan. Tu li eslê wê binerî, şerê nav Ereb û Farisan jî ne ji ber sebebên olî bû, belê di bingeh û kûraya wî de şewenasyonalîzmek, heger ne pir zelal û sitewayî be jî hebû û li ser deselatdariyê bû.

Rast e. Piştî ku Faris misilman bûn jî şerê wan û Ereban berdewam kir. Yanî ku ola Farisan û Ereban bû yek dîsa jî nakokî man. Kurd jî misilman bûn û Xwedê jî herweha lê şerê wan her li dar bû. Xanî ev yek qenc nas kiribû û qet misilmantiya Osmaniyan nedianî ber çavên xwe. Meziniya wî ji vê yekê jî tê nas kirin. Niha

jî em dikarin fikrên Xanî zindî bibînin. Yanî misilmantiya Erdogan û partiya wî li ber kiryarên wan hîç e. Mesele ne diyanet e, lê siyaset e, weke min berî niha got. Em bi misilmantiyê gelekî hatin xapandin, lê rewşenbîrên mîna Xanî ku hişê wan ji agirê bantovê geştir bû nehatin xapandin. Em bi hewceyî fikreke geş mîna fikra Xanî ne ku ji gelê xwe re sextekariya dîndariya AKP bînin ber çavan.

45- Berpirsiyariya rewşenbîrî. Xanî hesab bi xwe re dibîne, bîra siberojê dibe, bila kes nebêje ku kurd bêkitêb in dibêje. Bêkitêbbûyîne wek kêmaniyeke elementer, wek nekirkêrî û ne layiqtiyeye netewî û netewbûnê digre dest.

Li ba Ehmedê Xanî Kitêb têgeheke wê ye Epistimolojîk heye. Ango kitêba Mem û Zînê ne tenê çîroka du evîndaran e yan jî eşkerekirina derdê milletekî ye. Ew her cûre zanîn, felsefe, diyanet, stêrnasî, civaknasî, tarîx û heta erotîk jî di xwe de diguncîne. Helbet Xanî ne nezan bû û haya wî ji kitêbên beriya wî (dîwan Cizîrî. Şêxê Senanî ya Feqiyê Teyran û helbestên wî hebû. Helbestên Eliyê Herîrî) hebû. Wî navê van her sê pêşengan jî anîye ziman di pêşgotina Mem û Zînê de. Lê mebesta wî ji kitêbê, kitêbeke ku bikaribe hişê gel veke û wî bihêvoje û pirsan di hundurê civakê de bixuluqîne. Wî kitêba xwe ev kitêb didît û wisa jî zanîbû ku nêrînên wî bingeha fikreke nû ne ji bo Kurdan. Wî dizanîbû ku dê Kurd bi vê berhema wî şanaz bibin û karibin li ba milletên din serê xwe hildin û dengê xwe bilind bikin û bibêjin: em jî weke we xwedan kitêb in!

46- Xanî qebûl nake ku Kurd pîrr xav û cahil in, lê bêmecal û bêkes in, sêwî ne. Aliyekî wuha bi gazin jî heye li ba Xanî.

Ev gazinên rewşenbîrekî ne. Niha jî rewşenbîrên Kurd, kê m zêde dikarin gazinan bikin û bibêjin em ne kê mî xelkê ne lê xwedîtiya me naşibihe ya xelkê. Eger na dê me jî poşên xwe li poşên payebilindên edebiyatê bixista. Ma çî Romannivîsekî Kurdan kê mî Orhan Pamuk e ji bilî dewletbûnê (di gel hurmeta me ya mezin ji Pamuk re). Dikarim bibêjim ku sîcê Kurdan berî yê dagîrkeran û dijminê Kurdan heye. Mijar tevlihev e, lê bila hema wisa bimîne.

47- Xanî tije û dagirtî ye ji bo binîvisîne, bi tenê jê re mahneyek divê.

Dilê Xanî eger çî gencexane
Şukur qet kes nego Xanî bi çendan

Ev Xanî di helbesteke xwe de gotiye yanî dilê wî tijî gewher, mirarî û dur in, lê kes nîne ku spasiya wî bike û nîrxê wî yê rastîn zanibe. Wî di devereke din de ji helbestên xwe de gotiye:

Teb-ê Xanî sedefa gewherê îrfane welê
Metnixwanek nebitin sahibê me'na çî bikit?

Yanî tebîet û xwerista Xanî mîna sedefa zanîne ye, tijî ye, lê ku kesek nebe vê zanîne hilgire wê xwediyê zanîne çî bike??

48- Rewşenbîriya Xanî aliyekî hevbeş e, her kesê Xanî hinekî nas dike kê m zêde bi xetên stûr binê wê dikşîne. Em hinekî din vî aliyê Xanî guftûgo bikin, em di sohbeta xwe de çend

mû û mişwarên din xwe bi nav de berdin. Xanî li xwe û li rewşenbîran mîna cor eyek doktoran dinere, wek kesên ku birînên gel derman dikin dinere.

Li vir rewşenbîr doktor e, dermaner û birînpêç e.

Bi dîtina min rewşenbîr pêxemberên biçûk in ji bo gelê xwe. Helbet ew rewşenbîrê ku doza gelê xwe, derd û êşên wî û hêviyên wî di berhemên xwe de tîne ziman. Rewşenbîr têkoşer e, şervanekî çeka wî pênûsa wî û hizrê wî yên netewî û dilxwestina pêşxistina zimanê gel e. Xanî jî bi xwe yek ji van rewşenbîran bû. Wî bi gotina Hemzeyê Muksî Kurd ji mirina ebedî rizgar kirin. Bêguman rewşenbîr pêşengekî gelê xwe ye û ji ber ku ew mirovekî gelekî hessas e bi xeterê zû agahdar dibe. Dizane ba ji ku radibe û fêm dike civat çawa rizgar dibe. Rewşenbîr dizane derdê milletê wî çi ye loma jî dikare derman bibîne. Xanî mînakekî herî qenc e ji bo vê kategoriyê. Wî civaka kurdî û mêjûya Kurdan baş nas kiribû. Têkiliyên durust yên divê siyasetmedar û hakimên Kurdan li dar bixin nas kiribû û li gor zanîna xwe rêyek dîtibû. Loma jî dengê xwe bilind dikir û digot: werin li min guhdarî bikin dê bo we rêya rizgariyê bibêjim. Mixabin di dema xwe de ew şêxekî bê mirîd, pêximberêkî bê peyrew bû. Lê çiqas em niha şanaz in ku fikr û bîr û bawewriyên wî di vê dema me ya nuha de bi kêrî me tînin.

49- Xanî çendî hez ji zimanê kurdî dike heşkere ye. Belê zimanê kurdî jî wek fêkiyekî negihîştî binav dike. Xanî zane ku zimanek bi

*nivîsandinê xwurt û bitir dibe, heger kurdî qels
be ji ber wê ye ku kar pê kê m bûye. Ziman
ihtîmam, pêdaketin, hezkirin û xwedîtîyê
dixwaze.*

Erê ew wisa zimanê kurdî bi nav dike, lê ne bi wateyên neyênî. Ew dibêje ku guneh ne gunehê fêkî bi xwe ye, lê gunehê kesê wî fêkiyê han radike û datîne, diçine û diçîne. Ew zimanê kurdî weke gireka di binê tasê de jî bi nav dike, lê wate wisa ye: zimanekî bêguhndan e, bêxwedî ye, loma jî dibêje ku hema piçek guhdan û piştgirî ji hakimî hebûya, dê wî ala zimên li ezmên bilind bikira:

Ger dê hebuwa me jî xudanek
a`lî keremek, letîfedanek

Γ lm û huner û kemal û iz`an
şî`r û xezel û kitêb û dîwan

Ev cindî biba li ba wî me`mûl
ev new`î biba li nika wî meqbûl

Min dê e`lema kalamê mewzûn
a`lî bikira li banê gerdûn

Bînave ruha (Melê Cizîrî)
pê hey bikira (E`lyê Herîrî)

Keyfek we bida (Feqîhê Teyran)
hetta bi ebed bimaye heyran

Çibkim ku qewî kesade bazar
nînin ji qumaşî ra xerîdar

Gelo ma niha jî ev gazinên Xanî ne di cih de ne? Ma kanî muşteriyê vî qumaşê ciwan û nazik? Qumaşekî ku

bi kêmanî bi kêrî me û cilkirina me tê em lê xwedî dernakevin? Hema li tecrubeya me ya herêma Kurdistanê (Kurdistana başûr) binêrin. Kurmancî bi zanebûn li paş dimîne. Ev mijareke berfirehe lê hema wisa bes e.

50- Xanî dinîvisîne belê ji bo kê ?

Berî em binêrin ka Xanî ji bo kê nivîsandiyê em vegerin sebebên nivîsandina Şerefnameyê. Mîr Şerefxan di destpêka kitêba xwe de dibêje ku min ev berhema anî meydanê da ku nav û dengê malbatên Kurdan yê hukumdarî û fermanrewayî kirine ji windabûnê were parastin. Ango li ser bingeheke Aristokratîk ew berhem hatiye zayîn. Lê Xanî? Ew vekirî dibêje:

Xanî ji kemalê bêkermalî
meydana kemalê dîtî xalî

Yanî ne ji qabilî û xebîrî
belkî bi te`essub û e`şîrî

Hasil ji i`nad eger ji bêdad
ev bid`ete kir xilafê mu`tad

Safî şemirand vexwarî durdî
manendê durrê lisanê Kurdî

Înaye nizam û intizamê
kêşaye cefa ji bo yî a`mê

Da xelqî nebêjtin ku Ekrad
bê me`rifetin bê esl û binyad

Enwa`ê milel xudankitêbin
Kurmancî tenê di bê hesêbin

Ew eşkere dibêje ku wî ji bo a`mê nivîsiye, yanî ji bo reşaya xelkên Kurd, ji bo piraniya civakê, ji bo xizan û rênçber û cotkar û feqî û nezanên Kurdan. Wî ji bo milletê xwe nivîsiye, ne ji bo mîrên milletê xwe, loma jî wî qalib şikand û pesnê tu mîrî derbasî berhema xwe nekir, berovajî wê wî heta jê hat rexne li mîr kirin, çî mîrê dema xwe yê ku navê wî Mirza ye, û çî mîrê Botan mîr Zêndîn yê di çîrokê de ye. Ew li alî perîşanan û bindestan e, li rexê çepê yê belengazan e, loma jî em dikarin wî mîna şoreşgerekî sedsala hivdehan bihejmêrin. Helbet wî ji bo me jî nivîsiye. Ji bo me Kurdên ku em niha serê xwe bi wî bilind dikin û xwe nêzîkî fikrên wî dikin û li ber agirê hestên wî yên netewî ruhên xwe yên sermagirtî germ dikin.

51- Mesaj û teblîxatên di Mem û Zînê de, ne yek û dido ne, çendek in, gelek in. Li gora hin lêkolîneran Ev xebat ansîklopediyeke Kurdan e.

Kitêbeke wek Mem û Zînê ne mumkin e mesajek tenê tê de hebe. Her çendî mesaja wê ya serekî kurdperwerî ye jî, lê bi dehan mesajên din têde hene. Min hin nivîs derbarî mesajên Xanî de nivîsîbûn. Ne xem e ku niha hinekî dubare bikim. Xanî ji bo parastina jinê ji pencereyên civaka nêr tê koşaye. Wî evîn ne wekî sûc lê wekî qederek xwedayî û xweşiyeye rûhanî dîtiye. Têkiliya du evîndaran xweşik dîtiye û li himberê gelekî bi tolerans e. Ji bo mirovayetiye tevî fikiriye û dilê wî bi insanan yên ku girêdayî qedera Xwedê ne şewitiye û ji Xwedê xwestiye ku tu kesî neşîne agirê dojhê!! Gelek fikrên felsefîk anîne ziman ku ev der têra me û

fererawestina li ser nake.

Xanî her cûre zanîn derbasî berhema xwe kiriye. Wek me got stêrnasî, dermandarî, heta xuliqandina mirovan di malzarokê de û mûzîknasî û sazkirina bilûran û civaknasî û gelek aliyên din ku lêkolîner dikarin wan bikin mijar ji bo lêkolînên pir ciddî. Naxwazim mînakan bêtir bidim. Hêviya min ew e ku xwendevan bi xwe derbasî berhemê bibin û li piralîbûna wî binêrin.

52- Stîl û uslûbê nivîsandina Xanî ?

Xanî ji ekola Farisî ya klasîk, ya ku nûnerên wê Nizamî, Mewlana Celaleddînê Rûmî, Firdewsî û xeyrî wan, derketiye. Ew şagirtekî zîrek e di wê ekolê de û xwe gihandiye payeya mamostetiyê. Bêguman sûd ji pêşengên wêjeya kurdî Cizîrî, Feqiyê Teyran jî wergirtiye. Li ser şopa wan meşîya ye û bi teşîya wan ristiye.

53- Hinek peyvan gelekî bi kar tîne û mirov bi dirêjaya berhem û beytên wî li wan rast tê hene. Wek "deshelatdarî", "gelên din", "meqam û navdarî", Behsa dewletê û nobedaran, wezîran, patîşahan, fermandar û eskeran, text û tacan dike.

Xanî, li gora belge û dokumentên hêja yên Ebdullah Varlî, ji kitêbên osmanî yên kevin bi dest xistine bi xwe ne dûrî desthilatdariyê bû. Ew katibê mîr Mihemmed bû (Xanî şîna wî bi helbest nivîsiye). Ji ber vê jî çavên Xanî baş li şeweyên hukumdariyê vebûne. Ew dizane dewlet çawa û li ser kîjan bingehan ava

dibin. Di dewleteke kurdî de jî difikirî. Dewleteke serbixwe û ji Osmaniyan û Eceman qetiyayî. Dewleteke ne di bin siya tu sultan û şahan de. Dewleteke xwerû kurdî. Yanî bi eskerên xwe, bi wezîrên xwe, bi ziman û kitabên xwe. Xanî behsa text û tacê û padişahê dîke. Yanî bi zelalbûneke diyar doza dewletekê dîke.

54- Xanî nîşan û sembolên xwe yên mêrxasiyê ji nav mêrxasên Kurdan neqandine.

Di Mem û Zînê de, gelek îşaret, destnîşan hene ku hêjayî lêkolînên berfireh in. Wî bi hesteke netewî û di bin giraniya hizrên xwe yên milletperweriyê de Mem û Zîna xwe xêz kiriye. Ew di wêjeyê de behsa pêşiyên xwe û pêşengê wêjeya kurmancî dîke, mîna Cizîrî, Feqiyê Teyran û Eliyê Herîrî. Di mêjûya de behsa şerên kurd û qizilbaşan li cizîra Botan dîke, di adet û tradisyonan de behsa civaka kurdî dîke, xwarinên kurdî, şêweyên şeran û adetên şingirêdanê û her wisa şahîbestinê jî. Behsa mêrxasan dîke di kirasekî kurdî de. Pesnê wan dide mêranîyê dîke para gelê Kurd lê ji bîr nake ku Kurd milletekî bêfersend in û mecal bi dest wan neketiye civaka xwe ava bikin. Wî ji bo hevdîtina Mem û Zînê jî cejneke netewî hilbijartîye. Min berê jî di nivîseke xwe de nivîsî bû ku Xanî eger hizrên xwe li ser bingeheke dînî ava kiribana dê cejna qurbanê yan jî cejna rojiyê weke fersenda hevdîtina herdu evîndaran bibijarta. Lê wisa nekir û heta li gor teksta Memê Alan jî neçû. Di teksta Memê Alan de evîndar bi şêweyekî efsanewî hevdu dibînin. Bi rêya periyên cinnan ku mirov vedigerîne çîrokên Hezarûyekşevê. Xanî

xwestiyê destan wî bi goşt û hestiyê xwe destaneke kurdî be. Helbet wî ev yek bi zanebûn kiriye.

55- Xanî Qala cejna Newrozê wek “cejna Kurd û Kurdistanîyan” dike.

Berî her tiştî Xanî Newroz mîna cejneke xwezayê dibîne. Gelekî pesnê guhertina xwezayê di vê rojê de dike. Bi dehan malik dinivîsîne ku atmosfera wê roja pîroz tûne berçavên xwendevanê xwe. Adetên Kurdan di wê rojê de bi çarçov dike. Bi me dide nasîn ku ew rojeke mezin ji rojên Kurdan e û heta ku di wê rojê de kesek di mal de namîne. Hemû derdikevin xwezayê û hev pîroz dikin. Tiştê balkêş ku em di folklorê kurdî de rastî vê roja pîroz nabin. Yanî di tekstên gelêrî yên li ser Mem û Zînê behsa Newrozê nabe.

56- Gelo çima?

Ez bi xwe bersiveke tekûz nikarim bidim lê dikarim texmîn bikim ku Xanî dixwest vê rojê vejîne û bala Kurdan bixşîne ser. Wek ku ew bibêje: ji bîr nekin cejneke we heye, lê vegehin û hev tê de pîroz bikin. Li gor zanîna min li herêmên başûr yên Kurdistanê mîna Sine, Mehabad û heta sînorên Hewraman û Loristanê Newroz bi germî dihate pîrozkirin. Lê li herêmên bakur! Tu belgeyên pêbawer di destê min de nînin.

57- Ji giş berhem û xebatên Xanî xwiya û diyar dibe ku ew kesayetiyê çendalî, kapasîteyê kûr û fireh e. Herwuha ew xwediyê Zanebûneke xweser, dewlemend û ansîklopedîk e. Destana seyda, şiklek kateloga neteweyî ye, zanava Kurdan û xwenaskirinê ye. Heta tu bêjî

bes handar û navtêder e, şêwexerceke fikrî û manewî ye, di nav sînorên serdema xwe de hilnayê, mîna ku wîzeyaya xwe ji bo her dem û qonaxê girtibe....

Erê. Mem û Zîn ansîklopediyayêke biçûk e. Xanî bi zanebûn teksta xwe wisa nivîsiye. Wî ne tenê behsa du evîndaran kiriye. Wî xwestiyê hemû zanînen dema xwe, hemû ilmê xwe di vê destanê de kom bike. Xwestiyê kitêbekê ji Kurdan re binivîse ku wan bigihîne hev. Xwestiyê zanîne bi kurdî bavêje ser rûpelan, ew zanîna ku ji hêla dînê û felsefî û mêjûyî ve para zimanê Erebi bû, ji hêla wêjeyê ve jî para Farisî bû. Lê xwestiyê zanînen berê têxe kirasekî kurdî û qalibekî kurmancî ji heriya ilim re deyne. Loma bi firehî agahiyên li ser stêrnasîyê anîne ziman. Bi firehî behsa tesewwufê kiriye, bi firehî mijarên felsefîk mîna Qederê, iradeya insanan, armanca Xwedê ji afirandina gerdûnê û Adem û pîrsa Îblîs û dojah û buhuşt û bi sedan mijarên din. Di baweriya min de heta ji Xanî hatiye wî hemû nîfş û beşên zanîne derbasî vê destana xwe kirine. Wê hema bêje tiştêk bernedaye, heta ilmên hedîs û quranê. Mêjû ji bîr nekiriye, mêjûya islamê, ya Kurdan û mêjûya Farisan jî .

58- Qedrê destana Xanî çendî hatiye zanîn, nîrxandinên hatine kirin û têne kirin çendî bersivdar û têr û tesel in?

Mixabin civaka kurdî ne ew civak bû ku qedrê vê destanê zanibin. Ez nabêjim ku bêxwedîtî li Mem û Zînê bûye. Na, ew hatiye parastin heta niha û sax selîm gihaye destê me ev jî bi saya wan feqe û mele yên

Kurd di medresyan de lê bêxwedîtiya ku ez qala wê dikim, Mem û Zîn wek kitêbeke anseklopedîk baş nehatiye vekolan, şirove nebûye. Mesela di wêjeyên cîranan de (Ereb, Faris û Xwedê) bi dehan şerh û şirove li ser tekstên hêja û nehêja hatine kirin. Mesnewiya Mawlana gelek carî şirove bûye, Dîwanên helbestan yên Erebî wisa. Gulistana Seedî û dîwanên helbestvanên Farisan. Hîn jî ew lêkolîn heta roja me ya îro berdewam in û bi wî awayî milletên cîran quncikekî nenaskirî di wêjeya xwe de nahêlin. Mem û Zîn heta demeke ne dût (teksteke qîz û erdekî şûv û neajotî bû). Diva bû ji kevin de tefsîrên Mem û Zînê hebûna. Ji alî ziman de ez bi xwe rastî gelek astengiyan hatime di tefsîra xwe de, ji ber ku tekst kevn e û gelek peyv hene ku di ferhengên de nînin diva bû kesekî li pê Xanî destana wî ji hev bixista û kîte bi kîte, malik bi malik û peyv bi peyv şirove bikira. Wê niha barê me gelekî sivik bûya. Wek te bi nav kir Mem û Zîn şiklek kateloga netewiye û em divê vê katelogê wisa hişk û req nehêlin wê hêsan bikin xwendina wê bi her kurdekî xwe bikin.

59- Aliyê sosyolojîk xwurt e di berhema Xanî de. Behsa cîl û nîşan zehf e, belê tim fera giran ciwan in, berê wî tim li cîlê sibehê ye, mirov dibê qey yên tim raserî çavên wî ne, di bal û hişê wî de ne kesên siberoj û wêbêyê ne.

Karakterên bingehîn yên destanê ciwan in. Mem, Zîn, Tajdîn, Sitî çar ciwanên ku texmîn dikim temenê wan bîst salan derbas nakin. Erê ew nikare evîndariyê di nav kesên saldar de bicirîne, lê mebesteke wî ya din jî

ji vê heye. Hêviya wî di vî nifşê ciwan de bû. Ji xwe projeya wî ya mezin(Kurdîkirina islamê) xitabî nifşê ciwan dikir. Ji bo wan kitêb çêkirin yanî derdê wî belavkirina zanînê di nav cîlê ciwan de bû. Weke ku wî hêviyên xwe ji mîr û paşan û begler û şêxan birîbin û êdî berê xwe dabe aliyê ciwanan. Ji bo wan medrese avakirin û bi xwe jî ders dane wan. Ji pereyên xwe mesrefa xwendekaran û mamosteyan dida. Guhertinên mezin di her civakê de bi destê ciwanan e. Xanî jî ev qaide zanîbû.

60- Têkiliya di nav ruh û bedenê de?

Di vê mijarê de Xanî bi dewla fîlosofên beriya xwe diçe avê! Ew ruh mîna unsurekî pîroz û pak û xwedayî dibîne. Bedenê mîna unsurekî nizm û kêmnirx dibîne. Her weha mîna Ibnî Sîna jî dibêje ku têkiliya Ruh û bedenê bi vîna Xwedê û bi zorê çêbûye. Ango Xwedê ruh bi darê zorê bi bedenê re kiriye yek. Lewra ruh nedixwest bedenê bo xwe bike warek. Ew dibêje:

Ev rûh û cesed bi cebr û Ikrah
Tezwîc biwîn bi emrê Ellah

Bi kurdiya îro:

(Bi zor û bêvîn ev laş û giyan
Ew bûne yek bi fermana Yezdan)

Lê dîsa li gora fîlosofên berê, vê têkiliya ruh û bedenê insan afirand. Insan ne tenê ruh e ku mînavmelayiketan pak û bêguneh be, ne jî tenê beden e ku cihê şehwet û her kiryarên nepak be. Lê insan herdû ne, him ronahiye him jî taritî ye. Xanî dibêje:

Insan bi xwe hem zelum e hem nûr
Adem ji te hem qerîb e hem dût!

Bi kurdiya îro:

Mirov hem ronahiye hem tarîk
Ji Xwedê dût e, hem ji wî nêzîk

Xanî dibêje ku rûmeta mirovan ji giyan tê, loma jî çawa ku Xwedê giyan berdaye laşê Adem doza secdeyê ji firişteyên xwe kiriye û gotiye: ji Adem re serî deynin erdê! Ev ferman ji bo ruhê Adem bû ne ji bo cesedê wî. Ji ber ku Xwedê dibêje: çawa ku min ruh berdaye cesedê Adem min gote melaiketan: secde bibin!

Pişt re Xanî dibêje ku rast e, mirov neqşekî biçûk e di deftera hebûnê de, lê mebest ji afirandina wî mebesteke mezin e.

Zahir te eger numaye suxra
batin ew e neqşê xame kubra

bi kurdiya îro:

Eger ku ew wa biçûk xuya ye
Lê ew nivîsa destê xweda ye

61- Mekan, cih û warê destanê? Cih û şûna bajarê Cizîrê, agêhdariyên li ser topografya bajêr?

Mekan, cih û warê destanê Cizîr e. Her li wê ye û jê dernakev e. Di vê destanê de jî şensekî Xanî yê baş hebû ku wî bi xwe Cizîr dîtibû û feqetî lê kiribû (hemû lêkolîner wisa dibêjin. Berhema wî bi xwe belgeyeke). Wî bi kameraya xwe ya helbestî Cizîr xweşik kêşaye.

Der û dorên wê, çem û bajarokên wê. Xwarbûna Dicle ku mîna zendekî xwe li Cizîrê pêçaye hemû bi hunerek ciwan li qelem daye.

Behsa seyrangehê Cizîrê dike: Omerî, Seqlan, Derwaze, Meydan, Westanî, Nêrgizî ku hemû jî bi gotina Xanî li ser kenarên Dicle ne.

Dîmenên çûna nêçîrê, Newroza Cizîrê û derketina xwezayê. Heta mêjûya Cizîrê jî bala Xanî neçûye qala wê kiriye, ew di beşekî de dibêje:

Roja we ku bûye ceng û perxaş
Tacdîn û Memê du sed Qizilbaş

Bilcumle bi zirh û zend û binber
Înan ji me ra bi şîr û şeşper

Bi kurdiya îro:

Di roja şer de van herdu bira
Du sed Qizilbaş anîn ji mi ra

Hemî dîl bi zirx, zend û binber bûn
Tevde bi şûr û gurz û xencer bûn

62- Di hin beytên Xanî, wek vê beyta derbas bû de navê qizilbaşan derbas dibe, hinek pesnên têkildarê xwegirêdan, xwerapêçan û amadeyîya wan ya ji bo şer hene.

Li vir mebest ji qizilbaşan leşkerên sefewiyan e ku dihatin şerê mîrnuşîniya Cizîrê dikirin. Di Şerfnameyê de hatiye ku şah Ismayîlê Sefewî leşkerekî giran ji qizilbaşan çend caran hinartibû Cizîrê di dema Mîr Şeref de û her carê ew leşker têk diçû, heta carekê mîrmîranê Diyarbekirê Mihemed Estaclû û birayê wî

Qerexan di gel komeke mezin ji Qizilbaşan êrîşî Cizîrê dikan, lê ew jî têk diçin. Cara dawiyê dîsa şah Ismaîl leşkerekî Qizilbaşan yê giran dişîne Cizîrê bi serokatiya Yekan begê Teklû, lê li paş şerekî giran Qizilbaş têk diçin û êdî nema careke din êrîşî mîrnuşîniya Cizîrê dikan.

Erê Xanî îşareteke brûskî da, lê li me em di binê destanê de kûr bikolin û zanibin ku Xanî gotinên xwe wisa beredayî nayine. Ew ne tenê li helbestê û qafiyê difikire. Rastiyê dîrokî her di bîra wî de ne.

63- Xanî ji serî heta bi dawî hişmendane hereket kiriye û bi fikir Mem û Zîn dariştiye. Berî hertiştî temayek gelekî popûler û hevbeş neqandiye, gaveke pir bi îsabet e ev.

Ev tiştêkî pir balkêş e. Xanî li vir li ser şopa Firdewsî meşiyaye, çawa Firdewsî gotibû:

Besî renc burdem der în salî sî
Ecem zinde kerdem bedîn Parisî

Yanî min gelek zehmetî di van sî salan de dît

Heta ku min Ecem bi vê berhema Farişî(Ango: Şahname) vejandin!

Firdewsî tenê dîroka Farisan heta dema islamê nivîsiye wek destan. Û li wir sekiniye. Wî her destanên Farişî dariştine Şahnameya xwe. Ku digihê serdema Islamê, Firdewsî wisa dibêje:

Zi şîrê şuter xurden û sosimar
Ereb ra bi cayî resîde est kar

Ki ûreng şahî kuned arizû
Tifû bad ber çerxê gerdan tifû

Yanî:

Ji vexwarina şîrê deveyan û xwarina goştê gumgumokan, Ereb gihiştin desthiladariyê.

Madem ki wisa bila tif li rûyê Felekê be!!

Xanî şopa feqiyê Teyran neajot, ji ber ku Feqî destanên mîna Bersîsê Abid, û Şêxê Senanî nivîsî bûn ku tu təkiliya wan bi gelê Kurd re nîn e, yek Ereb bû, yek jî Cihû. Her wisa destanên Mecnûn û Leyla, Yûsif û Zuleyxa, Wamiq û Ezra û Weys û Ramîn. Xanî destaneke gelêrî hibijart û ew kire hilgira hemû hizr û bîr û baweriyên xwe. Wî ji Mem û Zînê qenctir nedît ku karibe baweriyên wî yên derbarî avakirina dewleteke kurdî de hilgire. Ji xwe jî nedibû ku ew Leyla û Mecnûnê bike mijara xwe. Divê kitêba wî, ya Kurdan be û heta karekterên wî jî kurd bin. Meziniya Xanî û naskirina sînoren wê meziniyê bi rastî lêkolînên mezin jê re divên. Ew hêja ye ku bibe kitêbeke dersdayînê di zanîngehên dunyayê de. Lê berî wê ka bila em xwedî lê derkevin û li ba xwe wî nas bikin.

Celadet dipirse “ tovê Xanî, ev sêsed sal in li bin erdê ye, ma hêj dema şînbûna wî nehatiye? Xanî berî wextê xwe hatibû”. 15 Tebaxê giş erd av da û tov şîn hat. Îro ne bi tenê şîn hatiye, belê êdî em berê vî tov û bizrî jî hiltînin.

Xanî ne ji bo çend salên dawiya sedsala hivdehan de nivîsîbû. Wî ji bo pêşerojê dîr û geş nivîsî bû. Rast e mîna cotkarekî wî tov reşandin. Dizanî bû eger ku

baran îsal neyê dê saleke din bibare û tov şîn bê. Te got tov şîn tê. Rast e, şîn tê û eger ne wisa bûya me niha ev niqaşên mezin li ser fikrên Xanî û destana wî nedikirin.

Xanî yekemîn kes e di tarîxa Kurdan de ku eşkere û vekirî dibêje: werin em ji bin siya Osmaniyan û Eceman derkevin û bi xwe welatê xwe û dewleta xwe ava bikin.

Wî dengê berî sêsed salî li çiyayên Gabarê, li Qendîlê û li herdu rexên Zabê û Dicle û Firat û çimên Tendurekê û Agirî veda. Dengê wisa bi hêz bû ku girê dilê Xanî û hêviyên wî mîna volkanekê teqandin û deng bi Kurdan xist.

64- Di Mem û Zînê de gelek şîretên exlaqî, pend û pêşniyaz jî hene.

Rast e. Ev ji bingegehên Xanî yên tesewwufî tîn. Bêguman ji perwerdeya wî ya malbatî(ku bavê wî şêx bû) û ji civaka kurdî ku nîrx berî her tiştî dide sinç û exlaqan tê. Wî malhebînî şermezar kiriye û gotiye:

Malî mehebîn tu ey nikonam
Hubba wî dikit mirovî bednam

Bi kurdiya îro:

Ey mirovê qenc mehebîn pera
Mal dilewitîne navê mera

Wî xwestiye mirov dûrî hakimîyan biçe. Xwe biparêze. Xwestiye heta di evîndariyê de herdu teref xwe ji têkiliyên nerewa biparêzin. Xwestiye mirov bide pê zanayan û pirsan ji wan bike. Her wisa bi dehan pend û şîret derbas dibin.

65-Li ser siyasetê û siyaseta dewletê nemaze pelên nav 53-66 an....Sosyolojiya dewletê, dewlet çawa digere, dewlet çiya, cîh û rola wê?

Wek ku min fêhm kiriye, Ehmedê Xanî dizane çî dewleta heye zulm tê de heye. Dizane ku hakim nikare bi yek carî baş be. Lê dewleteke kurdî mîna mecbûriyyetekê dibîne, ew hewl dide ku dewleteke kurdî bi qencî ava bibe. Baş zane ku ne bi zorê be dewlet ava nabe, lê di eynî demê de jî dizane ku qencî û zanebûn dikare dewletê biparêze:

Lewra ku dinê bi şîr û ihsan
Tesxîr dibitin ji bo yî insan

Ew dizane ku dewleteke kurdî hebe dê bi kêmanî barê zulma Rom û Eceman ji ser milê Kurdan were avêtin. Ew vî jî tîne ziman: rewşenbîr tenê dikare ji alîyê teorî beşdarî amadebûna ji bo avakirina dewletê bibe. Rola mezin ya hakimên Kurdan e, ango ya siyasetmedar û serokan e ku dikarin gel bi rê ve bibin û serekiya têkoşîneke mezin bikin:

Namûs e li hakim û emîran
Tawan çiya şair û feqîran?

66- Rewşenbîr xwe diparêzin ji desthelatdaran, xwe pir nêzîkî wan nakin û bi temamî nabin dost û aşînayê bêsinor û bêmesafe.

Fikra Xanî wisa ye: gava ku rewşenbîrek nêzîkî desthilatdar bibe, divê tenê ji bo alîkariyê be û nesîhet û penddayînê be. Ne ji bo berjewendiyên şexsî be. Ew desthilatdaran mîna maran dibîne. Dibêje ew marên bi jehr in, divê yek xwe ji wan biparêze. Lewra der û dora

wan hemû kesên nepak û derewker û keysebaz in:

Hukkami ji cinsê şahemarin
eşabê simûm û mihredarin

Mihran ku didin bizan ku zehr e
mihre ku dikin bizan ku qehr e

A'qil hezerê dikin ji maran
xafil dibine muhibb û yaran

Herçendi li nik bi i'zz û nazî
herçendi di gel bi le'-b û bazî

Cuz-î bibitin ji te texeyyur
kullî dikitin li te tedebbur

Xasma ku hebin xebîs û xennas
bedxwah û bexîli bin (minennas)

yanî: hakim weke maran in, xwedan jeh rin. Kesên aqilmend xwe jê diparêzin lê yên sivik û xam dibin dost û yarên wan. Çiqasî tu li ba hakim bi qedr û qîmet bî, heta ku tu di gel wî bilîzî jî. Dê bi yekcarî berê xwe ji te biguhere gava piçekî guhertinê di te de bibîne. Bi taybetî gava ku ev hakim xelkên pîs û niyetxirab nêzîkî wan bin û li dora wan bin.

Di deverekê de jî dibêje ku hakim mîna agir e, çiqasî bi ronî be jî lê agirekî ku dikare bişewitîne jî û zirarê bigihîne te.

Hukkami bi batin û bi zahir
bê şubhe muşabihin bi agir

Zahir di sipahî û bi nûrin
batin ji mudareê di dûrin

Rehmê ku dikin ji rengê rojin
qehrê ku dikin cîhan disojin

Zinhar bi wan nekî tu bawer
ger bab û pisî û ger birader

Xasma ku muqerrebê di bedxwah
nêzîki bibin ne'ûzûbillah

yanî: hakim bi derve û hundurê xwe mîna agiran in. Wisa ronî û geş xuya dikin, lê di eslê xwe de ne yê dan û standinê ne. Gava dilovan bin mîna rojê ne, lê ku xişmê dikin, dibin agir û cîhanê disojin. Hay jê bike, baweriyê bi wan neke, eger bav û birayê te bin jî (yan eger tu bav û birayê wan bî jî). Bi taybetî gava ku kesên pîs û niyetxirab herin derdorê û nêzîkî wan bibin.

Di herdu mînakan de jî Xanî bêtir balê dikişîne ser kesên ku li dora hakim in. Dibêje ku ew kes xirab bin. Çare nîne dê hakim jî bikeve bin tesîra wan û ew jî bibe yekî xirab. Loma jî çiqasî yek dût be, xêtir e.

67- Ji berhemên Xanî xwiya dibe ku bi her aliyê xwe hayê wî ji prensîp û qeydeyên desthelatdariyê heye. Ev prensîp çine û ne çine, serwext e. Fikreke wuha li ba mirov çêdibe ku gelek ji wan tesbûtên di zemanê xwe de Makyavelî kirine û wek kaşifê wan tê pesinandin, nas dike.

Rast e. Di serî de qaideya herî naskirî li ba Makyavellî (armanc, rêya gihandina wê rewa dike), ango armanceke te ya baş hebe, tu xwe bi kîjan şêwe û uslûbî digihînî bigihîne, rewa û durust e. Mîr jî vê yekê

dibêje:

Hukumdariya me pirrengiye
Geh dad û geh jî sitemkariye

Herçendî Bekir pîç û bêbav e
Aşê me ji wî bi ba û av e

Ev cûre kes ger pîs û zordar in
Hemî dergevan û dest bi dar in

Ew tên aşê me xweş digerînin
Ew dexlê me hakimane diçînin

Ger çî aşê me yekî giştiye
Lê ji garisê heram tijî ye

Divê yek wî garisî biçîne
Ev Bekir jî dê bo me hilîne

Ne tenê dikin vê yekê em mîr
Bala xwe nadî wan kesên feqîr!

Feqîr jî seg dergevanê wî ye
Her demê ew seg li ber derî ye

Xwedayê mezin şahê gerdûnê
Wî ji bo karsaziya hebûnê

Bi qasî ku wî danîne sultan
Dehqatî ewî çêkirin şeytan

Yanî destê mîr nebû ji Beko
Pêwistiya wî her û her digo

Hinek mîr hene wan tajî tolan
Nadin bi hespên resen û falan

(ev beş bi kurdiya îro ye) em bala xwe didinê ku mîr

hema dixwaze hebûna Beko bi behane bike, yanî dibêje ew pêwiste hebe ,ev bi xwe makyaveliyyet e.

68- Mîr û Beko. Hin kes helwestê Mîr bi xapandina Beko û bi saftiya Mîr ve girêdidin. Ne wuha ye. Mîr giş gavên xwe bişuûr davêje û kengî davêje zane. Mîr naxwaze kesekî din popûler bibe, xwedî însiyatîv û xwedî alternatîv çêbibe.

Li gor lêkolîna ku min li ser karakterên Mem û Zînê çêkiriye ez gihome van encaman:

Navê mîr Zêndîn(Zeyneddîn) di çîroka Mem û Zînê de du caran hatiye. Carekê di malika 359 an de û carekê di malika 1365an de. Lê dengbêjan yên ku Memê Alan strandine ev nav bi hin şêweyên cuda anîne ziman. Ew li ser yek navî li hev nakin. Mesela em li ba Mişoyê Bekebûrê dibînin ku navê mîr EZîn e. Dr. Nûreddîna Zaza dibêje ku ev nav ji her navên din bêtir nêzîktirî rastiyên dîrokî ye. Lê li ba Hisênê Banesorî û Selman Reşo navê mîr Sêfdîn e û li ba Ismaîl Banî jî nav wekî navê di Mem û Zîna Ehmedê Xanî de ye(Zêndîn).

Di serî de dixwazim bibêjim ku Xanî iddiaya mîrekên cizîra Botan dupat dike. Ew jî dibêje ku ew ji nijadeke Erebî ne û bapîrê wan yê mezin sehabiyê pêxember Xalid kurê Welîd e(Li şiroveyan binêre). Xanî wêneyê vî mîrî xweşik dikêşe û dibêje ku ew mîrekî serbilind, azad, comerd, mêr, maldar û hukumdariya wî li Ereb û Ecem û Xwedêan jî heye!! Di pêvajoya çîrokê de hin bi hin karakterê mîr zelaltir dibe. Di roja Newrozê de ew e yê ku fermana derketina cejnê dide. Dema ku Tacdîn Sitiyê dixwaze şandiyekî mezin wekî xwazgînî

ku hemî alim û mîr û mela ne diçine dîwana mîr. Ew jî xitaba wî mîna ku xitaba sultanekî bikin, dikin. Heta vê radeyê em dibînin ku mîr yekî diltenik, nerm, cirxweş û bê erê û na zewaca Tacdîn û Sityê dipejirîne. Ew bi xwe dibêje ku bila daweteke xweşik li dar bikeve û bi xwe jî dadikeve xizmeta mêvanên xwe û nefsbîçûkiyeke ecêb dide xuyakirin. Lê hin caran jî mîna diktatoran bi xelkê re dide û distîne. Di dema nêçîrê de dibêje yê ku neyê nêçîrê cezayê wî kuştin e!

Em bala xwe didinê ku Xanî li fersendan digere, da ku di rêya mîr Zêndîn re rexneyan li şêweyê mîrîtiya Kurdan bike. Mesela dema ku mîr dergevanê xwe Beko ji bo dîwana xwe wek mirovekî pêwîst dibîne, Xanî dibêje: hin mîr hene nezan û cahil in. Tajîtolan bi hespên esîl nadin!

Mîr Zêndîn di destpêkê de xurt xuya dike. Zû bi zû guh li fesadiya Beko nake. Lê dawî dikeve tora ewaniya Beko û her tiştê tê gotin bawer dike.

Xanî her wisa dide xuyakirin ku ta kîjan astê mîr bi textê desthilatdariya xwe ve girêdayî ye. Diyalokekê di navbera mîr û Beko de datîne ku di despêkê de xuya dike, mîr guh li Beko nake. Lê Beko êdî derewan dike û dibêje ku Tacdîn dê Zînê bide Memê! Li vir mîr hinekî dixeyide û hêrs dibe lê bêyî ku fermaneke nebaş derîne. Tenê dipirse: gelo çima Tacdîn bi min neşêwriye? Ku Beko dibîne mîr sist bûye û amade ye ku çengel bikeve ber devê wî, dibêje: mîrê min tirsana min ew e, mesele ne tenê zewicandina Mem û Zîn be. Ez ditirsim ku Tacdîn bibêje ez jî ji binemala Xalid kurê Welîd im!

Êdî Xanî girêdana bi mîrîtiyê û textê hukumdariyê xweşik teswîr dike. Dide xuyakirin ku mîr dikare her tiştî qebûl bike, tenê ku mesele were ser textê mîrîtiyê ew hîç ne mumkin e! mîr bi bav û bapîran sond dixwe ku êdî dê Zînê nebe jina tu mêrî li rûyê erdê!

Em bala xwe didinê ku reaksoynên mîr li himber fitne û fesadiya Beko di sê astan de ne; ya yekem mîr li himber Beko radibe û pê re dixeyide û wî di heddê wî de disekinîne. Ya duyem mîr êdî sist dibe û pirsan ji Beko dike. Di reaksiyona sêyem de mîr dibe mîrekî din û bi yekcarî dikeve bin tesîra ewanî û derew û bêbextiyên Beko. Îcar Xanî fersendê dibîne ku rexneyan dîsa li mîran bike:

Hukkam-i bi batin û bi zahir
bê şubhe muşabih in bi agir

Zahir di sipahî û bi nûr in
batin ji mudareê di dûr in

Rehmê ku dikin ji rengê roj in
qehrê ku dikin cîhan disojin

Zinhar-i bi wan nekî tu bawer
ger bab û pis î û ger birader

Xasma ku muqerrebê di bedxwah
nêzîkê bibin *ne`ûzûbillah*

Piştî wê Xanî derbasî kûraniya hundir ê mîr dibe û êş û janên wî yên derûnî tîne ziman. Mîrê ku êdî pistepistan li ser evîna Memo û Zînê dibihîze, nema xew tê çavên wî:

Mîrê ku ji xîretê dilefgar
şêrê ji hemiyetê birîndar

Hetta sibe xew nehate çavan
sakin nedibû ji rengê avan

Êdî mîr bi yekcarî xwe teslîmî Beko dike. Di her rabûn û rûniştina xwe de pê dişêwire û lê guhdarî dike. Bi xap û rîpên wî Memo dihavêje binê zindanekê û herdu evîndaran ji hev cuda dike. Lê dawî û piştî ku mîr xurtiya evînê bi çavê xwe dibîne û li ber çavên wî Zînê ji hişê xwe diçe û xwîn di dev û pozê wê re dihavêje, hişên wî têne serê wî. Biryarê dide ku wan herduyan bizewicîne lê biryareke pir dereng. Mem dimire û Zîn jî li pê wî. Mîr bi destê xwe Zînê li rex Memo binax dike û dibêjê: ha vaye dilbera te!

69- Hin kes hene dibêjin ku Mem û Zîn neynika civaka feodal e û nakokiyên wê civakê û rêçûnên wê bêtir dide nasîn! Her weha dibêjin ku evîna Mem û Zînê û şikestina wê encamek e trajedîk ji encamên têkiliyên wê civakê ye. Dibêjin jî ku mîr xwişka xwe Zînê neda Memo ji ber ku Memo xortekê ne di asta mîran de bû! Dîtina te?

Bi dîtina min ev xwendineke şaş e ji Mem û Zînê re. Ya rast ew e ku mîr bêtir girêdayî textê desthilatdariyê bû û wî ji tirsê ku Tacdîn doza hukumdariya mîrnuşîniya Botan bike, li himber vê evînê rawestiya û Memo kire qurbana wê tirsê xwe. Hîç wî eslê Memo jê re nekiribû kêmanî. Berovajî wê, wî dixwest ku Mem û Zîn bizewicin û her pesnê Memo kiriye, lê ji ber fesadiya Bekir û sistiya mîr li ber wê fesadiyê ew evîna

xurt û mezin têk çû.

70- Tajdîn wîjdanê aliyê nêzîkî xelkê ye, di nav desthelatdariyê de. Li aliyê xêr û çareseriyê ye, ji bo dilên hez ji hev dikin bigihin hev dixebite, herçendî beşdarî deshelatdariyê ye û eleman û elementeke di hiyerarşiyê de jî. Di helwestê Tajdîn de rola Sîfî jî divê ji bîra nebe, li aliyê xwuşka xwe ye....

Tajdîn û Beko du kesayetiyên bingehînî di Mem û Zînê de û ku mirov rola van herdu karakteran dipê. Dibîne ku yek nûnerê xêrê ye, yê din jî nûnerê şer e. Bûyer û nakotiyên ku di navbera herduyan de diqewimin, kurtasiya wê nakotiya ezêlî ya di navbera xêr û şer, ronahî û tarîtiyê de ye.

Herçî Tacdîn e ku nûnerê xêrê ye, kurê wezîrê dîwanê ye. Navê bavê wî jî Sikender e! Hevalekî Memo yê jî dil e û hevparê wî yê derdê evînê ye jî. Ew serwerekî leşkerî ye ku sed siwar di bin fermana wî de ne û hemî di xizmeta mîr de ne.

Herçî Beko ye(ku di destana Ehmedê Xanî de her tenê bi navê Bekir tê) şewirmendê mîr e, dergevanê wî ye. Qaweçî ye. Ê berî her tiştî biyanî ye û eslê wî jî Mergewerê ye! Ez nizanim çima Xanî kiriye ku Beko ji Mergewerê be lê biyanîbûna Beko hinekî xirabiyên wî tefsîr dike. Çiku yekî ne ji Cizîrê dê ne xema wî be ku mîr û kesên ji mîr nêzîk bi hev bikevin û di navbera wan de sarî çê bibe. Li ser eslê wî, Cemal Nebez di kitêba xwe ya bi Almanî li ser Xanî û Mem û Zînê de(Mam und Zin- Kurdisches Epos) dibêje ku wateya Mergewer ew e, yê ku mirinê tîne!! Lê ez vê ihtimalê

ne di cih de dibînim ji ber ku Xanî dibêje: eslê Bekir ji Mergever bû, nabêje ku Bekir bi xwe mergewer bû!!

Çawa Mem, wisa jî Tacdîn dikeve ber pêlên evîneke hêzdar. Lê ji ber ku ew nimûneya kesên bi ciwaniyê tenê ve girêdayî ye, Xanî evîna wî li ber sînoren zewacê radiwestîne û êdî deriyên xweşî û janên evînê lê têne girtin. Ji destpêkê de Xanî beyan dike ku evîn negihaye kûraniya giyanê Tacdîn û wî û Memo dide ber hev û dibêje:

Tacdîn-i li nik hebû şu`ûrek
`Işqê di wî hiştibû qusûrek

Mem puxteê `işqê bû tamamî
Gotê ku bira meger tu xam î

Wisa jî dema pîrê tê ba herduyan ku gustîlên Sitî û Zînê ji wan bistîne, Tacdîn bi lez gustîlê dertîne û dide pîrê. Lê Memo zû bi zû nade:

Tacdîn-i nugîn ji dest deranî
Da destê `ecûzeyaya zemanî

Mem tê fikirî ku bê nugînê
Kengî dikitin medar û jînê!

Lê rola Tacdîn ya rastîn xuya nake illa piştî zewaca wî. Ev rol jî li kêleka rola Beko dimeşe, lê bi aliyekî din û berovajî de. Nakokiya di navbera xêr û şer de êdî dest pê dike. Tacdîn ji mîr dixwaze ku Beko dûrî dîwana xwe bibe, dibêje ku ew kînewer e û seg e! Li aliyê din Beko jî dixwaze mîr li dijî Tacdîn bihêvoje.

71- Ev nakokiya di nav Tajdîn û Beko de ji ku tê gelo, çi ne sebebên wê, ji ku av vedixwe. Di

vê derbarê de Xanî tiştêkî diyar dibêje, yan jî îmkanê mirov ji nav rêzên Mem û Zînê wek pêjnekê be jî hinek diyardeyan tap bike heye gelo? Ev dijminayeti û neyartiya bênavcî, bêeman û germ û gur gerek ne bê sebeb be? Çima Beko ewçendî li himberê Tacdîn bêperwa ye?

Kîneke wî ya veşartî li himber Tacdîn heye em nizanin çima û Xanî jî beyan nake! Di despêkê de Beko ji mîr re dibêje ku te Sityê ji dest xwe derdaye! Û bi vî awayî cenga di navbera şer û xêr de dest pê dike. Lê qurbana vî şerî her Memo ye, ji ber ku Tacdîn him zavayê mîr e him jî serokekî leşkerî ye ku destê mîr jê nabe û Beko pê nikare. Xanî gelek xirabî bi Beko ve girê dide, ew li ba wî kurê segan e, hîlekar e, minafiq e, xapînok e, derewker e, pîs e, kurê zina ye, kînewer e, xebîs e, û heta dawiya van akarên nebaş. Di gel van akar û sifetên nebaş jî Beko jîr e, dizan e çawa derba wî cihê xwe digire.

72- Lê tablo û dîmenê fînalê di nav van herdû dijberên sondxwarî û bêkompromîs de, van herdû betlên bi exlaq, sinç û fonksiyonên xwe cihê de, dema Mîr ji nêçîrê vedigere û li deriyê seraya xwe nêzîk dibe rû dide ne wuha?

Belê, di vî dîmenê de Xanî, bi zanebûn herdu aliyên şer dide rex mîr. Ew jî dema ku mîr ji nêçîrê vedigere û dibîne deriyên seraya wî vekirî ne. Dikeve gumanna û herdu teref (Tacdîn û Beko) xwe didin bin çengên mîr. Heta ji Tacdînd tê piştgiriya Mem dike. Mala xwe ji bo wî dişewitîne da ku nehetike û Zînê ji bin ebaya Memo

derdikeve. Beko dizane ku ew hîç bi Tacdîn nikare lê xweş dizane ku evîndariya Mem û Zînê ya ku li cizîrê belav bûye tenê dikare armancên wî pêk bîne. Xwe digihîne mîr û her tiştî jê re dibêje. Mem dikeve zindanê û Beko li ser xwe ditirse. Êdî şîreta jehrkirina Tacdîn li mîr dike. Li dawiyê şer bi ser dikeve.

73-Belê lehengê şer û xêrnexwaziyê Beko bi xwe jî dibe qurban û goriya dek û dolabên xwe, ev çawa serketin e?

Lê ew ne serketineke rastîn e. Ji ber ku Beko bi destê nûnerê Xêrê Tacdîn tê kuştin. Di dawiyê de Xanî nêrîna xwe derbarî nakokiya şer û xêrê de zelal dike û dibêje ku mumkin e tiştek wek rindiyê xuya bike, lê di eslê xwe de xirabî ye. Yan jî mîna xirabiyê xuya bike, lê bi xwe rindî ye. Li gor vê dîtina felsefî Beko rindî dikir û ku ne ew bûya (wek ku Zînê dibêje) dê evîna Mem û Zîn ne ewçende ciwan û pak û bi hêz bûya. Ji bo wisa jî balkêş e ku Xanî Beko dibe bihiştê û wî dike hevparê Mem û Zînê di her xweşiyên wê bihiştê de.

74-Mîr serdest e, li ser cîhê Mîr nîqaş tune, mesele burokrasî ye, rastkirin û edilandina burokrsiyê ye ku niwênerê wê jî Beko ye.

Rast e. Di Mem û Zînê de Beko weke ne tenê dergevan xuya dike, lê şêwirmend û xwedan biryar e. Tesîreke wî ya mezin li mîr heye. Mîr bi xwe jî xirabiyên wî dizane, lê destê wî jê nabe û her û her behaneyan ji bo pêdivî û pêwistiya mîrîtiyê bi kesên mîna wî dibîne. Ew dibêje ku mîrîtî zadeke, kesên mîna Beko ji bo mîr wî zadî diçinin. Serayeke segên mîna beko wê diparêzin. Burokrasiyeke diyar di têkiliya Mîr bi Beko

re xuya dike. Li aliyê din Xanî xwestiye ku Beko bike nûnerê şer û xêrnexwaziyê û li himber nûnerê xêrê û qencyê Tajdîn bi kar bîne. Şerekî ezêlî heye ku xêr û şer di nav de ne, Beko û tajdîn nûnerên vî şerê ezêlî ne. Li ba Xanî di dawiyê de lazim e ku xêr bi ser bikeve, loma jî beko tê tesfîyekirin û ji bon (nizama alemê) divabû were kuştin, her wekî Xanî li ser zimanê Beko dibêje:

Kuştim wî ji bo nizamê a'lem
bo rahetiya e'wamê a'lem

75- Têkiliya vî şêweyê biencambûnê, angokerketiniya baş û rind, bi ramanên berêtir re, em bêjin Zerdeştîyê re tunebe gelo?

Di fikra zerdeştîyê de dualî heye, aliyê şer û yê xêrê, ji bo ku sîstema cîhanê dawî bi rêk û pêk bimeşe, divê dawî li şer were.

Lê di vir de bingehên Ehmedê Xanî yê tesewwufî serencameke qenc ji Beko re datînin. Ango di dawiya çîrokê de em dibînin ku Bekoyê xirab bi xwe jî di buhuştê de ye û dergevanê qesra herdu evîndaran e.

76- Bi van gotinên xitmê û mirov ne li bende, ne mimkun e, kes bikaribe pêşbînî bike û bi ihtîmaleke mezin xwendevan hêrs dike, gelo Xanî dixwaze çi bêje, bala xwendevanên xwe bikêşîne ku, fikar û ramanên çawa li ba wan bi kar bixe, dixwaze çi han bide?

Mimkun e, ev jî yek ji mesajên Xanî be ku xwestiye bibêje: rexneyan li serokan bikin, xêrê ji wan re bixwazin û şaşiyên wan bibêjin, lê serî li dijî wan

nekişînin, ji bo aramiya civaka kurdî û ji bo yekîtî ji dest neçe!

77- Helwestê Tajdîn û birayê xwe Arif jî ne mîna hev e. Arif radîkaltir e, belê dawî ew jî tê ser gotina birayê xwe û mîna wî dike. Arif wek birayê biçûk hinekî ji Şoreşgerên Şoreşa mezin ya Firensa Beubef tîne bîra mirov. Helbet bêtecrûbe û naşî ye, Tajdîn avê li agirê birayê xwe dike.

Ev temsîla civaka kurdî ya feodal di sedsalên navîn de dike. Di wê civakê de liberalbûna mîr ne durust e, mîr bi çi awayî be divê bi emrê wî bê kirin û her kes di fermana wî de be. Xanî ev zagon neşikandin. Di islamê de jî tişteki wisa heye gava dibêje taet û guhlêkirina weliyyulemrî (Mîr, Paşa, Xelîfe, sultan) ferz û wacib e. Me di hin deveran de bala xwe dayê ku mîrîtiya mîr dihêle Tajdîn çavên xwe ji kiryarên wî yên xirab bigre. Mesela ew dibêje:

Herçî kirî hakimê me ferman
em nabine mani'ê çu hukman

Destê di me bestine li ber mîr
ha gerden û dest û pê û zencîr

Mîr rabû û dest û pê Memê best
Tacdîn mirin axwe wê demê xwest

Emma çi bikit ji bo ne a' r e
celladi emîr û xundikar e

78- Yanî, bi kurdiya îro?

Li vir em dibînin ku tajdîn dibêje: destên me li ber

biryar û kiryarên mîr girêdayî ne, ew çî bike bo wî rewa ye, dikare me jî girê bide!!

Xanî ne xwestiye li vir dijberiya hukumdariya kurdî rewa bike. Mîr mîr e, loma jî ne heqê kesîye li ber rabe, lê balkêş e ku wî cih daye rexneyan û deriyê gazinên ji mîr û şîretan û heta hin rexneyên tûj jî vekiriye. Di dirêjiya Mem û Zînê de gelek rexne hatine kirin lê tucarî qebûl nekiriye ku kesek şûr di rûyê mîr de bilind bike.

Dibe ku Arif temsîla ciwanên sergerm dike, loma jî şer dixwaze û tenê rêya zorê weke çare dibîne.

***79- Xaleke din ku zelalî û teqeziyê dixwaze,
mesela zewaca Xanî û hejmara berhemên wî
ne.***

Heta demeke ne dûr jiyana seydayê Xanî bi mij û moranê pêçayî bû! Mîna jiyana bi dehan mîr û zana û nivîskarên kurd yên berê. Tenê dihate nasîn ku ew li gundê Xanê ji dayik bûye, yan jî ji êla xaniyan e! Dihate gotin ku wî xwendina xwe li Cizîra Botan, Bedlîs, Bayezîd kiriye. Dihate gotin jî ku wî berê xwe daye Quds û Şam û Misr û Stenbolê jî. Lê tu belgeyên zanistî li ser van iddiayan nebûn. Wisa jî tê zanîn ku ew heta dawîya umrê xwe nezewiciye û li Bayezîdê di sala 1707 an de çûye rehmêtê.

Xanî bi xwe tarîxa ji dayikbûna xwe di dawîya Mem û Zînê de dibêje:

Lewra ku dema ji xeybê fek bû

Tarîx hezar û şêst û yek bû

Yanî ew sala 1061 koçî(1650/51) zayînî, ji bendên

xejb û windabûnê rizgar bûye, ango ji dayik bûye.

80- Xebatên li ser Xanî, jiyana û berhemên wî ber bi roja em tê de, zêde dibin. Yek ji van xebat, lêger û lêkolînan jî ya birêz Ebdullah Varli ye, tiştêkî nû ku di berhemên berêtir de tunebe û di ya Varli de hebe çiyê?

Vê dawiyê birêz Ebdullah Varlî di kitêba xwe ya li ser jiyana Xanî de mijareke gelekî balkêş teqand. Ew dibêje ku wî di tomar û dokumentên osmanî yên kevin de jiyaneke bi detay û teferûat ya Xanî nas kiriye, li gor wî: Xanî kurê Ilyas kurê Rustem e. Malbata wan ji Hekariyê koçberî Dizesorê li nêzîka Bayezîdê bûne. Ji roja roj de têkiliyên wan bi mîrên Bayezîdê re hebûye. Malbata Xanî malbateke dîndar, zana û katibên mîran bûn. Xanî bi xwe jî katibiya mîr Mihemedê pîrbela kiriye. Heta birêz Varlî navê diya Xanî dibêje (Gulnigar) û navên xwehên wî (Ketan. Perî) û birayê wî Qasim jî tîne ziman!! Yê ku bixwaze berfireh van agahiyan nas bike bila vegere kitêba birêz Varlî.

81- Tu çendî bi van dîtinan re yî?

Lê li vir dixwazim bibêjim ku ez bi xwe ji van agahiyan bi şek û guman im. Heta dawiyê nikarim bawer bikim ji ber ku ji jêderêkî tenê hatine. Ew jî Varlî ye, bi kêmanî divê birêz Varlî Kopiyên wan tomar û dokumentan biweşîne. Hemû agahiyên li ser wan ku wî bidest xistine bide. Eger rast be, ji xwe keşfeke gelekî mezine û şoreşeke di wêjeya kurdî de. Yan na qet nabe cihê baweriyê û dê em li hêviy arojêkê bin ku jiyana Xanî zelaltir bibe.

82- Ji bo agahiyên Eladîn Seccadî mirov kare çî bêje, dema Xanî dide nasandin tu dibê qey temenê xwe bi Xanî re buhurandiye û mîna ku biracêwiyê wî be ji serî heta bi pehniyê, ta bi derziyê ve dike....

Her weha dixwazim bibêjim ku Eladîn Seccadî jî gelek agahî di kitêba xwe *Mêjûyî edebiyatî kurdî* de li ser Xanî anîne. Li wir ji xwe heta rengê sola wî jî tê gotin, bejna wî, dirêjiya wî, û giroveriya riya wî!!! Ev hemû ne rast in û tenê ji xeyalê Seccadî hatine. Dema ku ew dibêje riya Xanî gurover bû nabêje kê gotiye û min ji kê bihîstiye. Ev yek jî di lêkolînên li ser jînenigariyan de qet nayên pejirandin û tenê nêzîkî gotinên odeyan in.

83- Gotina xitmê û ji bo vê hevpeyvînê dawî?

Ji roja roj de Ehmedê Xanî bal kişande ser xwe. Li ser wî hate nivîsandin û berhema wî ya navdar Mem û Zîn qenc hate nirxandin. Mela Mehmûdê Bayezîdî di berhevokeke xwe de behsa wî kiribû. Ji bo Aleksandr Jaba hin agahî li ser wî civandibûn. Di rojnameya Kurdistan de hijmarên yek û du hin beş ji Mem û Zîn hatin çapkirin û her weha di Kovara Hawarê de jî. Hacî Qadirê Koyî kete bin tesîra Xanî û dest bi kurdperweriyê kir. Mem û Zîn bi rûsî, erebî, almanî, firensî û xwedêî û hin zimanên din hate wergerandin. Di nav Kurdan de gelek caran Mem û Zîna wî hate şirovekirin. Perwîz Cîhanî ji Urmiye, Emînê Osman ji Badînan, Hejarê Mukriyanî ji Mehabad û Jan Dost ji başûrê rojava teksta Mem û Zîn şirovekirin. Gelek nivîsar kitêb li ser fikr û bîr û baweriyên wî çêbûn. Tê

bîra min dema min çapa duyem amade dikir ku li Beyrûtê çap bikim, nivîskar û fîlosofê Ereb yê navdar rehmetyê Hadî Al Elewî gote min: Ehmedê Xanî stûnek e, divê Kurd hemî xwe pê xurt bikin û li dorê bizîvirin. Ew bavê kurdayetiyê û şoreşgeriya kurdî ye. Tu nivîskarê Kurd nikaribûn û nikarin mîna Xanî rola xwe ya mezin di çelqandina gola wêje û hizran de bilîzin. Gotina min a dawî: Xanî xwe baş nas kiribû, maye ku em jî wî baş nas bikin û bidin naskirin.

Xebatên li ser Ahmedê Xanî û berhemên wî - ji destpêkê heta dawiya 1995-ê –

Mûrad Ciwan

Ev lêkolîn li ser wan xebatan e ku derheqê jiyan, berhem û bîrûbaweriyên Ahmedê Xanî de hatine kirin. Lêkolîn xebatên ji destpêkê heta sala 1995-ê (pîrozbayî û bibîrqaînên bi minasebeta 300 saliya ronahîdîtina Mem û Zînê) digre nav xwe. Ev nivîsar cara yekê di kitêba min de ya bi nave **Ahmedê Xanî, jîyan, berhem û bîr û baweriyên wî**, Mûrad Ciwan, Doz, 1997, Istanbul de hat weşandin.

Heke meriv li gor milletên cîhanê û xebatên wan ên li ser nivîskar û navdarên wan bifikire, xebatên li ser Ahmedê Xanî gellek hindik in. Lê heke em li gor xebatên xwe yê li ser nivîskarên xwe bifikirin, Ahmedê Xanî cardin ew kes e ku li ser wî, bîr û baweriyên wî û berhemên wî ji herkesî pirtir hatiye rawestandin.

Lê her çendî kitêb û meqaleyên ku behsa wî û eserên wî kiribin ne hindik bin jî, lêkolînên ciddî yê ku li serê hatibin kirin ji hejmarên pêçîkên du destan nabihurun.

Cara pêşîn sala 1730-ê Ahmet Faik Mem û Zîna Ahmedê Xanî wergerand ser zimanê tirkî û ev werger di 1969-ê de li Tirkîyê hat çapkirin¹.

Di sala 1858 -ê de Aleksandre Jaba hin beşên Mem û Zînê kirin fransî û ev, di cildê 3-yê ê kovara **Mèlanges Asiatiques** de(r. 242-255) li St. Petersbourgê hatin weşandin². Di 1859-ê de Peter Lerch di kovarekê de behsa vê wergera A. Jabayî kir, agahdarî di heqê xebatên wî yê wî warî de da xwendevanên xwe³. Li ser Ahmedê Xanî cara pêşîn em di kitêba Alexandre Jaba(1801-1894) de rastî hin agahiyan tên ku navê wê kitêbê **Recueil de notices et récits kourdes, servant à la connaissance de la langue, de la littérature et des tribus du Kurdistan** (1860, St. Petersburg) e. Ev agahdarî ji nav wan notan hatine girtin ku Alexandre Jabayî di wextê xwe de li Erzurumê ji Mela Mehmûdê Bayezîdî û hin kesên din stendibûn⁴ û şandibûn ji bo Akademiya Zanistan a çariyê a li St. Petersbourgê Piştî ku Alexandre Jaba vegeriya Rûsyayê hin ji wan tekstên li Kurdistanê berhevkirî di kitêba li jorê binavkirî de berhev kirin û kitêb sala 1860-ê ji alî Akademiya Zanistan a Çariyê ve hat çapkirin.

¹ *Beysanoglu, Şevket; Diyarbakırlı Fikir ve Sanat Adamları, cilt; 2, İstanbul 1959 r. 326. Neqil ji Malmisanl ı[MALMÎSANÎJ], Mehmet "Osmanlı Döneminde Yazılan Kürtçe Eserler" Tarih ve Toplum Aylık Ansiklopedik Dergi, sayı 54, Haziran 1988, İstanbul, r. 59-63. Mehmet Malmisanlı di jêrenoteke wê maqala xwe de dinivîse ku wî di katalogên kutubxanên İstanbûlê de navê vê kitêbê dîtiye ku wiha ye: Ahmet*

Faik (yayınlayan: Sırrı Dadaş Bilge), Mem û Zîn Istanbul, 1969, Matbaa Teknisyenleri Basımevi XVI+224 rûpel.

Albayê Jenderman ê teqaubûyî Nazmi Sevgen jî di nivîsara xwe de ya bi navê Doğu'da Kürt Meselesi (Li Rojhilatê Pirsî Kurdî) wiha dinivîse: Dostê min Sırrı Dadaş Bilge jî di 1969-ê de Mem û Zîneka bi tirkî neşir kiriye. Tê rîwayetkirin ku nivîskarê wê tirkekî bi navê Ahmed Faîk e. Ev eser, bi awayê destnivîskî ji bavê Sırrı Beg întîqalî wî bûye." (Sevgen, Nazmi; Doğu'da Kürt Meselesi, Harb Akademisi Basımevi, 1970, neqil ji Bulut, Faik; Devletin Gözüyle Türkiye'de Kürt Isyanları, Y-n r.306)

Qapax û pêşgotina vê eserê min ji ba Mahmûd Lewendî peyda kir ku wî jî ji Kutubxana Diyarbekirê dabû anîn. Pêşgotin ji bal Sırrı Dadaş Bilge ve hatiye nivîsîn. Di vir de hin agahdarî jî li ser Ahmed Faîk hene. Sırrı Dadaş Bilge dinivîse ku ew ne di kutubxanên Îstanbûlê de ne jî di tezkeryên nas û ferhengên navên şairan de rastî navê Ahmed Faik hatiye. Ahmed Faik bi xwe îlhamkar û rêberê xwe Şemsê Bedlîsî dibîne:

Söyler benim dilimce güftar Şems-i Bitlis
Ey Fayika bugün ben hemen varı gördüm

(Dibêje bi zarê min guftar Şemsê Bedlîs
Ey Fayika evroke min heman dî û nedî)

Di beyteka xwe ya din de jî wiha dibêje:

Rehberdir önümce Şems-i Bitlis
Geldim ki kılam bu halı telhis

(Rehber e li pêş min Şemsê Bedlîs
Hatim ku bikim vî halî telhîs)

Lê Sırrı Dadaş Bilge, dinivîse ku ev Şemsê Bedlîs kî ye, nayê zanîn. Bilge dinivîse ku Ahmed Faik di du cihên Mem û Zîna wergera xwe de behsa xwe dike û dibêje ku Ey Faîk tu her çendî ne şairekî naskirî yî jî tu bi wan şîretên xwe durran li dunyayê direşînî. Lê kê guh li van şîretên te ye, tu bi xwe bibêje û bi xwe guh lê be. Ji vê jî fêhm dibe ku ew şairekî jêhatî lê nenas e. Di dawiya eserê de di her şeş beytên dawî de ji herfên serê beytan

fêhm dibe ku esera wî di sala 1143-yê hîcrî-1730-yê mîladî de xelas bûye.

Bilge wiha didomîne:

"Suphi Menteş Beg, dibêje ku Ahmed Faik ji xanedana Şeref Xanan e û çavkanî jî silsîlenameya Şeref Xanan a di nava kitêba Halil Ethem Beg ya bi navê Duvel-i Islamiye nîşan dide. Li gora silsîlename Şemseddînê çaran di 1005-ê hîcrî de bûye xan. Du kurên vî yên bi navê Abdal Xan û Ahmed Mîrza Beg hebûne. Tercumeyeka Şerefnamê ya Mehemed Begê kurê Ahmed Mîrza Beg jî heye. Lê çi qas rast e ku meriv bibêje ev Ahmed Mîrza Beg Ahmed Faik e? Di vê xusûsê de ne mumkun e ku meriv genaetekê diyar bike." Bilge vê nota han jî dide: "Di madda A-yê ya notên Suphi Menteş Begê de tê nivîsîn ku (Ahmed Faik li Bedlîsê li Mehella Hersan; di camiya taxa Kurubulakê de medfûn e. Şiûrên wî yên tesewwufî, xazelên wî û çarînên wî hene. Dîwana wî heye, hatiye çapkirin lê ez nizanim li ku derê ye. Gava Bedlîs ji bal Rûsan ve hate dagîrkin kitêb hatin tarûmarkirin yên ku mihacir bûn jî ew xelas nekirin. Min bihîstîye ku di hin kutubxanên Sofyayê û yên Rûsyayê de kitêbên bi sernivîsên Bedlîsê hene.) dibêje û du qitayan ji Ahmed Faik pêşkêş dike.

Cardin di madda B-yê ya vê notê de jî tê gotin ku (Şemsê Bedlîs jî zatekî gîhaştî ye. Bedlîsî ye, li Bedlîsê medfûn e. Ji ahfadên wî hê kes hene ku li Bedlîsê dimînin. Murşîdê zemanê xwe ye. Loma jî nasnavê Şems wergirtiye. Muştqaqê Bedlîsî jî ji vî îrşad wergirtiye. Navê rastîn ê Şemsê Bedlîsî "Hacî Mahmûd Xoca" ye. Ji bo ku bûye murşîd mexlasa Şemsê Bedlîsî wergirtiye. Şemsê Bedlîsî xwedanê kitêbeka çapkirî ye ku beşekî bi navê Îlmê Sîmya di vê kitêbê de heye).

2 Alakom, Rohat; "Kürt Ulusal Manifestosu 300 Yaşında", Özgür Politika, rojnameya rojane ku li Almanyayê derdikeve, hejmarên navbera 11-17-ê Îlona 1995-ê

3 Alakom, Rohat; "Kürt Ulusal Manifestosu 300 Yaşında", Özgür Politika, rojnameya rojane ku li Almanyayê derdikeve,

hejmarên navbera 11-17-ê Îlona 1995-ê

4 Jaba, M. Alexandre; *Recueil de notices et récits kourdes, servant à la connaissance de la langue, de la littérature et des tribus du Kurdistan*, 1860, St. Petersbourg, neqil ji Pakdemir, Mahmûd; "Di kitêba A. Jaba de Ehmedê Xanî", *Armanç, hejmar no:4(162) çiriya pêşîn 1995, Stockholm, r 2. Her wiha binêre; Blau, Prof. Joyce; "Jiyan û berhemên Ehmedê Xanî (1650-1707)" Çira kovara kulturî -kovara komeleya nivîskarên kurd li Swêdê, sal 1 hejmar 3, îlon 1995, Stockholm û Armanç, hejmar 4(162), çiriya Pêşîn, 1995, Stockholm.*

Prof. Joyce Blau, di vê gotara xwe de (ev gotar bi esasî roja 27'ê gulana 1995-ê di Konferansa Ahmedê Xanî de hat pêşkêşkirin û kurdiya wê pişt re di kovarên binavkirî de hat weşandin) pirtir agahdarî di heqê Alexandre Jabayî de dide ku em qenc dibînin li vê derê cih bidin wan agahiyên:

"Ji bo birêkûpêkkirina lêkolîna edebiyata kurdî ya nivîskî ya Dema Navîn, qedrê herî mezin bi zanayê bi 'eslê xwe Polonî, dîplomatê meqambilind, bisporê ronak, berhevkarê (kolleksiyonerê) bêwestan ê destnivîsên kurdî, Alexandre D. Jaba (1801-1894, li Îzmîrê mir) re careke din bilind bû.

"Rûsya çarî, bo firehkirina desthilatdariya xwe li Qafqasyayê, ji qels-ketin û paşdeçûyina Împeratoriya Osmanî û ya Îranî îstîfade kir. Leş-kerên (orduyên) Rûsya bi 'asiyên kurd re, bi parêzkarên sînorên van Împeratoriyan re ku pîrr bi kêrî Rûsya hatin, têkilî danîn û Akademiya çarî ya Zanistan a St. Petersbourgê, bû yekemîn merkeza kurdnasiyê ya dinyayê.

Dema ku Alexandre Jaba di 1848'an de bû konsulê Rûsya yê Erzeromê, Akademisyen B. Dorn pêşniyar kir da ku ew ji bo hînbûna kurmançî ji konsuliya xwe ya li welatê kurdan îstîfade bike. Ji wê rojê şûnde, A. Jaba hemî wextê xwe yê vala jibo hînbûn û berhevkirina materyalên li ser ziman, edebiyat û tarîxa gelê kurd terxan kir; wî dê ev karê xwe heta dawiya jiyana xwe bidomanda.

"A. Jaba dest pê kir bi zanayên kurd re têkilî danî, ku herî

bijarteyê wan Mehmûd Efendî Bayezîdî gelek alîkariya wî kir. Mehmûd Efendî êdî merivekî pîr, nêzî şêst salî bû. Di 1797'an de li Bayezîdê ji diya xwe bûbû, li vî bajarî dest bi xwendina xwe kiribû, paşê li Tewrêzê(Tebrîzê) dom kiribû. Qur'an, edebiyata 'erebî, farisî û tirkî xwendibû. Piştî ku li seranserê Kurdistanê gerriya, vegeriya Bayezîdê ku li wir medreseyek îdare kir. Dema ku mîrîtiya kurdî ya Bayezîdê têk çû, Mela Mehmûd li Erzeromê bicî bû, ku li wir karê "xoca"tî dikir. Wê demê di nav 'alimên welêt de gelek qedrê wî hebû. Mela Mehmûd, ji bo Alexandre Jaba mamostayekî bêhempa, ji bo berhevkirina destnivîsan hevkarê jêhatî bû. Ew her wiha nivîskarê lêkolînên girîng jî bû: Adet û Rusûmatnameyê Ekradiyye û wergera kurmançî ya Şerefnameya Mîr Şeref Xanê Bedlîsî.

"Alexandre Jaba encamên lêgerînên xwe yên li ser ziman û şaristaniyeta kurdan bi awakî rêk û pêk ji Akademiya çarî ya Zanistan a St. Petersbourgê re şandin. Wî bi hevkarîya Mehmûd Efendiyê Bayezîdî kolleksiyoneke yekta ya ji 57 perçeyan pêkhatî berhev kir Ev kolleksiyona ku di 1868'an de gihaye Kutubxaneyê Giştî ya çarî ya St. Petersbourgê, bi pirranî ji berhemên şa'irên kurd ên Dema Navîn, wek yên Feqiyê Teyran, Melayê Batê, Melayê Cizîrî û şahkarê şîra kurdî Mem û Zînê(Ji alî Muhemmed Xerîb Silêman hatiy e kopyakirin. Dibe ku Muhemmed Xerîb Silêman, yek ji nasnavên Mehmûd Efendî Bayezîdî be.) pêk tê."

Prof. Qanatê kurdo, di kitêba xwe de ya bi navê Tarîxa Edebyeta kurdî I(Weşanên Roja Nû, Stockholm 1980) di rûpelê 14'an de diyar dike ku ew kesên ku Alexandre Jaba ji bo berhevkirina tekstên kurmançî têkilî li gel wan danîbûn ev bûn: Taha Hecî Ebdal Ezîz (Abdulezîz), Mehemed Xerîb Sulêman(Muhemmed Xerîb Silêman), Şah Neze, Mela Mehemed, Hesên Hekîm Başî(Hekîmbaşî), Mele Mehmûd Beyazêdî(Bayezîdî), Mehemed Koksî û yên din.

Ew kurte agahiya Mela Mehmûdê Bayezîdî wiha ye: “Şairê pêncê jî Ehmedê Xanî ye, eslê wî jî ji taîfeya Hekariyan ji `eşîreta Xaniyan e, bi xwe hatiye Bazîdê. Di tarîxa hezarî da tewetun kiriye. Di zimanê kurmancî de Mem û Zîn nav kitêbek aşiq û maşûqan gotiye û kitêbek luxatê jî bi kurmancî û erebî gotiye, navê [kitêbê] Nûbihar e û zarokê di Kurdistanê hemû piştî Qur’anê dixûnin û zehf jî xezaliyat û eş’aran û beyt bi zimanê kurmancî gotiye û di zimanê erebî û farisî û tirkî jî disan xezaliyat û eş’aran û ebyat zehf gotiye û di ulûmê funûnan jî qewî mahir û sahib îrfan e û ji şuerayêd Kurdistanê hemuyan jî meşhûr û faîq e, belkî ji hemû şueran meqbûl û memduh e û di hezar û şest û sê jî merhûm bûye û di nêv Bazîdê da mizgevtêk jî bi navê xwe bînakiriye û bi xwe jî li kenarê mixgevtê medfûn e. We Ellahu’l alem.”

Aleksandre Jaba⁵ bi xwe jî û piştre, Peter Lerch⁶

5 *Auguste Jaba & Ferdinand Justi, Dictionnaire kurde-Français (St. -Petersbourg; Eggers et Cie, 1879) xviii,463 p. Neqil ji Chyet, Michael L., -And a thornbush sprang up between them": Studies on "Mem û Zîn", a kurdish romance. UMI Dissertation Service, 1991 cild 1, r. 33.*

6 *P. Lerch; "Bericht über: "Resumé de l'ouvrage kourde d-Ahmed Effendi Khani, fait et traduit par A. Jaba," Bulletin de l-Académie Impériale des Sciences de St. Pétersbourg. Classe Historico Philologique Registre 1-15. No 547, Tome 15: No. 11 (1858), cols. [161]-171. Neqil ji Chyet, Michael L., "And a thornbush sprang up between them": Studies on "Mem û Zîn", a kurdish romance. UMI Dissertation Service, 1991 cild 1, r. 33.*

û Martin Hartmann⁷ gellek bi kurtî be jî cih daye jiyana Ahmedê Xanî û Mem û Zîna wî. Lê ew agadariyên ku wan li ser jiyana wî dane, yên A. Jabayî ne û ji alî tarîxê ve şaşîtiyên wan hene.

Di sala 1894-ê de Yûsuf Zîyaeddîn Paşa el-Xalidî, di dawiya ferhenga xwe de, ya ku navê wê **El Hedîye'l Hemîdîyye fî el-luxe'l kurdîyye** ye, cih daye hin tekstên piçûk ên kurdî û şîrên hin şairên kurd, pişt re maneyên wan bi erebî diyar kirine.

Di nav van helbestan de **Nûbara Biçûkan** û **Eqîda Îmanê** ya Ahmedê Xanî jî hatine çapkirin. Piştî Nûbara Ahmedê Xanî Yûsuf Zîyaeddîn Paşa di beşa Xanî de cih dane sê şîrên din jî ku yek jê navê wê “Fî Beyanî Erkan-l Îslam” e, ya duduyan navê wê “**Fî Beyanî-l Îman**” e. Ya sisiyan nav lê nehatiye danîn nîvê wê kurmancî û nîvê wê erebî ye⁸. Şîra sisiyan a erebî û kurmancî ne ya Xanî, lê ya Melayê Cizîrî ye. Di şîra duduyan de jî şika min heye. Îhtîmal e ku ji du şîran jî pêk hatibe. Nîvî ya Ahmedê Xanî, nîvî ya Melayê Cizîrî be. Me ev herdu şîr heta niha ji bilî vê kitêbê, di tu cihên dî de nedîtine û kesê jî behsa wan nekiriye. Bes nîvê pêşîn ê şîra duduyan; beşa ku ez dibêjim ya

⁷ Wiener Zeitschrift f, r die Kunde des Morgenlandes 12 (1898), 106 ff. Neqil ji Chyet, Michael L., "And a thornbush sprang up between them": Studies on "Mem û Zîn", a kurdish romance. UMI Dissertation Service, 1991 cild 1, r. 33.

⁸ El Xalidî, Yûsuf Zîyaeddîn Paşa; *El Hedîyye-l-Hemîdîyye Fî el Lûxe-l-kurdîyye*, *Derseadet*, 1310[1894] r.279-293.

Ahmedê Xanî ye, di berhevoka A. von Le Coq a bi navê **Kudische Texte** de jî heye, nîvê dawiyê û heta beytek ji dawiya nîvê pêşîn jî di vir de cîh negirtiye. Di (kitêba **Ahmedê Xanî, jîyan, berhem û bîr û baweriyên wî**, Mûrad Ciwan, Doz, 1997, Istanbul de) di beşa şîrên Ahmedê Xanî de me cîh daye van her du şîran û em berfirehtir li ser wan rawestiyane. Piştî wê, Mîqdad Mîthet Bedirxanî di hejmara 2-yê (14 Zulhîcce 1315 - 6-ê gulana 1898-ê) a rojnama **Kurdistan** de ku li Qahîrê derdixist, dest bi weşana **Mem û Zîna** Ahmedê Xanî kir.

Di pêşiya **Mem û Zînê** de Mîqdet Mîthet Bedirxanî pêşgotinek kurt nivîsîbû ku bi vî awayî ye:

"Rehma Xwedê lê be, Xwedê gunehê wî bixefîrîne, sala hezar û sed û pêncê de, Cizîrê Ehmedê Xanî kitêbek menzûm nivîsîye; navê wê kitêbê kiriye -Mem û Zîn-. Ev kitêb hemî beyt û şê'r in; eşkare hîkata eşqa du ciwana ye, batin gelek meqsed û hîsse û hîkmet jê tîn fehmkirin. Loma divê mirov bi dîqet bixwînin. Her cerîdekê de ez ê ji wê kitêbê hinê binivîsim, heta xilas bibe.

Ew kitêb berî du sed û deh sala hatiye nivîsandin, hin derê wê heşifîne, nayên xwendin, îşellah ez ê bikarim bi xwe temam bikim. Hekî ji vê kitêbê destê yekî de hebitin, ez hêvî dikim ji min ra rêket, da ez ya li destê xwe de rast bikim; paşê ez ê dîsa kitêba wî jê re rêkim. Niyeta min, ez ê wê kitêbê tebi' jî bikim. Heçiyê vê, bila niho ve ji min re binivîse.

Ehmedê Xanî, rehmetullahî eleyhî, li wê kitêbê de ewil dest şikir û munacat û ne'ta kiriye, paşê dest eslê hîkatê

dike. Min ev kitêb carna hin ulemayên tirk û ereba re xwendiyê û tercume kiriye, hemîya jî gotiyê ku "vê rê de ji vê kitêbê çêtir me nedîtiye." ⁹

Di 1903-ê de A. von Le Coq bi navê **Kurdische Texte** kitêbek daye çapkirin ku ji çîrok û metelokên bi kurmançî û zazakî (dimilî, kirdkî, kirmanckî) û şîrên hin şairên kurd pêk tên. Di nava van tekstan de **Nûbara Biçûkan, Eqîda Îmanê** ya menzûm û **Eqîdeya Îslamê** ya menzûm û ya nesir a Ahmedê Xanî jî cih digrin. Ev her çend berhem ji ber destnivîsarên Mela Muhemmedê kurê Mela Ahmedê Wanî hatine wergirtin ku wî bi xwe ev di meha Zîlqa'deya 1305-ê(1887) de nivîsîne¹⁰.

Mem û Zîn cara duduyan di sala 1906-ê de ji bal Abdulaziz Halis Çıkıntaş(1867-1937)¹¹ ve hat wergerandin ser zimanê tirkî, lê mixabin ku ev bi tu awayî wekî kitêb nehat çapkirin. Şevket Baysanoğlu di 1960-ê de nivîsiye ku nusxeyeka destnivîsa wê, li nik keça wî Meliha Xanimê ye. Nivîskarî, her wiha

⁹ *Kurdistan -Rojnama kurdî ya pêşîn 1898-1902 berhevoka Mehemed Emîn Bozarşan cild 1, wergêr ji tîpên erebî bo tîpên latînî: M. Emîn Bozarşan, Uppsala, 1991 r. 126-127*

¹⁰ *Le Coq, A. von; kurdische Texte, 1903 r.40-47. Ji bilî Nûbarê ev her çend eser jî di vê xebatê da hatine weşandin.*

¹¹ *Li gora ku Şevket Baysanoğlu dinivîse Abd,laziz Halis çûkûntaş, bi eslê xwe Diyarbekirî ye, sala 1867-ê hatiye dinê li cihên cuda qadît û qaymeqamî kiriye, ji ber bîr û baweriyên xwe yê muxalif car bi car hatiye surgûnkirin yan jî ji bo wan wazîfeyên xwe yê ku heq kirine, nehatiye wazîfedarkirin. Cara dawin li Meletyeyê wazîfe girtiye. Di 1935-ê de miriye.*

pêşgotinek jî ji vê wergerê re nivîsiye ku tê de wiha gotiye: "Mem û Zîn, ku fîdanên nûgîhayî yên gulîstana Kurdistanê, mîsala berbiçav a Mecnûn û Leylaya newala derd û belayan in". Ev wergera Mem û Zînê 131 rûpel e¹².

Wergereka din a **Mem û Zînê** bo ser zimanê tirkî ji alî Sırrı Numan Bilge hatiye kirin.. Ev sala 1957-ê di hejmarên 124 û 125-ê ên kovara **Bilgi** de wekî 57 beyt hat weşandin ku ev kovar organa resmî ya Türkiye Muallimler Birliği (Yekîtiya Mamosteyên Tirkîyê) bû¹³. **Mem û Zîn** ji bal memûrê telgrafa Sîlvanê (Farqînê) Zülfikar Fethi jî bi awayekî menzûm hatiye wergerandin ser zimanê tirkî, lê pişt re, wî gotiye ku ev ji 'ewraqê muzirr' e û ji tirsaxwe ew şewitandiye¹⁴.

Di hejmara 3-yê a **Rojî Kurd** de M. Salih Bedirxanî meqaleyek bi navê "Berî Şîrî Qelem" nivîsiye, li dawiya meqalê jî nivîsiye.

¹² Beysanoğlu, Şevket; *Diyarbakırlı Fikir ve Sanat Adamları*, cilt; 2, İstanbul 1960 r. 332-334

Alakom, Rohat; "Kürt Ulsal Manifestosu 300 Yaşında", Özgür Politika, rojnameya rojane ku li Almanyayê derdikeve, hejmarên navbera 11-17-ê Îlona 1995-ê.

¹³ *Alakom Rohat; "Kürt Ulsal Manifestosu 300 Yaşında", Özgür Politika, rojnameya rojane ku li Almanyayê derdikeve, hejmarên navbera 11-17-ê Îlona 1995-ê.*

¹⁴ *Beysanoğlu, Şevket; Diyarbakırlı Fikir ve Sanat Adamları*, cilt; 2, İstanbul 1959 r. 123. Neqil ji *Malmisanlû [MALMÎSANIJ]*, Mehmet; "Osmanlı Döneminde Yazılan Kürtçe Eserler", *Tarih ve Toplum Aylık Ansiklopedik Dergi*, sayı 54, Haziran 1988, İstanbul, r. 59-63.

"Qesîda Hezretî Şêx Ahmedê Xanî" û perçeyek ji **Mem û Zîna** Ahmedê Xanî di dawîya meqala xwe de daye çapkirin¹⁵. Her di wê jimarê de M[odanî?] X[elîl?] jî bi navê "Bextreşî û Mehrûmiya kurdan" meqaleyek nivîsiye û wî jî parçeyek ji **Mem û Zîna** Ahmedê Xanî di dawîya meqala xwe de daye weşandin.¹⁶ Heta em tên sala 1919-ê kurdiya **Mem û Zîna** Ahmedê Xanî (çend beşên wê yên ku di rojnameya **Kurdistan** de hatine weşandin ne tê de) bi metbeê peyda nebûye, her ji dema Ahmedê Xanî û heta 1919-ê, bi destxetî li nav mela, feqî û xwendayên din ên Kurdistanê belav bûye. Lê cara pêşîn bi tevayî wekî kitêbekê ji alî komeleya kurdan a bi navê "Kürd Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyetî (Komeleya Belavkirina Zanîne û Weşanan ya kurdan) bi tîpên erebî hatiye çapkirin. Hemze Begê Muksî pêşgotinek ji vê çapê re nivîsiye ku tê de behsa wê yekê dike ku ziman û edebiyat ji bo milletan çend girîng in. Ew pişt re di vê çarçewê de rûmeta **Mem û Zînê** û mezinayiya Ahmedê Xanî tîne zimên. Agahiyên ku li ser jiyana Ahmedê Xanî di vê pêşgotinê de tîpên dayin, ew in ku Ahmedê Xanî bi xwe di Mem û Zînê de diyar kirine.¹⁷

¹⁵ Bedirxan, M. Salih; "Berî Şîrî Qelem", *Rojî kurd*, no: 3, 1913, *Istanbul r.* 24-29.

¹⁶ M[odanî?] X[elîl?]; "Bextreşî û Mehrûmiya kurdan", *Rojî kurd*, no: 3, 1913, *Istanbul r.* 29-31

¹⁷ Bozarşlan, M. Emîn; "Roja ku di tarîtiyê de hilat: Ehmedê Xanî", *pêşgotin, Mem û Zîn, Ehmedê Xanî, Wergêrê tîpên Latîni û kurdiya Xwerû: M. Emîn Bozarşlan, 1995 Uppsala r.* 91-96.

Bi minasebeta çapbûna **Mem û Zînê**, Memduh Selîm Beg di hejmara 16-ê a kovara **Jînê** de pîroznameyekê dinivîse û qîmeteke bilind dide **Mem û Zînê**, wê dike îsbata hebûna zimanê kurdî di derceyeka bilind de.¹⁸ Esas Hemze Begê Muksî ji hejmara 1-ê heta ya 20-ê serkarî û berpirsiyariya kovara **Jînê** jî kiriye. Piştî wî, berpirsiyariya kovarê û pişt re ya rojnama **Jînê** ketiye ser milê Memduh Selîm Begî¹⁹.

Eqîda Îmanê ya Ahmedê Xanî, piştî ku di ferhenga Yûsuf Ziyaeddîn Paşa de û di kitêba A. Le Coq a bi navê **Kurdische Texte** (1903) de, bi hin berhemên din re çap bû, vê carê sala 1919-ê li Îstanbûlê bi serê xwe wek broşurekê hat weşandin.²⁰

Sala 1925-ê Pîremerd(Hacî Tewfîqê Silêmaniyeyî) piyeseke **Mem û Zînê** bi soranî ji ber **Mem û Zîna** Ahmedê Xanî hazir kir û ev, bi navê **Serguzuştey Mem û Zîn** li Silêmaniyê di nav weşanên **Jînê** de hat çapkirin.

¹⁸ *Jîn -kovara kurdî 1918-1919 berhevoka hejmarên Jînê ku ji alî M. Emîn Bozarşan ve hatiye amadekirin, cild 4, 1987, Uppsala. Di wir de binêre; hejmara 16-ê û werger û xwerûkirinên M. Emîn Bozarşanî yên wê hejmarê.*

¹⁹ *Ji bo agahiyên zêdetir ên di vî warî de, binêre; Malmîsanij & Mahmûd Lewendî, Li Kurdistanê Bakur û li tirkîyê Rojnamegeriya kurdî (1908-1981) Weşanên Jîna Nû, Uppsala, 1989, beşên kovar û rojnameya Jîn û binêrin li cildê 4-ê ê berhevoka Jînê ku ji alî M. Emîn Bozarşan ve hatiye amadekirin; bi taybetî li nivîs û wergerên nivîsên hejmara 16-ê.*

²⁰ *Malmîsanlû[MALMÎSANIJ], Mehmet; "Osmanlı Döneminde Yazılan Kürtçe Eserler", Tarih ve Toplum Aylık Ansiklopedik Dergi, sayı 54, Haziran 1988, İstanbul, r. 61.*

Eser ji 24 rûpelan pêk tê²¹.

Mamosta Alaeddîn Seccadî dinivîse ku "di El Qediyye'l-kurdiyye de Bileç Şêrko dibêje: 'Şêx Ahmed destana Mem û Zînê di 1591-ê de daniye û di sala 1652-ê de miriye'. Di **Muhît el Mearîfî Îslamiyye** de tê gotin ku [Ahmedê Xanî]di navbera 1000 û 1063-yê hîcrî de jiyaye.

Emîn Zekî Beg jî di **Tarîxî Kurd û Kurdistan û Meşahîr'l Ekrad** de her bi pê van tarîxan dikeve. Her wiha ji rojhilatnasên wekî A. von Le Coq, Oskar Mann, Hugo Makas û Roger Lescot her yekî ji wan tiştêk gotiye, hemûyan jî bi texmîn dane navê. Ne dût e ku di vê babetê de lêkolîneka ilmî ya bi tevayî nehatiye kirin, loma jî hemû jî ji hev dût in, hevdu nagirin."²²

Rohat Alakom di lêkolîneka xwe de dinivîse ku di serê sedsala me de cara pêşîn **Mem û Zîn** ji bal Rojhilatnas Orbelli (1887-1961) ve ji nuh ve hate keşîfkirin. Çimkî vî akademîsyenê bi nav û deng heyraniya xwe ya li hemberê vê destanê misêwa aniye ser zimên û bi vî awayî di nav aliman de meraqek peyda kiriye. Orbellî cara pêşîn gava di sala 1911-ê de li nehiya Muksê a qeza Gevaşa bi ser Wanê ve hin lêgerîn dikirin hay ji destana **Mem û Zînê** bû û hin xebatên berhevkirinê kirin.

²¹ Chyet, Michael L.; "And a thornbush sprang up between them": Studies on "Mem û Zîn", a kurdish romance. UMI Dissertation Service, 1991 cild 1, r. 31.

²² Seccadî, Alaeddîn; *Mêjûyî Edebî kurdî, 1371 hîcrî, 1952 r.190.*

Piştî mirina Orbelli bi gellekî, lêkolîna wî ya bi navê **Li Muksê Jiyana û Folklor** sala 1982-yê hat weşandin ku tê de hin tesbît hene. Bi taybetî mesela tebdîlê qiyafetkirina kur û keçan di şahî û ahengan de gellekî bala wî kişandiye. Ew, di xebatên xwe yên din de jî li ser aliyên cuda yên **Mem û Zînê** rawestiyaye, balê dikşîne ser wekhevîyên navbera destana Mem û Zînê û evîndariya li Ewrûpayê naskirî ya bi navê **Trîstan û Îsolde**. Alakom dinibîse: “Em ji maqala J. Mûsaelyan a bi navê ‘Akademik Yusuf Orbelli û Edebiyata Klasik a kurd’ hîn dibin ku Orbelli dixwest **Mem û Zînê** wekî kitêbeka bêrîkan çap bike û bigihîne hemû kurdan. Rudenko teleba wî bû, wî ew teşwîq kir ku li ser **Mem û Zînê** teza xwe ya doktorayê bide”²³.

Di sala 1942-yê de, Roger Lescot kitêba xwe ya bi navê **Textes Kurdes** weşand. Di cildê duduyan de di beşê **Memê Alan** de pêşnivîsarek ji bal wî ve hatiye nivîsandin ku li gel tiştên din ew li ser ferqa navbera **Memê Alana** folklorî û **Mem û Zîna** edebî ya Ahmedê Xanî jî radiweste²⁴.

²³ Alakom Rohat; "Kürt Ulsal Manifestosu 300 Yaşında", *Özgür Politika, rojnameya rojane ku li Almanyayê derdikeve, hejmarên navbera 11-17-ê Îlona 1995-ê*.

²⁴ Lescot, Roger; "Introduction," *Textes kurdes Vol. 2: Memê Alan (Beyrouth: Institut Français de Damas, 1942)*, neqil ji Chyet, Michael L.; -And a thornbush sprang up between them": *Studies on "Mem û Zîn", a kurdish romance. UMI Dissertation Service, 1991 cild 1, r. 53*

Elaeddîn Seccadî di **Mêjûyî Edebî kurdî** de dinivîse ku çapa duduyan a **Mem û Zînê** di sala 1947-ê de li Helebê li ser hîsabê Beşîr Şêx Hesên Haşîmî li çapxaneyê Aras hatiye çapkirin²⁵. Li ser vê yekê M. Emîn Bozarşan jî dinivîse ku "çapa Stenbolê ya 1919-ê, di sala 1947-ê da li Helebê, di çapxana Aras da jî hatiye ducarkirin; wisa tê zanîn ku klîşa çapa Stenbolê wek ayînek hatiye girtin û li Helebê eynî wek çapa Stenbolê hatîye çapkirin"²⁶.

Celadet Alî Bedirxan di hejmarê 33-ê a **Hawarê** de, bi navê "Klasîkên Me" maqaleyek nivîsîye ku bi piranî agahiyên wê ji kitêba Alexandre Jabayî ne ku li ser hin şairên kurd hatine nivîsîn. Di wir de agahiyên A. Jabayî yê li ser Ahmedê Xanî jî hene ku Celadet Alî Bedirxanî wekî çavkaniya van agahiyan navê "Melayê Jaba" (dibe ku di vir de qesda Celadet Alî Bedirxanî ew mela be ku yê agahdarî dabe Jabayî û ev jî Mela Mehmûd Bayezîdî ye) jî dayê.²⁷ Celadet Alî Bedirxan, di vê maqala xwe de behsa çapa Hemzeyê Muksî jî dike û tarîxa hicrî ya jidayîkbûyina Ahmedê Xanî jî ji beyta wî rast dide, lê bi hesabekî şaş dinivîse ku

²⁵ *Seccadî, Alaeddîn; Mêjûyî Edebî kurdî, 1371 hîcrî, 1952 r.213.*

²⁶ *Bozarşan, M. Emîn; "Roja ku di tarîtiyê de hilat: Ehmedê Xanî" , pêşgotin, Mem û Zîn, Ehmedê Xanî, , Wergêrê tîpên Latînî û kurdiya Xwerû: M.Emîn Bozarşan, 1995 Uppsala r. 92.*

²⁷ *Bedirxan, Celadet Alî; "Klasîkên Me", Hawar, hejmar 33, r. 9-10, 1-ê çiriya Pêşîn a 1941-ê. Şam çapxana Sebatê, neqil ji Hawar Kovara kurdî a ku hejmerên wê yê navbera 24-57-ê bi hev re cara duduyan bi pêşgotina Nûreddîn Zaza li Berlinê di 1976-ê de hatine weşandin.*

Ahmedê Xanî beriya niha bi sêsed û neh salan rabûye.

Yê ku rûmeteka bilind daye Ahmedê Xanî yek jê jî Celadet Alî Bedirxan e ku **Mem û Zîna** wî bi navê "kitêba milletê me" binav kiriye. Celadet Alî Bedirxan, di hejmara 45-ê a Hawarê de ya ku di hezîrana 1942-yê de derketiye, beş bi beş dest bi weşandina **Mem û Zînê** jî kiriye. Di vê jimarê de pêşnivîseka Celadet Alî Bedirxan bi xwe li ser eserê û li ser xwediyê wê Ahmedê Xanî heye. Di nivîsa xwe de, Bedirxanî cîh daye şîra Hacî Qadirê Koyî ya ku Hacî Qadirî bi xwe li ser nusxeyeka destnivîs a **Mem û Zînê** nivîsiye,

paşê ev ji alî Mîqdad Mîthet Bedirxanî ve di hejmara 3-yê a rojnama **Kurdistanê** de hatiye weşandin²⁸. Weşandina **Mem û Zînê** di **Hawarê** de heta hejmara 57-ê (ku ev hejmara dawîn bû) dom kiriye. Bedirxan di vir de li ser varyanta **Memê Alan** jî radiweste.²⁹

Cara pêşîn agahiyên heta dereceyekê fireh, berbiçav, rast û durust, sala 1952-yê di kitêba Alaeddîn Seccadî ya bi navê **Mêjûyî Edebî Kurdî** de hatine weşandin. Alaeddîn Seccadî di vê berhema xwe de beşek veqetandiye ji bo jiyana û berhemên Ahmedî Xanî û bi taybetî li ser bîr û baweriyên wî yên millî rawestiyeye.

Çavkaniyên zanînen Alaeddîn Seccadî, eserên berî ya wî ne. **Mem û Zîna** Ahmedê Xanî ye û bi taybetî kesek e ku navê wî Mela Salih e, ku bi xwe ji xelkên Bedlîsê ye, tevî Şoreşa 1925-ê a Şêx Seîd bûye, piştî şikestina şoreşê, çûye li Iraqê li gundekî Amediyê bi cîh bûye³⁰.

²⁸ Ew şîra Hacî Qadirê Koyî ya ku di hejmara 3-yê a

Kurdistanê de çap bûye ev e:

Zemane resmî caranî nemawe

Çiraxî nazim û munşî kujawe

Le dewrî ême roman û cerîde
eger çî meqsed e, zanînî baw e

Eman qedrî bizane em kitêbe
le dinyay êstekey hemtayî nemawe

Le eyyamî heyatî Şêxî Xanî
le ser nusxey xetî ew nusraw e

Le lay erbabî xoy bo qedr û qîmet
xezîney gewher e w kêse diraw e

Le mecmûû duwel, Soran û Botan
le sayey em kitêbe nasraw e

Le kurdan xeyrî Hacî w Şêxî Xanî
esasî nezmî kurdî danenawe

(Binêre; Kurdistan Rojname kurdî ya Pêşîn 1898-1902 berhevoka M. Emîn Bozarşan c. 1 Uppsala 1991, beşê hejmara sisiyan û werger û xwerûkirinên wê yên ku j alî Bozarşanî ve hatine çêkirin.)

Celadet Alî Bedirxan di wê hejmara Hawarê de ya ku hat binavkirin, dibêje ku ev Mem û Zîna destxet a ku Hacî Qadirê Koyî ev şîr li ser nivîsîye, destxeta bavê wî Emîn Alî Bedirxan bi xwe bûye.

29 *Binêre; Hawar, hejmar 45, çapxana Sebatê, 20 hezîran 1942, Şam û hejmarên li dûv wê..*

30 *Alaeddîn Seccadî, dinivîse ku "mesela jidayikbûna Ahmedê Xanî diyar e û wî bi xwe di Mem û Zîna xwe de gotiye ku:*

Lew ra ku dema ji xeybê fek bû
tarîx hezar û şêst û yek bû.

Hezar û şêst û yekê Hîcrî dike 1650-yê Mîladî. Lê mesela mirina wî ne diyar e, vê meselê wek gellekên din eziyet û zehmetî daye

min jî, tu kitêb nemane ku min li wan nenihêrtibe, lêkolîn nekiribe. Min nihêrtiye ku hemû di vê meselê de bi vacayîya hev in û min tu tişt ji hev dernexist. Heta sala 1946-ê ji melayekî pîr tiştêk bi destê min ket û ji bo min bû belge. Piştî wî jî çend min muhaweले kir lê ji vê zêdetir tiştêk neket ber destê min. Li gorî wê belgeyê goya "Tara Xanî îla Rebbe" tarîxa mirina Ahmedê Xanî ye ku bi hesabê -ebced-a Hîcrî dike 1118 beramber bi 1706-ê Mîladî. Min ev bi yekcarî da ber tarîxa hatina wî ya dinyayê û li wê jî li hev tê. Loma hîç şika min nemaye ku ev mêjû, mêjûyeke rast e... " Mêjûyî Edebî kurdî, 1952, r. 191-192

Alaeddîn Seccadî di dîpnoteka vê kitêbê de ya rûpelên 192-193-yê wiha dinivîse:

Wê salê[1946] ji bo nimêja nîvro li mizgefteke Bexdayê bûm. Melayekî pîr ê nûranî bi ber çavê min ket, ku hatibû ji bo nimêjê. Bi cil û bergên xwe min ew wek kurdê dora Dihok û Zaxoyê zanî. Ku nimêj hat kirin ez pêşiyê hatim der, li ser kursiyekê -ku li ber hêwana mizgeftê hatibû danîn- rûniştim û min çaveriya wî kir. Ew jî piştî duaxwendineka gellek, hat derva, min ew rûniştand, cigareyek dayê, bixêrhatin û halpîrsînek dayê û her wiha min dest bi qisekirinê kir li gel wî. Min dîna xwe dayê ku kurd e lê piçêkî bi giranî di qiseyên min digihîje. Min jê pîrsî:

-Tu xelkê ku yî? Got:

-Ez ji gundekî dora Amediyê me. Ji bo xwe kirîn û frotinê dikim û bi îşekî xizmekî jina xwe- ku esker e- ez hatime Bexdayê Lê belê ji şîweya zimanê wî, li dilê min rûnenişt ku bi tevayî xelkê Amediyê be. Min çav ji vê re girt û hinekî li ser mesela Melayê Cizîrî jê pîrsî. Got:

-Ez tiştêkî wiha jê nizanim, şîrên wî, feqî niha jî di bezman de dixwînin. Îca min got:

-Lê Ahmedê Xanî?..

Keserek kêşa û deng nekir. Min got:

-Ji bo çî tu qise nakî? Got:

-Tu ji bo çi li van dipirsî? Min got:

-Ez kurd im, min edebiyata kurdî divê û ez dixwazim wan binasim. Îcar ji min pirsî:

-Tu kê yî? Min jî navê xwe jê re got... Got:

-Ahmedê Xanî, xwediyê Mem û Zînê ji Bayezîdê ye. Min got:

-Belê ji wê derê ye, lê belê min tiştên ji vê zêdetir divên.

Ji min re gellek qise kirin, tenê behsa navê bavê Ahmedê Xanî ji min re got ku Îlyas e. Lê wî digot; "Helyas". Îcar got:

-Kitêbeka min a destxet heye jê re dibêjin Semediye[Sadula?] û kevn e jî. Di dewra feqîtiya min de ev kitêb bi destê min ket, min dixwend. Li pişt vê kitêbê dinivîsî: Tarîxa wefata Ahmedê Xanî: "Tara Xanî îla Rebbe". Niha jî ev kitêba min ji sermiyanê kevn her mayiye.

Min gellek tiştên tir her di vê babetê de jê pirsîn. Piştî li ser xwe piçekî din ez agahdar kirim, got. Ya rastî bêjî ez bi esl ji xelkê dora Bedlîsê me, di Şerê Pêşî de(Şerê Cîhanê ê Yekê) li wê derê nemam, çûm Pîranê ba Şêx Seîdî, di encamên wan salan de -mebesta wî salên 25-30-ê bû- ji wê jî bêtir derbeder bûm û niha ez hatime Îmadiyê[Amediyê].

Kesereka din kêşa û êdî me dawî li qiseyên xwe anî. Her ji wê wextê de ku tarîx ji min re got, min li ba xwe nivîsî. Gellek mixabin ku navê gundê wî nenivîsî û niha ji bîra min çûye. Û ji bo min jî derket ku ev meriv, merivekî rastgo ye, bi taybetî di mesela tarîxê de. Bêyî ku bifikire ev hatibû ser zimanê wî û gotibû.

Me biryar da ku bê ba min, lê belê welê derket ku ji ber îşê xizmê wî jê re lê nehat ku bê. Êdî min ew nedî, niha jî ez nizanim maye an miriye. Ew wextê ku çavên min pê ketin dibe ku şêst, şêst û pênc sal umrê wî hebû, navê wî jî Mela Salih bû...

Gava meriv vê çîrokê û agahiyên li ser jiyana Ahmedê Xanî ji nivîsa Alaeddîn Seccadî dixwîne, pirtir qenaeta meriv diçe ser wê yekê ku ew agahiyên ku Alaeddîn Seccadî li ser jiyana Ahmedê Xanî û li ser **Mem û Zînê** nivîsîne ji devê vî melayî hatine girtin. Çimkî diyar dibe ji bilî van agahiyên Alaeddîn Seccadî bi xwe zêde li ser Mem û Zînê kûr ranewestiyaye, heta Mem û Zîn bi xwe baş nexwendiyê. Di rûpelê 201-ê yê kitêba xwe de dibêje ku du keçên Mîrî hebûne bi navên Sitî û Zîn. Her wiha gava behsa hersê birayan, Tacdîn, Çeko û Arif dike; li şûna Arifî dibêje Hîfo. Eger wî Mem û Zîn baş bixwendaya wê ev şaşîti nekira û bizanibûya ku Sitî û Zîn ne keçên Mîr in, lê xwişkên wî ne. Tevî şaşîtiyên wekî vê jî lêkolîna Alaeddîn Seccadî, nivîsara herî pêşîn a ciddî ye û yek ji wan berçavtirîn û birûmettirîn agahî ye ku heta niha di heqê Ahmedê Xanî û bîr û baweriyên wî de hatiye dayîn.

Piştî wî tu kesî agahiyeke konkret li ser jiyana Ahmedê Xanî nedaye ku di nivîsa wî bi xwe de nebe. Heta gellekan agahiyên di nivîsa wî de û gellek caran jî bi kurtkirin û herimandin girtine, di kitêb û meqalên xwe de nivîsîne û hinekan navê wî jî nedane.

Alaeddîn Seccadî piştî di kitêba xwe de ya bi navê **Edebî kurdî w Lêkolînewe Le Edebî kurdî** da jî li ser Ahmedê Xanî rawestiyaye. Ew di vir de Ahmedê Xanî dike pêşrewê şeqa edebiyata neteweperweriyê ya ku di sedsala 17-ê de destpê kiriye³¹.

³¹ *Seccadî, Alaeddîn; Edebî kurdî w Lêkolînewe le Edebî kurdî da, çapxaneyî Mearîf, 1968, Bexdad r.245-256.*

Gîwî Mukriyanî, di sala 1954-ê de, li Hewlêrê **Mem û Zîn** tevî pêşgotineka xwe da weşandin. Ji bo ku Gîwî Mukriyanî, çapa Îstenbûlê a 1919-ê çapa yekê û çapa 1947-ê a Halebê ya duduyan hesab dike, ya xwe jî kiriye çapa sêyem³². Her ev çapa wî, di sala 1968-ê (li gor hinekan 1967-ê³³) de cara duyê dîsa li Hewlêrê hatiye weşandin.

Lê li gorî meqaleya bi navê "**Çapekanî Mem û Zînî Xanî**" ya ku di 1971-ê de di **Rojî Kurdistan/Şemsî Kurdistan** de hatiye weşandin ya balkêş ew e ku wî ji bo vê çapa xwe jî gotiye "çapa sisiyan". Li gor meqaleyê, di vê çapê de Gîwî Mukriyanî êdî çapa Îstenbûlê ya 1919-ê û ya Helebê ya 1947-ê nake bingehên çapên xwe, lê ji dêlva vê ve behsa wê yekê dike ku wî di sala 1915-ê de cara yekê li Helebê li çapxaneyê Kurdistanê 1000 nusxe dane çapkirin, lê dinivîse ku wî ji bîr kiriye ku ew di çapa pêşîn a Hewlêrê de behsa vê çapê bike.

Di meqaleya "**Çapekanî Mem û Zînî Xanî**" de hatiye nivîsîn ku çapeka bi vî awayî qet nehatiye dîtin û ne jî hatiye bihîstin û ev agahdarî ne rast e. Her wiha ew meqale îdîa dike ku Gîwî Mukriyanî di çapa xwe ya Hewlêrê de beyteka Ahmedê Xanî jî guhertiye, li ciyê ku Ahmedê Xanî nivîsiye:

32 "*Çapekanî Mem û Zînî Xanî*"; *Rojî Kurdistan/Şemsî Kurdistan*(kovar), no: 5-6, Ab-Eylul 1971 r. 42.

33 *Bozarşlan, M. Emîn*; "*Roja ku di tarîtiyê de hilat: Ehmedê Xanî*", *pêşgotin, Mem û Zîn, Ehmedê Xanî*, , *Wergêrê tîpên Latîni û kurdiya Xwerû: M.Emîn Bozarşlan, 1995 Uppsala r. 99.*

"Ecnasê milel mutî' û munqad
Nesla wî ereb, emîrê ekrad",

Gîwî Mukriyanî nivîsiye:

"Ecnasê milel mutî' û munqad
Fexrî Mîdiya, emîrê ekrad"³⁴

Muhemmed Seîd Remezan Botî, **Mem û Zîn** bi awayekî nesir wergerandiye ser zimanê erebî û ev werger di 1957-ê de li Şamê hatiye çapkirin³⁵. Lê mixabin, Muhemmed Seîd Remezan Botî ew qismên **Mem û Zînê** yên fikrî, millî, felsefî û tesewwufî wernegerandine, tenê beşên çîroka evîndaran wergerandine³⁶. Pişt re, ev, çend carên din jî hatiye çapkirin.

Ji wan çend kesên ku li ser Ahmedê Xanî û **Mem û Zîna** wî xebatên hêja kirine yek jî mamosta Hejar Mukriyanî ye. Cara pêşîn wî **Mem û Zîn** bi wezin wergerandiye ser zaravayê Mukriyanî û ev, di sala 1960-ê de li Bexdayê li çapxaneyê Necah hatiye çapkirin. Di vê çapê de Hesên Qizilcî û Hejarî her yekî pêşgotinek nivîsîye ku ya Qizilcî, li ser jiyana Ahmedê Xanî û giringiya Mem û Zînê ye.

³⁴ "Çapekanî Mem û Zînê Xanî"; *Rojî Kurdistan/Şemsî Kurdistan(kovar)*, no: 5-6, Ab-Eylul 1971 r. 42..

³⁵ Bozarşan, M. Emîn; "Rojê ku di tarîtiyê de hilat: Ehmedê Xanî", *pêşgotin, Mem û Zîn, Ehmedê Xanî, , Wergêrê tîpên Latînê û kurdiya Xwerû: M.Emîn Bozarşan, 1995 Uppsala r. 99.*

³⁶ Binêre; Shakely, Ferhad; *Kurdisk Nationalism i Mem û Zîn av Ehmed-i Xanî, Höskolan För Lärarutbildning i Stockholm, wergerra ji Îngilîzî bo Swêdî: Birgitta Mekander 1985 r.4.*

Lê agahiyên ku di vî warî de ew dide pirtir xwe dispêrin yên Alaeddîn Seccadî bêyî ku navê wî bê dayîn. Mamosta Hejar pişt re careka din vegeyriyaye ser xebata li ser Mem û Zînê, vê carê orîjînalê Mem û Zînê bi şîrovekirina gotinên erebî, farisî, tirkî û yên felsefî û tesewwufî amade kiriye. Bi navê "Mem û Zînê Xanî çiye?" pêşgotineka lêkolînî ya hêja jê re nivîsiye ku li vê derê behsa giringî û maneya **Memû Zînê** dike, wan fikrên Ahmedê Xanî yên di **Mem û Zînê** de diyarkirî destnîşan dike û payeberziya fikrên wî radixe ber çavan. Ji bo ku mamoste Hejar hem şair, hem jî zanayekî ilmî û dînî yê kurdan bûye ku bi erebî, farisî, tirkî û herdu lehceyên kurdî; kurmançî û soranî baş zanibûye, hem di jêrenotên xwe de ku ji bu orîjînalê **Mem û Zînê** hatine amadekirin, him jî di wergera xwe ya menzûm de pir bikêrhatî bûye, şerheka gellek bi qîmet pêşkêşî xwendevanan kiriye. Ev xebata wî ya duduyan ji alî Enstîtuya Kurd li Parîsê sala 1989-ê hatiye çapkirin. Di vê çapê de berê pêşgotina Hejarî tê, pişt re orîjînalê **Mem û Zînê** li gel têbiniyên wî tî. Dûvre pêşgotina Hesên Qizilcî û ya Hejarî a sala 1960-ê tê, di dawiyê de ji wergera Hejarî ya manzûm a bi ser Mukriyanî cih digre³⁷.

Margareth Borisova Rudenkoyê(1926-1977) sala 1954-ê li ser **Mem û Zînê** doktoranameya xwe amade kir. Ev doktoraname bi navê "Destana Mem û Zînê ya şairê kurdan ê sedsala 17-ê Ahmedê Xanî" ye,

37. Binêre; *Mem û Zîn, Ahmedê Xanî, amadekirdin û perawêznûsînê Hejar, 1989, kurdish Institute press, Paris.*

131 rûpel in û hê nehatiye çapkirin³⁸. Kurdologa hêja Margareth Borisova Rudenkoyê, **Mem û Zîna** Ahmedê Xanî jî bi herfên erebî û bi tercumeya wê ya rûsî amade kir, ev kitêb sala 1962-ê li Moskovayê hat çapkirin³⁹.

Pêşgotineka Rudenkoyê ya lêkolînî ya bi Rûsî û yeka Prof. Qanatê kurdo ya bi kurdî jî di vê çapê de cîh digre. Rudenkoyê neh nusxeyên destnivîs ên Mem û Zînê dane berhev û tekstê orîjînal tekûztir daye çapkirin. Me bi xwe ev xebata Rudenkoyê nediyê, lê tiştên ku heta niha li ser vê hatine nivîsîn ji gellek aliyên didin nîşandan ku heta îro xebata herî hêja ya ji derveyî welêt hatiye kirin ya Rudenkoyê ye. Gellek mixabin ku ev xebat heta îro jî bi rûsî maye, kurdên rûsînezan ji vê bêpar mane.

M. B. Rudenko her wiha ketiyê nav destnivîs û berevokên Aleksandre Jaba ên ku li Kutubxana Lenîngradê (ku niha navê wê Kutubxana Millî ya Rûsyayê ye û li Petersburgê ye) hatine parastin, hemû ji hev derxistine, kontrol kirine, naveroka wan tesbît kiriye û ev lêgerîn û lêkolîna xwe wekî kitêbekê amade kiriye.

³⁸ Alakom, Rohat; "Kürt Ulsal Manifestosu 300 Yaşında", *Özgür Politika, rojnameya rojane ku li Almanyayê derdikeve, hejmarên navbera 11-17-ê Îlona 1995-ê*.

³⁹ Rudenko, M. Borisova; *Mam i Zin kriticheskii tekst, perevod, predislovie i ukazateli M. B Rudenka, Parniatniki literatury narodov vostoka, Teksty, Mala seriia 13 (Moskva: Izdatel-stvo Vostochni Literatury, 1962) neqil ji Chyet, Michael L.; -And a thornbush sprang up between them": Studies on "Mem û Zîn", a kurdish romance. UMI Dissertation Service, 1991 cild 1, r. 31.*

Ev kitêb sala 1961-ê li Moskovayê hatiye weşandin⁴⁰. Di vir de reqemên arşîvên kutubxanê, nav û naverok, nivîskar, berhevkerên tekstan, tarîx û ciyê berhevkirina wan diyar in. Bi vî awayî, agahdarî li ser **Mem û Zîn**, **Nûbar** û hin şîr û xazelên Ahmedê Xanî jî di vê kitêbê de hene.

Di hejmara 1-ê a kovara **Ronakbîrî** de ku di adara 1995-ê de çap bûye meqaleyeka Rudenkoyê bi soranî hatiye weşandin ku navê wê "Edebî kurdîy sedeyî hevdeyem" e. Li vê derê ne diyar e ku Rudenko ev meqale kengê nivîsiye û ew li ku derê çap bûye. Her wiha ne diyar e ku kê ew wergerandiye jî. Meqale behsa edebiyata kurdî dike ku beşekî mezin ê wê li ser Ahmedê Xanî û bîr û baweriyên wî ne. Rudenkoyê di vê meqala xwe de jî rûmeteka bilind daye Ahmedê Xanî.⁴¹

Gellek mixabin ku di nava kurdan de hetta îro lêkolîneke ciddî û berfireh li ser xebatkareke weka Rudenkoyê nehatiye kirin û kurd wê qenc nasnakin. Ji bilî van, diyar dibe ku Rudenkoyê hin lêkolînên hêja yên din jî li ser şîrên Ahmedê Xanî yên nav tekstên A. Jabayî kirine.

⁴⁰ Rudenko, M. B.; *Opicanie kurdsikix rukopiceiy Leningradckix sobraniy, Akademia Nayk CCCR Institut Narodov Azii, Mockva, 1961.*

⁴¹ Rudenko, M. B.; "Edebî kurdîyî sedeyî hevdeyem", *Ronakbîrî -govarêkî kulturîy giştî ye, hejmar 1, Martî 1992, Stockholm, r. 73-89.*

Şevket Baysanoğlu, sala 1960-ê, di kitêba xwe de ya bi navê **Diyarbakırlı Fikir ve Sanat Adamları**, cîh dide jıyan û xebata Abdülaziz Halis Çıkıntaşê şair ê diyarbekirî, di vê navberê de behsa wê yekê dıke ku vî şairî di sala 1906-ê de **Mem û Zîna** Ahmedê Xanî bi awayekî wezin wergerandiye ser zımanê tirkî. Baysanoğlu dide diyarkirin ku ev werger nehatiye çapkirin û di kitêba xwe de cîh dide muqedîma Abdülaziz Halil Çıkıntaş a ku wî ji bo wergera tirkî ya **Mem û Zînê** nivîsiye, di pey re jî cîh dide hin beytên wergera tirkî ya **Mem û Zînê**⁴²

Musa Anter, sala 1962-yê, di hejmara 2-yê a rojnameya Dicle-Firatê de bi înzaya "**Rahşan**" nivîsek li ser Ahmedê Xanî nivîsiye ku navê wê "**Şêx Ehmedê Xanê**" ye⁴³.

Ubaydullah Ayyubiyân, di sala 1962-ê de kitêbek bi zımanê farisî amade kir ku navê wê **Çirîkey Mem û Zîn: kurdî-farisî** ye. Di vir de bi navê "Bar-rasî-i tahqîqî-i -çirîkeh-i Mam û Zin va shahkar-i Ahmad-i Khanî-i Mam û Zin" beşek heye ku Ayyubiyân

⁴² Şevket, Baysanoğlu; *Diyarbakırlı Fikir ve Sanat Adamları*, ikinci cilt, *Tanzimattan Cumhuriyet-e Kadar*, İşûl Matbaasû, İstanbul, 1960, r. 332-340.

⁴³ Rahşan[Musa Anter]; "**Şêx Ehmedê Xanê**", *Dicle-Firat Aylûk Fikir Gazetesi*, hej. 2 1/11/1962, İstanbul, neqil ji *Malmîsanij&Mahmûd Lewendî Li kurdîatana Bakur û li tirkîyê Rojnamegeriya kurdî(1908-1981)*, *Weşanên Jîna Nû*, Uppsala, 1989, r. 135-150.

Mem û Zîna folklorî û ya Ahmedê Xanî hemberî hev dike⁴⁴.

Abdal Hamid Husayni[Abdulhamîd Huseynî], sala 1963-ê meqaleyek bi navê "Ahmad-i Khanî va manzûmah-yî Mam o Zin," di nav Nashriyah-yî Danîşkadeh-yî Adabiyat va -Ulûmî Însanî-yî ew Tabrizê de weşand⁴⁵. M. L. Chyet, rexneyeka tûj li vê meqaleyê digre û dibêje ku ferqekê naxe navbera versiyona edebî ya Ahmedê Xanî û yên devkî û pişt re îddîa dike ku yên devkî ji ber ya Ahmedê Xanî hatine girtin, lê di esasê de bi eksê wê ye⁴⁶.

M. Emîn Bozarsalan, **Mem û Zîn** wergerand tirkî û ev werger sala 1968-ê li Îstembûlê bi kurmanciyeka bi herfên latînî re hat çapkirin.

⁴⁴ Ayyubiyani, Ubaydullah; çirîkey Mem û Zîn: kurdî-farîsî, Tabrîz Chapkhanah-i Shafaq, [1962], pp 20-35, neqil ji Chyet, Michael L.; -And a thornbush sprang up between them": Studies on "Mem û Zîn", a kurdish romance. UMI Dissertation Service, 1991 cild 1, r. 16.

⁴⁵ Husayni, Abd al Hamid; "Ahmad-i Khanî va manzûmah-yî Mam o Zin," Nashriyah-yî Danîşkadeh-yî Adabiyat va -Ulûmî Însanî-yaî Tabriz, 25(1352[1963] pp. 74-88. neqil ji Chyet, Michael L.; -And a thornbush sprang up between them": Studies on "Mem û Zîn", a kurdish romance. UMI Dissertation Service, 1991 cild 1, r. 28. Noteka taybetî ya ku min ji Malmîsanîj wergirt hejmar û tarîxa weşandina vê kovarê bi vî awayî dide: Neşriyyeyê Danîşkedayê Edebiyyat o ulûmê Însanîyê Tebrîz, Tebrîz, no 105(bihar 1973)

⁴⁶ Chyet, Michael L.; And a thornbush sprang up between them": Studies on "Mem û Zîn", a kurdish romance. UMI Dissertation Service, 1991 cild 1, r. 28-29

Ji bo ku qanûnên Tirkiyeyê rê nedidan, M. Emîn Bozarlanî beşên kitêbê yên li ser kurdîtiyê û bîr û baweriyên millî yên Ahmedê Xanî jê derêxistibûn û bi vî awayî ew dabû çapkirin.

Ev nusxe li ber çapa Îstanbûlê ya 1919-ê û li ber nusxeyeka destnivîs a bavê Bozarlanî hatiye amadekirin. Ev çap bi wê kêmasiya xwe li Îstenbolê cara duduyan di 1975-ê de (li ser çapa sisiyan nivîsandiye ku çapa duduyan di 1973-ê de bûye), cara sisiyan di 1990-ê de hat çapkirin⁴⁷.

Bozarlanî, piştî van çapan jî xebata xwe ya li ser **Mem û Zînê** ranewestand. Dest pê kir bi awayekî menzûm ew wergerand ser kurdiyeka xwerû, piştî pêşgotineke lêkolînî ya dirêj a hêja bi navê "Roja ku di tarîtiyê de hilat: Ehmedê Xanî" li ser jiyana Ahmedê Xanî, bîr û baweriyên wî yên li ser kurdîtiyê û gellek warên din û li ser **Mem û Zînê** bi xwe amade kir û bi vî awayî hem orjînalê wê hem jî kurdiya xwerû li rex hev, sala 1995-ê li Upsalayê da çapkirin. Ev çapa nuh a keda Bozarlan ji bo ku xebatên heta wê rojê yên li ser **Mem û Zînê** bi taybetî tecruba xwe ya wergera tirkî û xebata Hejar li ber çav girtiye, fêde ji wan girtiye, gellek tekûztir bûye û xebata herî pêşkeftî, berfireh û cidîtir a heta îro ye.

⁴⁷ Bozarlan, M. Emîn; "Roja ku di tarîtiyê de hilat: Ehmedê Xanî" , pêşgotin, Mem û Zîn, Ehmedê Xanî, , Wergêrê tîpên Latînî û kurdiya Xwerû: M. Emîn Bozarlan, 1995 Uppsala r. 101 û Mem û Zîn, Ahmedê Xanî, wergêr M. Emin Bozarlan, 3. baskû, Hasat Yayûnlarû 1990, Istanbul.

Lê gellekî balkêş e, ku M. Emîn Bozarşan di vê lêkolînê de hema hema qet cîh nedaye bîr û baweriyên Ahmedê Xanî yên felsefî û tesewwufî. Em dizanin ku bîr û baweriyên di vî warî de aliyên girîngtirîn ê Ahmedê Xanî ne.⁴⁸

Abdulreqîb Yûsuf, sala 1970-yê, li Kurdistana Îraqê bi navê **Dîwana Kurmancî** kitêbek da weşandin ku tê de li gel hin şîrên şairên kevn, lêkolînek li ser rastî û tarîxa jiyana Mem û Zînê û şîreka Ahmedê Xanî jî cih girtibû. Ev şîr bi çar zimanan hatiye nivîsîn; erebî, farisî, tirkî û kurdî. Her rêzeka qitayeka wê bi zimanekî ye. Ev şîr pişt re di hin ciyên din de jî derketine. Di beşa şîrên Ahmedê Xanî yê vê xebatê de me ev şîr dane ber yên pişt re çapbûyî û weşandiye. Dîwana Kurmancî ya Abdulreqîb Yûsuf sala 1988-ê li Swêdê, li Uppsalayê bi navê **Şairên Klasîk ên Kurd** di nava weşanên Jîna Nû de hat weşandin⁴⁹.

Cemal Nebez tercumeyeka kurtkirî ya **Mem û Zînê** bi zimanê Almanî ya bi navê **Mam und Zin: genannt Romeo und Julia der kurden**: Übersetzung Vorwort und Kommentare,

⁴⁸ *Mem û Zîn, Ehmedê Xanî, wergêrê tîpên Latînî û kurdîya xwerû: M. Emîn Bozarşan, 1995, Uppsala.*

⁴⁹ *Yûsuf, Abdulreqîb; Şairên Klasîk ên kurd, wergêrê ji tîpên erebî: Alî Şêr, Weşanên Jîna Nû, 1988, Uppsala.*

sala 1969-ê li Almanyayê da çapkirin⁵⁰. Kemal Fuad di kitêba xwe ya bi navê **Kurdische Handschriften** de li gel destnivîsên kurdî yên din behsa gellek nusxeyên destnivîs ên **Mem û Zînê û yên Nûbara Biçûkan** dike ku di kutubxanên Almanyayê de hene. Mesela ew (di r. 86-ê de) behsa destnivîseke **Nûbarê** dike ku yek ji wan sê nusxeyan e ku di Kutubxana Marburgê ya Dewletê de ne, di sala 1121-ê Hîcrî de (1709-1710-ê mîladî de) an go du sê sal piştî mirina Ahmedê Xanî li Hîzanê hatiye nivîsîn⁵¹.

Sala 1978-ê, di **Govarî Korri Zanyariy Kurd** de lêkolîneka Qanatê Kurdo ya bi navê "Derheqa şovêd Mem û Zîna Zargotî û şova Mem û Zîna Ahmedê Xanî," hat weşandin.⁵²

50 Binêre; Shakely, Ferhad; *kurdisk Nationalism i Mem û Zin av Ehmed-i Xanî, H-gskolan F-r L"rarutbildning i Stockholm, wergerra ji Îngilîzî bo Swêdî: Birgitta Mekander 1985 r.4 Navê vê berhemê ev e: Mam und Zin: genannt Romeo und Julia der kurden: Übersetzung Vorwort und Kommentare (München: Nukse, 1969) Berhem 47 rûpel in. Neqil ji Chyet, Michael L.; -And a thornbush sprang up between them": Studies on "Mem û Zîn", a kurdish romance. UMI Dissertation Service, 1991 cild 1, r. 32.*

51 Malmisanlû[MALMÎSANIJ], Mehmet; "Osmanlı Döneminde Yazılan Kürtçe Eserler" *Tarih ve Toplum Aylık Ansiklopedik Dergi*, sayı 54, Haziran 1988, İstanbul, r. 62.

52 Kurdo, Qanatê; "Derheqa şovêd Mem û Zîna zargotî û şova Mem û Zîn a Ahmedê Xanî," *Govarî Korri Zanyariy kurd*, 6(1978) pp. 78-110, neqil ji Chyet, Michael L.; -And a thornbush sprang up between them": *Studies on "Mem û Zîn", a kurdish romance. UMI Dissertation Service, 1991 cild 1, r. 16.*

Prof. Dr. Îzzeddîn Mustafa Resûl di dema amadekirina nameya xwe ya doktorayê de li Enstîtuya Lêkolînên Rojhilatî ya Akademiya Zanistî ya Moskovayê xebateke hêja li ser bîrûbaweriyên Ahmedê Xanî kiriye, ev xebat paşê bi navê **Ehmedê Xanî, Şaîren we Mufekkîren, Feylesûfen we Mutesewwîfen** di sala 1979-ê de li Bexdayê ji alî çapxaneyê El Hawadîs hatiye weşandin. Tiştên ku li ser vê eserê hatine nivîsîn, destnîşan dikin ku ev jî yek ji wan lêkolînên hêja ye ku li ser Ahmedê Xanî hatine kirin. Ciyê mixabiniyê ye ku ev berhem heta niha nehatiye wergerandin ser zimanê kurdî û bi taybetî xwendevanên Kurdistanê Tirkîyê jê bêpar mane. (Wergera tirkî ya vê kitêbê di 2007-ê de li Îstanbulê ji bal weşanxaneyê Avestayê hat çapkirin. –Murad Ciwan-) Meqaleyeka Prof. Dr. Îzeddîn Mustafa Resûl ya bi navê "Mem û Zînê Pîremêrd û Mem û Zînekanî tir", di hejmara 3-4-ê a **Ronakbîrî** de hat weşandin. Di wê derê de ew li ser **Mem û Zîna** piyes a Pîremêrd radiweste û dinivîse ku her çendîn Pîremêrd îlham ji **Mem û Zîna** Xanî û yên folklorî wergirtibin jî ev ne wergêran an teqlîda yekê ji wan e, lê berhemeka serbixwe ya Pîremêrd e ku li gorî nasyonalîzma sedsala bîstan a kurdan hatiye tefsîrkirin û hûnandin.

Di 1971-ê de, Hafîz Mustafa Qazî, di **Rojî Kurdistan \ Şemsî Kurdistan** de bi navê "Ahmedê Xanî" meqaleyek nivîsiye⁵³.

⁵³ Qazî, Hafîz Mustafa; "Ahmedê Xanî", *Rojî Kurdistan/Şemsî Kurdistan*, hej 1 Hezîran 1971, Bexdad r. 52.

Di hejmara 5-6-ê a kovara **Rojî Kurdistan/Şemsî Kurdistan** de di 1971-ê de bi navê "Çapekanî Mem û Zînê Xanî" meqaleyek hat çapkirin ku tê de li ser hin çapên **Mem û Zînê** tîrî rawestandî, di nav re rexne li çapa 1968-ê a Gîwî Mukriyanî tê girtin⁵⁴.

Mehemmed Enwer Elî ku ji kurdên Kurdistana Sûriyeyê ye, sala 1972-yê bi navê **Ahmed el Xanî Felsefetu-l-Tesewwuf bî Dîwanîhî "Mem û -Zîn"** li Beyrûdê nama we ya lîsansê ya ji bo beşê edeba rojhilatî ya Unîversîta Qedîs Yûsif li Lubnanê li ser felsefe û tesewwufa Ahmedê Xanî daye. Ev xebat 201 rûpel in, bi erebî ye û mixabin ku heta niha nehatiye çapkirin⁵⁵.

Asker Şamîlov, Mem û Zîn wergerand ser zimanê azerî û ev werger, di 1976-ê de li Azerbaycanê hat weşandin⁵⁶. Kasim Kasimzade jî jê re pêşgotinek nivîsiye û tê de gotiye ku **Mem û Zîn** ansîklopediya jiyana kurdan e. Ew pirtir li ser aliyên humanist ên **Mem û Zînê** radiweste û li ser vê, tefsîrên xwe dike.

⁵⁴ "Çapekanî Mem û Zînê Xanî"; *Rojî Kurdistan/Şemsî Kurdistan*, no 5-6, Ab-Eylul 1971, Bexdad, r.42-43.

⁵⁵ Elî, Mehmed Enwer; *Ahmed el Xanî Felsefetu-l-Tesewwuf bî Dîwanîhî "Mem û -Zîn"*, *Camîatu-l-Qedîs Yûsif, Maahad al Şarqîyya* 1972.

⁵⁶ *Serpêhatiyeka balkêş a Asker Şamîlovî li ser vê wergerê heye ku di Îlona 1996-ê de, gava ew hatibû konferansa zanistî ya li ser bajarvaniya kurdan a li Parîsê, wî bi xwe ji Malmîsanij re bahs kiribû û Malmîsanij jî ji bo min veguhazt: Gava Asker Şamîlov Mem û Zîna Ahmedê Xanî werdigere ser zimanê Azerî, ew li Azerbaycana Sovyetî li herêma Kelbejarê dijî û li wê derê*

wergerê dide berpirsiyarên dewletê yên ku eserên edebî qîmet dikin û ku hêjayî çapkirinê bibînîn dixin programekî ku gava dora wê hat ew jî çap bibe. Tê zanîn ku ji ber vê prosesê, carina hin eser bi salan dor nediditin ku bêne weşandinê. Wergera Şamîlovî jî bi vî awayî dereng dikeve, lê ew gumanekê nabe ser, dibêje ev proseseka normal e di vê dewletê de. Di vê navberê de carekê ew diçe Moskovayê û bi trêne vedigere Kelbejarê. çawa ku li Îstasyonê peya dibe çend polîs wî digirin dibin qereqolê, bêyî ku jê re bibêjin ku çima ew girtine, çend rojan wî li qereqolê dihêlin paşê bê mahkeme û sûcdarkirineka berbiçav wî heşt meh û nîvan di hebsê de li bin çav digrin. Di encama gellek muhawelan de piştî heşt meh û nîvan wî derdixin hemberî mudeîmê am(sawcî). Sawcî dibêje ku li gora usûl û pîvanên dewletê mala Şamîlovî ji yên din mestir û firehtir e, ku goya wî bi hûle û hatineka maddî ya dizî ji bo xwe xaniyekî ji pîvanê mestir ava kiriye. Asker Şamîlov vê îthamê qebûl nake û dibêje ne wiha ye, heke hûn bawer nakin em herin malê bipîvin, heke mezin derket cezayê wê çi be ez hazir im bidim. Li ser vê mudeîam dev ji vê îthamê berdide îca dibêje têkiliyên te bi ajanên emperyalîzmê re hene. Asker Şamîlov bi şiddet vê yekê red dike. Gava welê dibe, mudeîam derdixe wekî delîlê îthama xwe ya casûsiyê wergera wî ya Mem û Zîna Ahmedê Xanî berpêşî wî dike û dibêje ku Ahmedê Xanî merivekî nasyonalîst e, ajanê emperyalîzmê ye. Gava Asker Şamîlov vê ecêba nedîtî dibihêze, aqil di sêrî de namîne, hema radike kursiya bin xwe û li serê mudeîam dide. Qêrîn pê dikeve, polîs ji derva tèn Şamîlovî zeft dikin û pirsiyar dikin ku çi bûye çi qewimiye. Şamîlov radibe li wê derê vê îddîa bêbingeh diguhêze û dibêje "ez razî me ku hûn çi cezayî bidin min lê bes bihêlin ku ez ji we re bêjim bê ka Ahmedê Xanî kî ye. Ahmedê Xanî şairekî kurd e, berî niha bi sêsed salan; di sedsala 17-ê de jiyaye, ew li ku û ajaniya emperyalîzmê li ku?" Tevî ku bêbingehiya îthama mudeîam diyar dibe jî ji bo ku Şamîlovî kursî li serê wî daye sal û nîveka din jî cezayê hebsê didinê, dere zîndanê cezayê xwe dikêşe û derdikeve. Werger jî di 1976-ê de tê weşandin.

Ew beşên dînî yên ku di beşên pêşîn ên **Mem û Zînê** de hatine, ji bal wergêr ve nehatine wergerandin û bi îddîa ku pêwistî bi wan nîne di wergera azerî de nehatine weşandin⁵⁷.

Ji bilî vêo di kovara Azerbaycan (10/1971) de ku li Bakuyê weşiyaye, lêkolîneke Asker Şamîlov a bi navê "Ahmedê Xanî û Destana wî ya Mem û Zînê" derket. Asker Şamîlov di vê lêkolîna xwe de îdfayeka nuh tîne ser ciyê jidayikbûna Ahmedê Xanî û dinivîse ku Ahmedê Xanî li bajarê Hanlik hatiye dinê ku ev bajar li rex çemê Hakkarî yê nav Azerbaycanê ye⁵⁸.

Dr. Nûreddîn Zaza, gava berhevoka **Memê Alan** a ji bal Roger Lescotî ve di 1942-yê de hatiye weşandin xwerû dike û ji nuh ve dide ber weşanê, pêşgotinekê jî jê re dinivîse ku di wê pêşgotinê de ji hin aliyên ve **Mem û Zîna** Ahmedê Xanî û Memê Alan a folklorî hatine raberîhevkirin. Memê Alan a bi pêşgotina Dr. Nûreddîn Zaza bi nasnavê çîroknivîs cara pêşîn di nava weşanên Bahozê de hat weşandin. Cara duduyan, ev kitêb di 1978-ê de li Tirkîyeyê ji bal weşanên Özgürlük Yolu (Riya Azadî) ve tevî wergera wê ya tirkî hat weşandin.

⁵⁷ Alakom, Rohat; "Kürt Ulsal Manifestosu 300 Yaşında", *Özgür Politika, rojnameya rojane ku li Almanyayê derdikeve, hejmarên navbera 11-17-ê Îlona 1995-ê.*

⁵⁸ Alakom, Rohat; "Kürt Ulsal Manifestosu 300 Yaşında", *Özgür Politika, rojnameya rojane ku li Almanyayê derdikeve, hejmarên navbera 11-17-ê Îlona 1995-ê.*

Cara sisiyan bi navê Weşanên Riya Azadî di 1990-ê de li Almanyayê bêyî wergera wê ya tirkî hat weşandin⁵⁹.

Sadiq Bahaeddîn Amedî di kitêba xwe de ya bi navê **Hozanvanêt Kurd** ku sala 1980-yê li Bexdayê ji alî çapxaneyê Korri Zanyariyê Îraq (Akademiya Zanistî ya Îraqê) hatiye çapkirin cihê ji bo jiyana, berhem û bîrûbaweriyên Ahmedê Xanî jî veqetandiyê û yek du şîrên wî jî çap kirine⁶⁰. Agahdariyên ku Sadiq Bahaeddîn li ser jiyana Ahmedê Xanî dane, ew agahiyên Alaeddîn Seccadî ne ku Amedî carina rasterast ji wî bi xwe û carina jî di riya Hesenê Qizilcî re (ku ev pêşgotina xebata Hejar Mukriyanî ye) ji wî girtine. Sadiq Bahaeddîn Amedî, her wiha cih daye çîrokeka gelêrî ku di heqê têkliyên Ahmedê Xanî de ye bi mîrê Cizîra Botan re. Amedî cîh dide nameyeka kurdekî ji Hekariyan ku di wextê xwe de şandiyê radyoya kurdî li Bexdayê û gotiyê ku 'Xanî ji Xana Sêmalan e û ev gund di nava hidûdê Hekariyan de ye.'

Sadiq Bahaeddîn Amedî, di vê derê de dinivîse ku E. B. Soane, di kitêba xwe ya bi navê **Grammar of Kurmanji or Kurdish Language**, (London, 1913) de dinivîse ku "Ahmedê Xanî yê Hekarîyê ku kiryarêt wî yê zor(gellek) çî ji kurdperweriyê yan ji layêt dî ve ji hemiya binavûdengtir e li Kurdistanê û ji derve. Xanî xwendengehek vekir li Bayezîdê digel mizgeftê".⁶¹

⁵⁹ *Destana Memê Alan; Weşanên Riya Azadî, K-In, 1990*

⁶⁰ *Amedî, Sadiq Bahaeddîn; "Ahmedê Xanî", Hozanvanêt kurd, çapxaneyê Korri Zanyariyê Îraq, Bexda, 1980, r.301-352.*

⁶¹ *Amedî, Sadiq Bahaeddîn; "Ahmedê Xanî", Hozanvanêt kurd, çapxaneyê Korri Zanyariyê Îraq, Bexda, 1980, r.310*

Ji meqaleyeka Prof. Qanatê Kurdo ya bi navê "Nûbara Ahmedê Xanî" ku di sala 1980-yê de hatiye nivîsîn û hîn nehatiye weşandin, tê fahmkirin ku di salên 1970-yê de Sadiq Bahaeddîn Amedî, Nûbara Ahmedê Xanî li Îraqê daye çapkirin⁶².

Albayê teqaubûyî yê hêzên jenderman Nazmi Sevgen, di Akademiya Herbê de (Akademiya Eskerî ya Tirkiyê) konferansek bi navê "Doğu'da Kürt Meselesi" (Li Rojhilatê Pirsê Kurdî) da, pişt re di sala 1970-yê de ev konferans di nava weşanên Akademiya Harbê de hat çapkirin. Nazmi Sevgen di vê nivîsara xwe de behsa **Mem û Zîna** Ahmedê Xanî û behsa gorra Mem û Zînê jî dike. Di mesela gorrê de wiha dinivîse Nazmi Sevgen: "Gorra Mem û Zînê li Cizîrê, li gorrîstana Camiya Emîr Abdullah e. Ev ji alî dostê min Abdullah Cîzre ve hatiye tesbîtîkirin. Her du bi hev re di bin kêla gorrekê de ne"⁶³.

Prof. Qanatê Kurdo, di kitêba xwe de ya bi navê **Tarîxa Edebiyata Kurdî**, li hin cihan; bi taybetî jî di wî beşê lêkolîna xwe de ya bi navê "Tarîxa Lêgerîna Edebiyata Kurdî li nav kurdan da û Rûsistanê da" û di wê beşa taybetî de ku li ser Ahmedê Xanî, jiyana, berhemên bîrûbaweriyên wî ne, behsa xebatên Aleksandre Jabayî û yên M. B. Rudenkoyê jî dike ku li ser Ahmedê Xanî û berhemên wî kirine û bi vî awayî

⁶² Kurdo, Prof. Qanatê; "Nûbara Ahmedê Xanî", 22 4 1980, neçapkirî, di arşîva Mahmûd Lewendî de.

⁶³ Sevgen, Nazmi; *Doğu'da Kürt Meselesi, Harb Akademisi Baimevi, 1970, neqil ji Bulut, Faik; Devletin Gözüyle Türkiye'de Kürt İsyamları, Yön, 1991, r. 305*

behsa wî û eserên wî jî dike⁶⁴.

Qanatê Kurdo dibêje ku wî han daye da Rudenko vê zebatê amade bike. Loma jî ew her wiha bûye redaktorê kitêba Rudenkoyê ya li ser **Mem û Zînê** û hem jî pêşgotinek jê re nivîsiye. Tiştêkî balkêş ew e ku tevî ku M. B. Rudenkoyê **Mem û Zîn** hemû wergerandiye rûsî û di **Mem û Zînê** de Ahmedê Xanî bi xwe gotiye ku ew kengî hatiye dinyayê jî, Prof. Qanatê Kurdo di **Tarîxa Edebiyata Kurdî** de, nivîsiye ku Rudenkoyê di pêşgotina kitêba xwe de nivîsiye ku "Ne eyan e kîjan salê A. Xanî ji dayika xwe bûye..."⁶⁵ Pişt re ji şîrovekirinên Prof. Qanatê Kurdo diyar dibin ku wî bi xwe jî **Mem û Zîna** Ahmedê Xanî bi dûr û dirêjayî lênekolaye û ew **Mem û Zîna** Ahmedê Xanî û **Memê Alan** a folklorî têkilhev dike, navên qehremanên Mem û Zînê şaş dinivîse (Ji dêlva Arif re Erfan) û hin navên qehremanên destana folklorî jî wekî yên qehremanên berhema Xanî destnîşan dike ku bi rastî ev qehreman tenê di destana folklorî de hene (wekî Qeretajdîn)⁶⁶.

Di kovara **Ronahî** de ya ku sala 1961-ê li Iraqê derket bi navê "Ahmedê Xanî û berhemên wî" meqaleyeka Qanatê Kurdo derket.

⁶⁴ Kurdo, Prof. Qanatê Tarîxa Edebiyata kurdî, *Weşanên Roja Nû*, Stockholm, 1983 cildê 1-ê.

⁶⁵ Kurdo, Prof. Qanatê; *Tarîxa Edebiyata kurdî*, *Weşanên Roja Nû*, Stockholm, 1983 cildê 1-ê, r. 107.

⁶⁶ Kurdo, Prof. Qanatê; *Tarîxa Edebiyata kurdî*, *Weşanên Roja Nû*, Stockholm, 1983 cildê 1-ê, r.113.

Her ev meqale di hejmara 13. 5. 1962-yê a rojnama **Riya Teze** de jî hat weşandin. Wî her wiha sala 1969-ê di du hejmarên kovara **Çiya** de ku li Almanyayê dihat weşandin, bi navê "Fikrên qewmî di eserên Ahmedê Xanî de" lêkolîneka xwe da weşand. Qanatê Kurdo di sala 1978-ê de jî di hejmara 6-ê a **Govarî Korî Zanyarîy Kurdî** de meqaleyeka xwe ya bi navê "Derheqa Şovêd -Mem û Zîn-a Zargotî û şova -Mem û Zîn-a Ahmedê Xanî" da çapkirin ku tê de **Mem û Zîna** Ahmedê Xanî û varyantên devkî yên gelêrî dide berhev⁶⁷.

Esas li gora ku ew bahs dike, ev meqale ji wê pêşgotina bi navê "Peywendiya Folklor û Lîteratura kurdî" hatiye wergirtin ku wî ji bo kitêbekê amade kiribû û ê di demên pêş de bihataya weşandin. Naveroka vê kitêbê ew bû ku gellek varyantên devkî û ya edebî ya **Mem û Zînê** dida berhev. Lê ev kitêb heta îro jî nehatiye weşandin. Bi munasebeta ku Sadiq Bahaeddîn Amedî, **Nûbara Ahmedê Xanî** li Îraqê da weşandin Prof. Qanatê Kurdo di sala 1980-yê de meqaleyek bi navê "Nûbara Ahmedê Xanî" nivîsî û şand ji Berbangê re ku bê çapkirin. Lê ev meqale tiştê ku ez dizanim heta niha nehatiye çapkirin û di arşîva Mahmûd Lewendî de peyda dibe⁶⁸.

⁶⁷ Kurdo, Prof. Qanatê; "Derheqa Şovêd -Mem û Zîn-a Zargotî û şova -Mem û Zîn-a Ahmedê Xanî,-Govarî Korî Zanyarîy kurdî, cild 6 1978, Bexda. r. 79-110.

⁶⁸ kurdo, Prof. Qanatê; "Nûbara Ahmedê Xanî", 22 4 1980, neçapkirî, di arşîva Mehmûd Lewendî de.

Di ansîklopediya tirkî de ya bi navê Yurt Ansiklopedisi, di beşê Hakkari de kurteparagrafek li ser Ahmedê Xanî jî heye⁶⁹.

Ferhad Şakelî lêkolîneka hêja ya zanistî li ser jiyana û bîrûbaweriyên Ahmedê Xanî yê kurdayetîyê û ciyê wî di nasyonalîzma kurdan de bi îngilîzî amade kiriye û di 1983-yê de ev bi navê **Kurdish Nationalism in Mem u Zin of Ehmedi Xani** pêşkêşî Beşê Zimanên Îranî yê Unîversîteya Uppsalayê ya Swêdê kiriye. Ev xebat pişt re ji alî Birgitta Nelander hatiye wergerandin ser zimanê Swêdî û ji alî Mekteba Bilind ji bo Hîndekariya Mamostan li Stockholmê (Högskolan För Lärarutbildning i Stockholm) di 1985-ê de hatiye weşandin⁷⁰.

Feryad Fazil Umer, di 1986-ê de kitêbek bi navê **Edebî Kurdî** li Almaniyayê weşand ku tê de beşek jî li ser Ahmedê Xanî ye. Ew Ahmedê Xanî wek nimûneyeka şairên kurmanç di berhema xwe de dide û bi kurtî li ser jiyana û berhemên wî radiweste⁷¹. Ev beş kurtebahsek e ku ji hin berhemên berê hatiye komkirin.

⁶⁹ "Şeyh Ahmet Hani", *Yurt Ansiklopedisi, Anadolu Yayıncılık A.Ş. Istanbul, 1982, Cilt 5, madda Hakkari, r. 3360.*

⁷⁰ Shakely, Ferhad; *kurdisk Nationalism i Mem û Zîn av Ehmed-i Xanî, H-gskolan F-r Lärarutbildning i Stockholm, wergerra ji Îngilîzî bo Swêdî: Birgitta Melander 1985 û Bozarlan, M. Emîn, "Roja ku di tarîtiyê de hilat: Ehmedê Xanî" , pêşgotin, Mem û Zîn, Ehmedê Xanî, Wergêrê tîpên Latînî û kurdiya Xwerû: M. Emîn Bozarlan, 1995 Uppsala r. 99.*

⁷¹ Umer, Feryad Fazil; *Edebî kurdî, Le bilawkirawekanî Xwêndinê kurdî, Berlin 1986 r. 74-91.*

Perwîz Cîhanî jî xebatek hêja li ser **Mem û Zînê** kiriye, gellek nusxeyên çapkirî û yê destnivîs dane ber hev û bi jêrenotên şerhê carna jî bi şerheka fireh a beytan li binê rûpelan danîye, pêşgotinek li ser jiyana Ahmedê Xanî û li ser **Mem û Zînê** jî amade kiriye, pişt re jî, metnê kurdî yê orîjînalê xebata Rudenkoyê jî daniye pişt vê xebatê û bi vî awayî daye çapkirin. Ev berhem sala 1988-ê li Urmîyê ji alî Navenda Weşanên Ferheng û Edeba Kurdî (Intîşaratî-l Selaheddîn Eyyûbî) ve hatiye weşandin. Divê em destnîşan bikin ku ne di beşê teksta Rudenkoyê de, lê di wî beşê de ku Perwîz Cîhanî, ji hin çap û destnivîsan daye ber hev û amade kiriye, beytek heye ku di tu çapên berî wê de nînin. Pişt re di beşê teybetî de yê li ser **Mem û Zînê** (Ev beş di kitêba min a bi navê Ahmedê Xanî, jiyana, berhem û bîrûbawerî û wî, weşanxaneya Doz de ye – Murad Ciwan) em ê vê beytê pêşkêş bikin û li ser rawestin⁷².

Perwîz Cîhanî her wiha di nav weşanên her wê weşanxaneyê de di sala 1367-ê de bi pêşgotineka xwe ya li ser nasandina Ahmedê Xanî yeka li ser **Nûbarê** daye weşandin, ku jêrenotên şîrovekirinê jî jê re dane bin rûpelan. Mixabin ku wî navê kitêbê guheriye û kiriye **Ferhenga Nûbar**⁷³.

⁷² Cîhanî, Perwîz; Mem û Zîn, Navenda Weşanên Ferheng û Edeba kurdî (Intîşaratî-l Selaheddîn Eyyûbî), Urmîye, 1988.

⁷³ Cîhanî, Perwîz; Ferhenga Nûbar, Ahmedê Xanî, Vejandina Perwîz Cîhanî, Navenda Weşanên Ferheng û Edeba kurdî (Intîşaratê Selaheddînê Eyyûbî), 1367 Urmîye.

Amir[Emîr] Hassanpour- Aghdam, sala 1989-ê li Unîversita Illinoisê nameya xwe ya doktorayê ya bi navê **The Language Factor in National Development: The Standardization of the Kurdish Language 1918-1985** da. Di vê doktorenamê de beşê çaran li ser dialektên edebi yên kurdi ye ku ji sedsala 15-ê dest pê dike hetta Şerê Cîhanê tê. Di vê beşê de rola Ahmedê Xanî jî bi awayekî qenc hatiye destnîşankirin⁷⁴. Dr. Emîr Hesepûr, lêkolîneka din a rexnegirî li ser dewra Ahmedê Xanî, kurdperweriya wî, daxwaza wî ya hukumraniya siyasî a kurdan kiriye ku ev, bi navê "Gelî kurd û destelatî sîyasî le Mem û Zînî Xanî da" di hejmarê 12-ê a **Gzîngê** de hatiye weşandin. Diyar e ku meqale di wê hejmarê de xelas nebûye ê dewam bike⁷⁵.

Namûk Açıkgöz ê tirk ê ku bi xwe sentezîstekî tirk-îslamî ye, sala 1990-î bi navê "Ahmed-i Hani'nin Mem u Zin adlı Mesnevisi ve Klasik Edebiyattaki Yeri" (Mesnewiya Mem û Zîn a Ahmedê Xanî û ciyê wê di edebiyata klasîk de) meqaleyek di kovara **Türk Dünyası Araştırmaları** de daye weşandin.

⁷⁴ Hassanpour-Aghdam, Amir; *The Language Factor in National Development: The Standardization of the kurdisch language 1918-1985, Doctoral dissertation (Urbana, Illinois: University of Illinois, 1989). Neqil ji Chyet, Michael L.; -And a thornbush sprang up between them": Studies on "Mem û Zîn", a kurdisch romance. UMI Dissertation Service, 1991 cild 1, r. 33.*

⁷⁵ Hesepûr, Dr. Emîr; "Gelî kurd û destelatî sîyasî le Mem û Zînî Xanî da", *Gzîng govarêkî werzaneyî ferhengî-edebî ye, hejmar 12, havîna 1996-ê, r. 15-20.*

Açıkgöz wekî nîjadperestekî tirk di vir de fikra Ahmedê Xanî ya kurdeweriyê bi tevayî veşartiyê û ew wekî şairekî îslamî yê şerqî daye nasîn.

Ew ji wê teza tarîxî ye ku dibêje ‘kurd jî bi eslê xwe tirk in’ hareket dike û Ahmedê Xanî wekî şairekî tirk qebûl dike, pirtir jî ji alî edebî û hunermendî ji alî forma mesnewiyan li ser Mem û Zînê radiweste⁷⁶.

Mehemed Emînê Osman, li Kurdistana Iraqê, Mem û Zîn bi şîrovekirin û vekolînekê û bi daneberheva çend nusxeyên çapkirî û destnivîs amadekiriye û ev berhem li Bexdayê di çapxaneyê Cah’iz de hatiye çapkirin. Li ser kitêbê ne diyar e ku kitêb kengî hatiye çapkirin, lê Mehemed Emînê Osmanî bi xwe tarîxa 18-ê meha 1-ê ya 1990-ê li bin pêşgotina xwe daniye û berî çapê muwafeqa Wezaretê Seqafê û îlamê di 14-ê meha 2-ê a 1990-ê de jê re derketiye. Mehemed Emîn du lêkolîn xistine pêşiya vê çapa Mem û Zînê. Di ya pêşiyê de ew **Mem û Zîna** Ahmedê Xanî û **Memê Alan** a folklorî dide ber hevdu, wekhevî û cudayiyên wan destnîşan dike, piştî jî navê wan çavkanî û berheman dide ku heta niha varyantên **Memê Alanî** çapkirne, an li ser wan lêkolîn kirine.

Di lêkolîna duduyan de, Mehemed Emînê Osman li ser jiyana Ahmedê Xanî, li ser naveroka Mem û Zînê radiweste, behsa wê yekê dike ku wî ev xebat çawa amade kiriye.

⁷⁶ Açıkgöz, Yard. Doç. Dr. Namık, "Ahmed'i Hani'nin Mem u Zin adlı Mesnevisi ve Klasik Edebiyattaki Yeri", *Türk Dünyası Araştırmaları*, No 67, Ağustos 1990 r. 127-138

Her wiha wan çapên berê yên **Mem û Zînê** jî destnîşan dike. Xebateka hêja ye. Tiştêkî din ê balkêş di xebata wî de ew e ku di **Mem û Zîna** wî de du beyt hene ku ev di tu çapên din de yên heta niha ketine ber dest nînin. Em ê di behsa taybetî de ya li ser Mem û Zînê (her di wê kitêba min ya binavkirî de Mûrad Ciwan) van her du beytan pêşkêş bikin û firehtir li ser rawestin.

Sidîq Borekeyî (Safîzade), di wê kitêba xwe de ya bi navê **Mêjûyî Wêjeyî Kurdî** ku ji du cildan pêk hatiye, cîh daye Ahmedê Xanî jî. Lê bi xemgînî divê em li vir diyar bikin ku bi awakî ciddî hê em li ser beşên din ê kitêbê ranewestiyane, loma jî em nizanin çawa ye, lê beşê li ser Ahmedê Xanî ji zanistî, rastî û ilmiyetê dûr e. Wî agahiyên xwe yên li ser Ahmedê Xanî pirtir ji Alaeddîn Secadî wergirtine, lê gelek caran bêyî ku navê wî bide. Di ser re jî hin agahiyên çewt atfî Alaeddîn Secadî û M. Emîn Bozarlanî kirine ku wan welê nenivîsiye. Tiştên ku wan rast nivîsîne jî bêyî ku navê wan bide wekî zanîna xwe pêşkêş kirine⁷⁷.

Sidîq Borekeyî(Safîzade), her wiha dinivîse ku di **Daîre'l Mearif el-Îslamiyye** de ya ku te-‘îfa Muhemmed Ferîdûcdî(?) (Qahîre 1918) ye behsa jiyana Ahmedê Xanî tê kirin lê tarîxa jidayikbûna wî şaş hatiye dayîn. Ew her wiha dinivîse ku di kitêba **Çend Şairek di Herêma Behdînan de** ku ji alî Dr.

⁷⁷ Borekeyî (Safîzade), Sidîq; *Mêjûyî wêjeyî kurdî, du cild, Întîşaratê Nacî, Bane, 1370, cild 2, r.410-417.*

Nafî Akreyî hatiye amadekirin, behsa Ahmedê Xanî heye.⁷⁸

Baba Merdûx Rûhanî, di kitêba xwe de ku bi farisî nivîsiye û navê wê **Tarîxê Meşahîrê Kord** (Tarîxa Navdarên kurd) e di cildê ewwel de behsa jiyan, berhem û baweriyên Ahmedê Xanî dike. Ev agadarî jî diyar e ku ji Alaeddîn Seccadî hatine⁷⁹.

Zeynelabîdîn Zinar, cara pêşîn **Nûbara** Ahmedê Xanî wergerand ser tîpên latînî û bi pêşgotinekê li ser kurtejiyana Ahmedê Xanî û li ser çapên **Nûbarê** sala 1986-ê di nava weşanên Roja Nû de li Stockholmê da weşandin. Li vir, ew, her wiha behsa wê yekê dike ku **Nûbar** sala 1903-yê li Stenbolê çap bûye û nusxeyeka din jî ku bi destê Mele Mihemedê Wanî hatiye nivîsîn li her eynî salê li Berlînê çap bûye. Zeynelabîdîn Zinar destnîşan dike ku wî ev herdu nusxeyên çapkirî dane ber hev û çapa latînî jî ber wan amade kiriye⁸⁰.

Zeynelabîdîn Zinar, **Eqîdeya Îmanê** (ku menzûm e) û **Eqîdeya Îslamê** (ku nesir e) ya Ahmedê Xanî bi tîpên latînî cara pêşîn di **Kovara Nûbiharê** de di hejmara 13-ê ya çiriya Pêşîn a 1993-ê de weşand.

⁷⁸ Borekeyî(Saftzade), Sidîq; Mêjûyî wêjeyî kurdî, du cild,Întîşaratê Nacî, Bane, 1370, cild 2, r

⁷⁹ Rûhanî, Baba Merdûxê; Tarîxê Meşahîrê Kord,-Urefa, -Ulema, Udeba, Şu-era, (kitêb sê cild e)Cildê ewwel, çapxana Siruş, 1364 Tehran, r. 212-214.

⁸⁰ Kaya, Zeynelabîdîn; "Pêşgotin", Nûbar, Ahmedê Xanî, Weşanên Roja Nû, Stockholm, 1986("Kaya" gotineka bi tirkî ye û bi mana "Zinar" tê, ku Zeynelabîdîn Zinar herdu jî wekî paşnav ji bo xwe bikar anîne.M.C)

Ev her du berhem jî di 1887-ê de bi destxeta Mele Mihemedê Wanî hatibûn nivîsîn û A. von Le Coqî ew di sala 1903-ê de bi navê **Kurdische Texte** de li Berlînê dabû çapkirin.

Eqîdeya Îslamê careka din ji bal Zinarî ve di îlona 1995-ê de di hejmar 3-yê a **Çirayê** de bi tîpên latînî hatiye weşandin ku wî pêşnivîsek jî jê re nivîsiye.⁸¹ Her di vê nivîsa xwe de Zeynelabidîn Zinar, behsa çapa Îstenbolê ya **Eqîda Îmanê** dike, lê behsa tarîxa vê çapê nake. Her wiha, behsa wê yekê dike ku Mele Ehmedê Qoxî şerheke kurmancî ji vê berhemê re nivîsiye û bi navê **Rêberê Sanî, Şerha Eqîdeya Ehmedê Xanî** di 1984-ê de daye çapkirin. Ev çap li Tirkîyeyê bûye. Hem berhem, hem jî şerha wê bi herfên erebî ne. Zeynelabidîn Zinar ev berhem tevî şerha wê kiriye latînî û bi vî awayî di sala 1990-ê de li Almanayê ji alî weşanxaneyê Dengê Yekîtiyê hatiye weşandin⁸². Min ev kitêb dîtiye. Li ser bi erebî wiha dibêje: *Kîtabu Rehberê Sanî*, telîf: Ehmed Hilmî Qoxî el Diyarbekirî, îla Şî-rî -Eqîde. Bi kurmancî jî li ser qapaxê wiha hatiye nivîsîn: **Şerha -Eqîda Şêx Ehmed bin Îlyas el Xanî**.

⁸¹ Zinar, Zeynelabidîn; "Eqîdeya Îslamê ya Ehmedê Xanî-, çira kovara kulturî, -kovara komeleya nivîskarên kurd li Swêdê, hejmar 3, îlon 1995, Stockholm r. 18-21

⁸² Zinar, Zeynelabidîn; "Eqîdeya Îslamê ya Ehmedê Xanî-, çira -kovara kulturî, -kovara komeleya nivîskarên kurd li Swêdê, hejmar 3, îlon 1995, Stockholm r. 19.

Şerha ku ji **Eqîda Îmanê** re hatiye kirin şerheke fireh e û dînî, felsefî û tesewufî ye⁸³.

Zeynelabîdîn Zinar, **Eqîdeya Îmanê** ya Ahmedê Xanî careka din di kitêba xwe de ya bi navê **Xwendina Medresê** daye weşan din⁸⁴.

Zeynelabîdîn Zinar, kitêba xwe ya bi navê **Nimûne ji Gencîneya Çanda Qedexkirî** di sala 1991-ê de li Stockholmê weşand ku li ser hin şair û nivîskarên kurd e. Bi taybetî giraniya xwe daye ser jiyana û şîrên şairên kurmanc, zêdetir jî yên dema berî sedsala me. Di vê berhemê de beşê li ser Ahmedê Xanî jî heye, ku kurtebahsek e li ser jiyana wî û heşt şîrên wî pê re ne ku ya bi çar zimanan ne tê de, hemî cara pêşîn ji destnivîsariyê xelas dibin û tîn çapkirin. Zeynelabîdîn Zinar, li cihê ku pêwîst dîtiye, jêrenotên şerhkirinê jî ji wan re nivîsîne.

Ferhad Şakelî, sala 1991-ê, di kovara **Mamostay Kurd** de cih da çar şîrên Ahmedê Xanî. Ferhad Şakelî di wê pêşnivîsarê de ku wî ji bo wan şîfran amade kiriye, dinivîse ku ew ji nav wan tekstan hatine berhevkirin ku di wextê xwe de ji bal Aleksandre Jabayî ve hatine berhevkirin û niha li Lenîngradê di Kutubxana Lenîngradê (Petersbourga niha) ya dewletê de ne, li ser navê M. Y. Saltikova-Şerdirîn hatine parastin.

83 *Kîtabu Rehberê Sanî, telîf: Ehmed Hilmî Qoxî el Diyarbekirî, îla Şî-rî -Eqîde, Şerha -Eqîda Şêx Ehmed bin Îlyas el Xanî, Şubat 17, 1984.*

84 *Zinar, Zeynelabîdîn; Xwendina Medresê, Pencînar, Stockholm, 1993 r.79-86.*

Ew dibêje di nava wan destnivîsan de bi tevayî 25 şîrên Ahmedê Xanî hene û kopyeyên hemûyan li ber destê wî ne⁸⁵. Lê heta niha Ferhad Şakelî ew neweşandine. Ev çar şîrên ku di **Mamostay Kurd** de hatin weşandin pişt re ji alî Şefîk Kaya ve hatin wergerandin ser tîpên latînî û di hejmara 4 (162)-yê a Armancê de hatin weşandin⁸⁶ Me di beşê şîrên Ahmedê Xanî de di vê xebatê de (Qesd jî kitêba min a binavkirî ye - Mûrad Ciwan) cih daye van her çar şîran.

Her di vê hejmara **Mamostay Kurd** de lêkolîneka Tewfîq Wehbî hatiye çapkirin ku ji kovara **Dengê Gîtî Taze**, hejmar 2 a sala 1943-ê hatiye wergirtin ku li Bexdayê derdiket. Navê meqalê "Yek dû Wêne le Şîr û Felsefeyî Berzî Ehmedî Xanî" ye⁸⁷.

Di hejmara duduyan a kovara **Gzîngê** de hevpeyvînek li gel Dr. Ebbas Welî hatiye kirin ku tê de fikrên Ahmedê Xanî yên li ser kurdeweriyê jî tîn munaqesekirin. Di vir de Dr. Abbas Welî wê fikrê diparêze ku goya meriv nikare Ahmedê Xanî wekî

⁸⁵ Şakelî, Ferhad; "Ahmedê Xanî: çwar Şîr", Mamostay kurd, jimare 11-12, r. 6 Stockholm-Swêd, 1991.

⁸⁶ Kaya, Şefîk; "Çend Şîrên Ehmedê Xanî", Armanc, hejmar4(162), çiriya Pêşîn 1995, r. 5

⁸⁷ Wehbî, Tewfîq; "Yek dû Wêne le Şîr û Felsefeyî Berzî Ehmedî Xanî", kovara Dengê Gîtî Taze, jimare: 2, Bexda, sala 1943-yê, r. 28, neqil ji Mamostay kurd, jimare 11-12, r. 4, Stockholm-Swêd, 1991.

neteweperwerekî kurd, lê wek nîştimanperwerekî hesab bike⁸⁸.

Mahmûd Lewendî, sala 1992-yê di kovara **Dîdar** de bi navê "Ehmedê Xanî" meqaleyek li ser jiyana û berhemên Ahmedê Xanî nivîsiye⁸⁹.

Meqaleyeka N. Hêcibî a bi navê "Di Mem û Zîna Ehmedê Xanî de Astronomî", di hejmara 8-ê a 1993-yê a kovara **Nûdemê** de hatiye weşandin⁹⁰.

Di hejmara 2-3 ya kovara Aso de ku sala 1993-yê ji bal hin ronakbîrên Kurdistanê Sûriyeyê hatiye derxistin, Hejarê Darî, gotarek bi navê "Niştimanperweriya Xanî" li ser jiyana û berhemên Xanî nivîsiye⁹¹. Her di eynî hejmara vê kovarê de, şîreka Ahmedê Xanî jî bi sernavê "Çardehê Nîsan" hatiye weşandin⁹². Ev şîr pişt re di hin cihên din de jî hatiye belavkirin. Me bi ravekirin ew di beşê şîrên Xanî de di vê xebatê (Kitêba min ya binavkirî – Mûrad Ciwan) de weşandiye.

⁸⁸ Welî, Dr. Abbas; *Hevpeyvîn, Gizîng hejmar 2, Hudiksvall, Swed, r.7-12.*

⁸⁹ L[ewendî], M[ahmûd]; "Ehmedê Xanî", *Dîdar, Kovara Yekîtiya Ciwanên kurd li Swêd, hejmar 3, September 1992, Stockholm.*

⁹⁰ Hêcibî, N.; "Di mem û Zîna Ehmedê Xanî de Astronomî", *Nûdem, hejmara 8-ê, 1993, J"rf"lla/Sweden.*

⁹¹ Darî, Hejarê; "Niştimanperweriya Xanî", *Aso, hejmar 2-3, Beyrût, 1993, r.2.*

⁹² Darî, Hejarê; "Niştimanperweriya Xanî", *Aso, hejmar 2-3, Beyrût, 1993, r.96.*

Li ser 18 varyantên **Mem û Zîna** folklorî yan jî bi awayekî din **Memê Alan**, sala 1991-ê, li Berkeleyê, li Unîversîta Kalîforniyayê nameyeka doktoraya felsefê ya Michael L. Chyet amade bû bi navê "And a thornbush sprang up between them": Studies on "Mem û Zîn", a kurdish romance. Name pişt re ji alî UMI Dissertation Service ve her di eynî salê de dektîlokirî wekî du cildan hatiye amadekirin, yanî xebat wekî kitêb hîn nehateye çapkirin. Ev doktorename, xebata herî zanistî, ciddî, berfireh û piralî ye ku tê de hîjde varyantên vê destanê li berhev hatine danîn, ji gellek aliyên ve lêkolîn û tehlîl li ser wan hatine kirin. Di vê navberê de têkiliya wan bi Mem û Zîna Ahmedê Xanî re hatiye pêşkêşkirin û rola wê di nava wan de li gorî zanîna û qenaeta lêkolera hatiye diyarkirin⁹³.

Heyder Umer, li Sûriyeyê sala 1991-ê li ser jiyan, bîr û bawerî û berhemên Ahmedê Xanî bi erebî kitêbek daye çapkirin ku navê wê **Ahmedê Xanî Fî'l-Melheme'l-Şî'rîye Mem û Zîn** e⁹⁴.

Vazgal Bazîdî, di kovara **Roja Nû** de ya ku li Stockholmê tê weşandin di du hejmaran de li ser hev hin şîrên Ahmedê Xanî dane weşandin ku ji destnivîsarên Mele Îbrahîmê Zivingî hatine wergirtin.

⁹³ Chyet, Michael L.; *And a thornbush sprang up between them": Studies on "Mem û Zîn", a kurdish romance. UMI Dissertation Service, 1991 du cild.*

⁹⁴ Umer, Heyder; *Ahmedê Xanî Fî'l-Melheme'l-Şî'rîye Mem û Zîn, Cî û tarîxa çapê ne diyar e, lê li binê pêşgotina nivîsê Heleb fî 25 6 1991 heye.*

Vazgal Bazîdî, di pêşnivîsa xwe de, diyar dike ku Mele Îbrahîmê Zivingî birayê Mela Ehmedê Zivingi ye yê ku Dîwana Melayê Cizîrî bi erebî şerh kiriye. (Ev eser vê paşiyê wekî du cildan li Şamê hat çapkirin. - Mûrad Ciwan) Vazgal Bazîdî, destnivîs li Sûriyê ji cem hin kesan peyde kirine, anîne, dane M. Emîn Bozarlanî, wî jî gellek jêrenotên şerhkrinê ji wan re nivîsîne û ev, bi wan jêrenotan di du hejmarên kovarê de hatine weşandin. Tev de neh şîr in, hin ji wan berê hatine çapkirin, lê hin jî cara pêşîn ji destnivîsariyê xelas dibin û di rûpelên vê kovarê de çap dibin⁹⁵.

Her wiha di hejmareka din a vê kovarê de 6 şîrên Ahmedê Xanî derketin ku ev ji alî Zera Êsiv ve ji Vazgal Bazîdî re hatine şandin da di kovarê de bi tîpên latînî bîn weşandin. Esas wekî ku Zera Êsiv destnîşan dike, ew, cara pêşîn ji alî Dr. M. B. Rudenkoyê ji nav tekstên destnivîs ên A. Jabayî hatine derxistin. Wê, sala 1961-ê di kovara **Narodî Asîî î Afrîkî** nr; 3-yê de bi herfên erebî dane çapkirin⁹⁶. Li gorî ku Z. Êsiv dinivîse ev 7 şîr bûne, lê di Roja Nû de şeş ji wan derketine. Heta ji wan şeşan jî hin ne ew in ku Rudenkoyê dane çapkirin.

⁹⁵ Bazîdî, Vazgal; "çend Qesîdeyên Ehmedê xanî di destnivîsarên Mele Îbrahîmê zivingî da", Roja Nû -kovara hunerî çandî û edebî, Stockholm 1995, hejmar 42 û 43.

⁹⁶ M. B. Rudenko; "Heizvectnike ctixi Axmede Xani(Şîrên Nenaskirî yên Ahmedê Xanî). Narodî Azîî î Afrîkî 1961, No:3 ya neqil dike Êsiv, Zera; Helbestên Xanî, Roja Nû-kovara hunerî çandî û edebî, Stockholm 1995, hejmar 44-45(her du hejmar bi hev re derketine M.C).

Çimkî gava ev şîr ketine destê Vazgal Bazîdî, wî jî verêkirine ji M. Emîn Bozarlanî re ku şerha wan bike. Wî ev şerh kirine, lê ji ber ku hin ji wan berê di eserên Bozarlanî û hin derên din de derketine, wî pêwîst nediye ku tekstên waryanta bi amadekariya Rudenkoyê bîn çapkirinê û têkevin ber destê xwendevan, ji dêlva wan ji Bazîdî re nivîsîye ku ew dikarin yê di eserên din de careka din çap bikin. Wî jî bi ya Bozarlanî kiriye û mixabin ku ji wan şîrên ku Zera Ûsiv şandine, hin çap nebûne. Ev şîrên ku bi lêkolîna Rudenkoyê di wê kovara Rûsî de hatibûn çapkirin di 1995-ê de di hejmara 9-ê a kovara **Gzîngê** de derketin⁹⁷. Min ew û yê Bozarlanî dan berhev, min dîtî ku ferq di navbera wan de hene û heta yek ji wan li ba Bozarlan qitayeke wê kême, li ba Rudenkoyê temamtir e. Baştir ji min re diyar bû ku bi vê tewra nezanistî, çawa em xebatên însanên alim texrîb dikin û carna jî, ji karê pirtir em zera digihînin tarîx û kultura xwe.

Di beşa şîrên Ahmedê Xanî ya di vê xebatê de (Kitêba min a inavkirî – Mûrad Ciwan), me ew dane ber hev, kêmasî temam kirine, ferqiyeta navbera wan diyar kirine û pişt re dane weşandin.

Ew hejmara kovara **Gzîngê** ya ku li jorê hat binavkirin dikare hejmareke taybetî ya li ser Ahmedê Xanî bê hesabê ku gellek maqale tê de hene ku lêkolînên di heqê Ahmedê Xanî, berhemên wî û bîrûbaweriyên wî de ne.

⁹⁷ Rudenko, M. B.; "Şîrezenanrawekanî Ahmedî Xanî", *Gzîng*, no: 9, october, 1995, Hudiksvall, Sweden. Yê ku ev lêkolîna kiriye Soranî û hin jêrenot jê re nivîsîne Qareman çalak e. r.36

Dr. Emîr Hesepûr ku li Kanadayê, li Montrealê li Zanistgeya Konkordiyayê kar dike, maqaleyeka rexneyî li ser kitêba Ferhad Şakelî nivîsîye ku navê wê kitêbê **Kurdish Nationalism in Mam û Zin of Ahmad-i Khani** ye. Me ev kitêb berê binav kiribû. Di vê meqalê de Dr. Emîr Hesepûr bi awayekî zanistî hin agadarî û bîrûbaweriyên Ferhad Şakelî yên li ser dîroka gel û ya edebiyata kurdî, yên li ser lêkolînên Ahmedê Xanî û bîrûbaweriyên wî rexne dike⁹⁸.

Kovarê her wiha cih daye soraniya meqala Joyce Blau a ku wê di konferansa Stockholmê de pêşkêşî beşdaran kiribû. Meqale li ser jiyana û berhemên Ahmedê Xanî ye ku di vê xebatê de em li gelek ciyan tînin ser vê meqalê. Yê ku ji Îngilîzî kiriye soranî Hêriş e⁹⁹.

Meqaleyeka Kemal Mîrawdêlî jî di vê kovarê de çapbûye ku navê wê "Axawtinêk li gel -Xanî- da" ye¹⁰⁰ Meqaleyeka din a ku derketiye "Dêmenî Jin le -Mem û Zîn-î -Xanî- da" ye û ji bal Teyfur ve hatiye amadekirin¹⁰¹.

⁹⁸ Hesepûr, Dr. Emîr; "Pêdaçûneweyî kitêbî Ferhad Şakelî. Nasyonalîsmî kurdî le -Mem û Zîn-î Ehmedî Xanî da, Bruksêl, Enstîtûyî kurdîyî Bruksêl 1991, 146 lapere", Gzîng, no: 9, october, 1995, Hudiksvall, Sweden, r. 3-11.

⁹⁹ Blau, Joyce; "Ehmedî Xanî: Jiyana û Berhem", wergêranewe le Îngilîziyewe Hêriş, Pêdaçûnewe: Haşim, Gzîng, no: 9, october, 1995, Hudiksvall, Sweden, r. 12-16.

¹⁰⁰ Mîrawdêlî, Dr. Kemal; "Axawtinêk le gel -Xanî- da", Gzîng, no: 9, october, 1995, Hudiksvall, Sweden, r. 17-22.

¹⁰¹ Teyfur, "Dêmenî Jin le -Mem û Zîn-î -Xanî- da", Gzîng, no: 9, october, 1995, Hudiksvall, Sweden, r. 23-27.

Her wiha, Şakirê Xudoyê Miho¹⁰², Kerîmî Husamî¹⁰³, Rehmanî Sofî¹⁰⁴ û Hêdî¹⁰⁵ jî kurtenivîsarek di vê hejmara Gzingê de weşandine. Kovarê beşeka kurt ji lêkolîna Alaeddîn Seccadî¹⁰⁶ weşandiye ku li ser jiyana Ahmedê Xanî ye. Û her wiha wê meqala Rudenkoyê jî tê de cih girtiye ku me li jorê behs kir.

Nivîsara Hêdî li ser danasandina broşurekê ye ku li ser jiyana, bîr û bawerî û berhemên Ahmedê Xanî ye û bi farisî hatiye nivîsîn. Hêdî wiha dinivîse "Birêz kak Ezîzî Îbrahîmî, di broşureka 24 rûpelan de ku navê wê Mierifî Şexsiyetê Ehmedê Xanî -Şairê Mihenperestê Kord(Nasandinî Kesayetîy Ahmedî Xanî -Şairî Nîştîmanperwerî kurd) e. Ew Xanî û berhemên wî bi farisîzimanan dinasîne"¹⁰⁷.

102 Miho, Şakirê; "Xanî Behreke bêbinî", *Gzing*, no: 9, october, 1995, Hudiksvall, Sweden, r. 28.

103 Husamî, Kerîmî, "Boçûnêkî Serpêyî", *Gzing*, no: 9, october, 1995, Hudiksvall, Sweden, r. 29.

104 Sofî, Rehmanî; "Ehmedê Xanî Kê bûwe û çî kirdûwe?", *Gzing*, no:9, october, 1995, Hudiksvall, Sweden, r.30.

105 Hêdî; "Nasandinî Namilkeyek le ser Xanî", *Gzing*, no: 9, october, 1995, Hudiksvall, Sweden, r. 31.

106 Alaeddîn, Seccadî; "Ehmedî Xanî (1650-1706)", *Gzing*, no: 9, october, 1995, Hudiksvall, Sweden, r. 31.

107 Hêdî; "Nasandinî Namilkeyek le ser Xanî", *Gzing*, no: 9, october, 1995, Hudiksvall, Sweden, r. 31.

Di konferansa Ahmedê Xanî de ya ku di 27-ê gulana 1995-ê ji alî Komeleya Nivîskarên Kurd, Federasyona kurdan û ABF-a swêdiyan hat amadekirin, Martin van Bruinessen gotarek bi navê "Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Rola wî ya di neteweperweriya kurdî de" pêşkêş kir ku ev gotar pişt re di hejmara çaran a Çirayê de hat weşandin¹⁰⁸.

Sala 1985-ê, kovara **Svensk-kurdisk Journal** bi Bruinessen re roportajek kiribû ku di wir de jî hin tehlîlên wî li ser Ahmedê Xanî hatine diyarkirin¹⁰⁹. Bruinessen her wiha di kitêba xwe de ya bi navê **Agha, Sheikh and State - on the social and political organization of Kurdistan** de cîh daye rola Ahmedê Xanî ya di civak û dîroka kurdan de¹¹⁰.

Lêkolîneka Rohat Alakom, di heft hejmarên **Özgür Politikayê** yên navbera 11-17ê Îlona 1995-ê de bi zimanê tirkî hat weşandin. Navê vê lêkolînê "Kürt Ulusal Manifestosu 300 Yaşında" ye. Ev meqale bi zimanê tirkî ye. Yek ji wan lêkolînên berbiçav û piralî

¹⁰⁸ Bruinessen, Martin van; "Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Rola wî ya di neteweperweriya kurdî de", çira kovara kulturî -kovara komeleya nivîskarên kurd li Swêdê, hejmar 4 Stockholm, kanûna pêşîn 1995, r.3.

¹⁰⁹ Bruinessen, Martin van; "Martin van Bruinessen Holl"ndsk kurdolog och socialantropolog", *Svensk-kurdisk Journal*, Nr. 4/1985, ÅrgÅng 1, Sverige.

¹¹⁰ Bruinessen, Martin van; *Ağa, Şeyh ve Devlet, Kurdistan-in sosyal ve politik –rg, tlenmesi, Özge yayûnlarû, Ankara, wergera tirkî ji kitêba Îngilîzî ya ku navê wê li jorê derbas bû. Wergêr: Remziye Arslan, r.331 û 449.*

yên li ser Ahmedê Xanî ye ku bi munasebeta 300 saliya **Mem û Zînê** li hundur û derveyî welêt hatin kirin. Ew di vê lêkolîna xwe de, li ser jiyan, xebat û berhemên Ahmedê Xanî bi kurtebirî dinivîse, wan xebatên ku heta niha li ser Ahmedê Xanî û eserên wî hatine kirin destnîşan dike, cardin bi kurtî têkiliyên navbera Mem û Zînê û varyanta gelêrî rê dide, bi vê munasebetê behsa xebatên li ser varyantên gelêrî jî dike. Ew li ser giringiya Mem û Zînê û tesîra wê di nava alim, zana û xelkê kurd de radiweste, bibîr dixê ku di 300 saliya bibîranîna Mem û Zînê de barê ser piştta kurdan e ku deynê xwe ji Ahmedê Xanî re îfa bikin û bi awayekî zanistî, fireh û navnetewî konferansan bicivînin, lêkolînên akademîk hazir bikin û gellek aliyên Ahmedê Xanî zelal bikin ku heta îro di tarîtiyê de mane¹¹¹.

Dilbixwîn Dara, lêkolînek li ser jiyan, berhem, bîr û bawerî, zanîn û xebatên Ahmedê Xanî, çiyê wî di civak û tevgera kurdî de amade kiriye. Bi giranî jî li ser Mem û Zînê rawestiyaye. Ev xebat, ji alî Înstîtuya Kurdî ji bo lêkolîn û zanîna di tebaxa 1995-ê de bi navê **Felsefeya Ehmedê Xanî** weka pirtûkekê hatiye çapkirin¹¹².

¹¹¹ Alakom, Rohat; "K,rt Ulsal Manifestosu 300 Yaşında", *Özg,r Politika, rojnameya rojane ku li Almanyayê derdikeve, hejmarên navbera 11-17-ê Îlona 1995-ê*.

¹¹² Dara, Dilbixwîn: *Felsefeya Ahmedê Xanî, Înstîtuya kurdî-Berlin, Tebax 1995*

Li Tirkîyê, Faik Bulut, di hezîrana 1995-ê de bi navê **Ehmedê Xanê'nin Kaleminden Kürtlerin Bilinmeyen Dünyası** kitêbek da weşandin ku tê de li ser dewra Ahmedê Xanî, şairî mutefekirî, filozofî û mutesewwufîya wî, jiyana wî, baweriyên wî yên civakî siyasî, baweriyên wî yên li ser jinan û evîne radiweste¹¹³.

Di kitêba Ismet Alpaslan de ya bi navê **Her Yönüyle Ağrı** (Bi hemû aliyên xwe ve Agirî) ku di 1995-ê de li Tirkîyeyê hatiye weşandin, beşekî kurt li ser jiyana û berhemên Ahmedê Xanî hatiye nivîsîn. Di vir de Ismet Alpaslan Ahmedê Xanî ji malbata Arwasiyan nîşan dide¹¹⁴. (Li ser vê yekê agahiyên zêdetir di beşê "Jiyana Ahmedê Xanî" de (kitêba min a binavkirî de – Mûrad Ciwan) hene.)

Eskerê Boyik, di hejmara bi tarîxa 17-23-yê Eylula 1995-ê ya rojnameya hefteyî ya **Azadî** de ku li Istenbolê tê weşandin û ya dewama wê de maqaleyek bi navê "Rohilatzanayê Urisetê û Ahmedê Xanî" nivîsiye. Ew, tê de behsa xebatên A. Jaba, Qanatê Kurdo, I. Orbeli û M. B. Rudenkoyê dike ku li ser Ahmedê Xanî û berhemên wî hatine kirin. Pişt re cîh dide lêkolîneka M. B. Rudenkoyê ku "çend salan berê" ji bo rojnama **Riya Teze** nivîsîbû û bi munasebeta 300

¹¹³ Bulut, Faik; *Ehmedê Xanê'nin Kaleminden Kürtlerin Bilinmeyen Dünyası, tümzamanlar yayıncılık, Hezîran 1995 İstanbul.*

¹¹⁴ Alpaslan, Ismet: *Her Yönüyle Ağrı, Ankara, 1995, r. 186-187.*

saliya ronahîdîtina **Mem û Zîna** Ahmedê Xanî careke din ev lêkolîn di **Riya Teze** de hatibû çapkirinê. Eskerê Boyik ev lêkolîn ji tîpên krîlî wergerandiye ser tîpên latînî û ew di rojnamê de hatiye weşandin. Navê meqalê "Çend gilî derheqa Ahmedê Xanî da" ye¹¹⁵. Eskerê Boyik, di meqala xwe de, gava behsa Orbêlî dike, cîh dide wê tesbîta wî ya meşhûr a li ser Ahmedê Xanî ku di wê pêşgotina wê kitêba xwe de ya bi navê **Heykelên Zemanê Şairê Gurcan Rustaveli** dinivîse: "Wextê em dibêjin şair di nivîsara xwe da nêzîkî millet e, bi millet û xelqê ra girêdayî ye, hingê em bêhemdî xwe, lazim e navê sê şairên mezin ên rohilatê wek hev bikin û beramber bikin. Ew her sê şair ev in: Yek Fîrdewsiyê îranî ye; yek Rustavelliyê gurg e; yek jî Ahmedê Xanî yê kurd e."¹¹⁶

Felat Dilgeş, meqaleyek lêkolînî amade kiriye û ew bi navê "**Ehmedê Xanî û Ramana Dewletî**" di hejmar 15-ê a Nûdemê de hatiye weşandin. Ew, di vê lêkolînê de bîr û baweriyên Xanî û yên Platonî (bi taybetî di warê hukumdariyê de) dide berhev¹¹⁷. Pêşîn(oktober) a 1995-ê kir hejmareke taybetî ya li ser Ahmedê Xanî. Di vê hejmarê de nivîsarên Mahmûd Pakdemîr¹¹⁸,

¹¹⁵ Boyik, Eskerê; "Rohilatzanayê Urisetê û Ahmedê Xanî", *Azadî*, 17-23 Eyl, 1995, Istanbul

¹¹⁶ Boyik, Eskerê; "Rohilatzanayê Urisetê û Ahmedê Xanî", *Azadî*, 17-23 Eyl, 1995, Istanbul

¹¹⁷ Dilgeş, Felat; "Ehmedê Xanî û Ramana Dewletî", *Nûdem - kovara hunerî, edebî û çandî*, no: 15 1995, Stockholm, r.33.

¹¹⁸ Pakdemir, Mahmud; "Berhemên Ehmedê Xanî", *Armanç*, hejmar4(162), çiriya Pêşîn 1995, r. 2.

Rojnama Armancê hejmara xwe ya 4(162)-ê a Çiriya Emîn Narozi¹¹⁹, Joyce Blau¹²⁰, Nîhad Elî ¹²¹ û Mûrad Ciwan¹²², gotûbêjek bi M. Emîn Bozarlan¹²³ re û axaftineka Prof. Dr. Îzzeddîn Mustefa Resûl¹²⁴ cîh digre.

119 Narozi, Emîn; "Ehmedê Xanî û Mem û Zîn di berhemên biyanî de", *Armanc, hejmar4(162), çiriya Pêşîn 1995, r. 3-4.*

120 Blau, Prof. Joyce; "Jiyan û Berhemên Ehmedê Xanî" yê ku ji Frensizî wergerandiye kurdî: *Malmîsanij. Esas ev nivîsar, gotara Blau e ku roja 27-ê gulana 1995-ê li Stockholmê di "Konferansa Ehmedê Xanî" de hatibû pêşkêşkirin. Îngilîziya wê wekî me berê jî bahs kir hate wergerandin di kovara Gzîngê de derket, Frensiziya wê jî hat wergerandin ser kurmancî, pêşiyê di hejmara 3-yê a çirayê de, pişt re jî di Armancê de hat weşandin.*

121 Elî, Nîhad; "300 serreya nuştûşê Mem û Zîn û hewnê Ehmedê Xanî", *Armanc, hejmar 4(162), çiriya Pêşîn 1995, r. 27* Ev maqaleyeke Zazakî ye ku bi munasebeta sê sed saliya ronahîdîtina Mem û Zînê hatiye nivîsîn.

122 Ciwan, Mûrad; "Bîr û baweriyên Ahmedê Xanî yên felsefî û tesewwufî", *Armanc, hejmar 4(162), çiriya Pêşîn 1995, r. 14, û "Mem û Zîn kengî jiyane?" her eynê hekmar r. 26.*

123 Bozarlan, M. Emîn, "Mem û Zîn xezîneyek e", *Armanc, hejmar4(162), çiriya Pêşîn 1995, r. 6.* Ev gotûbêjek e ku ji Armancê Emîn Narozi, Hesên Mizgîn û Remzî Kerîm bi munasebeta sê sed saliya Mem û Zînê bi Bozarlan re kirine.

124 Resûl, Prof. Îzzeddîn Mustefa, "Dewra Xanî dewra zêrîn e", *Armanc, hejmar4(162), çiriya Pêşîn 1995, r. 21.* Ev nivîs gotarek e ku di 8-ê oktobra 1995-ê de di semînera Stockholmê de hatibû pêşkêşkirin. Ev semîner ji alî Komeleya Nivîskarên kurd li Swêdê hatibû lidarxistin.

Emîn Narozi, di nivîsara xwe de li ser xebatên van kesan rawestiyaye û bi kurtî behsa wan kiriye: xebata Gisbert Jacke ya ku wekî pêşgotin ji kitêba drama ya bi navê Mem och Zin¹²⁵ re nivîsiye, ya Bazil Nikitin ku dinivîse ‘Ahmedê Xanî Fîrdewsiyê kurdan e’, ya

Martin van Bruinessen ku di kitêba xwe ya bi navê **Agha, Sheikh and State - on the social and political organization of Kurdistan** de destnîşan kiriye û ya V. Minorsky ku di **Ansîklopediya Îslamê** de li ser beşa kurd û Kurdistanê de nivîsiye.

Prof. Joyce Blau di kitêba xe de ya bi navê **Mémoire du Kurdistan** cihek daye Ahmedê Xanî jî¹²⁶. Meqaleyeka Mehemed Alî Qeredaxî ya bi nave "Xîştîyekem le saxtimanî binaxeyî /Dîwanî Xanî/ da be bûneyî sêsed saleyî Xanîyewe" di hejmara 80-yê a kovara **Rengîn** de hate weşandin ku li ser hin şîrên destnivîs ên Ahmedê Xanî ne û ew şîrên destnivîs jî di dawiya meqalê de hatine çapkirin. Hemî heşt şîr in ku çar ji van ji bilî vê kovarê di tu cihên din de nehatine çapkirin û ji vanên li cihên din neçapbuyî dudu ji wan di nava arşîva destnivîs a Aleksandre Jabayî de hene lê

¹²⁵ Ev Mem och Zina bi zimanê Swêdî, varyanteke Memê Alan e û dramayeka radyoyî ye ku bi hev re çap bûne. Robert Alftan ji Îngilîzî wergerandine û Gisbert J’nicke jî pêşekiyek ji kitêbê re nivîsiye ku di vê pêşekiyê de behsa Ahmedê Xanî jî tê kirin. (Binêre J’nicke, Gisbert, "F-rord", Mem och Zin, Revolt F-rlaget, Helsinki-Finlandiya, 1980 r. 5-11)

¹²⁶ Blau, Prof. Joyce; Mémoire du Kurdistan, Paris, weşanên Findikly, 1984.

her duyên din li wê derê jî nînin. Me ev her çar şîr di beşê şîran de dane weşandin û em zelaltir li ser wan rawestiyane¹²⁷.

Her di eynî hejmara vê kovarê de Mehemedê Mela Kerîm meqaleyeka bi navê "Le pêşwazîy bîrewerîy sêsed saleyî Mem û Zînê Xanî da; Bozerslan giyanêkî tazeyî kirdewe be bewrî em şakareyî edebî kurd da" amade kiriye ku li ser nasandina kitêba M. Emin Bozarlan e ku ji esl û kurdiya xwerû ya îroyîn a Mem û Zînê pêkhatiye¹²⁸.

Kovara **Pirs** a ku ji bal hin kurdên rewşenbîr ên Kurdistana Sûriyê tê derxistin, hejmara xwe ya 7-8-ê zivistana 1995-ê - buhara 1996-ê bi tevayî veqetandiye ji bo lêkolînên li ser Ahmedê Xanî bi munasebeta 300 saliya xelasbûna **Mem û Zînê**. Dêrsim/Memo bi navê "Ehmedê Xanî şoreşger û têkoşerê çerxa xwe bû"¹²⁹, Hişyarê Kohî bi navê "Ramana E. Xanî" ¹³⁰, Tengezarê

¹²⁷ *Qeredaxî, Mehemed Alî; "Xiştiyekem le saxtemanî binaxeyî /Dîwanî Xanî/ da be bûneyî sêsedsaleyî Xaniyewe", Rengîn, h. 80, 15 Hezîran 1995 r.10, 11, 27*

¹²⁸ *Mela Kerîm, Mehemedî; "Le pêşewazîy bîrewerîy sêsed saleyî Mem û Zînê Xanî da. Bozerslan giyanêkî tazeyî kirdewe be berî em şakareyî edebî kurdî da", Rengîn, h. 80, 15 Hezîran 1995.*

¹²⁹ *Dêrsim/Memo; "Ehmedê Xanî şoreşger û têkoşerê çerxa xwe bû", Pirs, hejmar 7-8, sal 3, zivistan 1995-buhar 1996, r. 5.*

¹³⁰ *Kohî, Hişyarê; "Ramana E. Xanî", Pirs, hejmar 7-8, sal 3, zivistan 1995-buhar 1996, r. 8.*

Marînî bi navê "Nav û nîşanên (Mem û Zîn)a M. E. Xanî"**131**, Berzo bi navê "Xanî û zimanê kurdî"**132**, Hewarê Gundî bi navê "Durvê Hunerî yê çîroka Mem û Zînê"**133**, Rezo, bi navê "Xwedîkirin û guhdana zarokan di civaka kurdîye kevnar de" **134** meqale nivîsîne.

Dilovan, çar şîirên Ahmedê Xanî, ji nav destnivîsên hin melayan dane ber hev û ew di vê hejmarê de weşandine. Ew şîir di sala 1995-ê de di **Roja Nû** de jî derketine. Me dane ber hev û di vê xebatê de (kitêba min ya binavkirî – Mûrad Ciwan) jî ew dane weşandin. Dilovanî pêşnivîsek jî ji wan re nivîsiye û bi xwe nav li wan kirine ku ev in:

- 1- Xanî Pir gotiye,
- 2- Nexoş im ez,
- 3-Derê meygedeê,
- 4-Bes e ah û esef.

Li gorî pêşnivîsê, wî, di wextê xwe de heşt şîir ji defterên destnivîs ên çend melayên kevn û hêja ên wekî Mele Remedanê Seyyid Sulêman, Evdiyê Kurumî, Ahmedê Seyda nivîsîne û dane ber hev û

131 *Marînî, Tengezarê; "Nav û nîşanên (Mem û Zîn)a M. E. Xanî", Pirs, hejmar 7-8, sal 3, zivistan 1995-buhar 1996, r. 27.*

132 *Berzo; "Xanî û zimanê kurdî", Pirs, hejmar 7-8, sal 3, zivistan 1995-buhar 1996, r. 33.*

133 *Gundî, Hewarê; "Durvê Hunerî yê çîroka Mem û Zînê", Pirs, hejmar 7-8, sal 3, zivistan 1995-buhar 1996, r. 4*

134 *Rezo; "Xwedîkirin û guhdana zarokan di civaka kurdîye kevnar de", Pirs, hejmar 7-8, sal 3, zivistan 1995-buhar 1996, r. 64.*

dîtine ku hemî wek hev in. Li gorî wî yek ji wan wê şîra çar zimanî ye ku berê di **Dîwana Kurmancî** a Abulreqîb Yûsifî de hatiye weşandin, yek ya bi navê "Çardeyê Nîsan" e ku di hejmara 2-3 a 1993-yê a **Aso** de hatiye weşandin, loma cîh nedaye van her duyan û her çarên li jorê binavkirî weşandiye¹³⁵. Dudu di destên wî de mane ku hêvî dike demeka dinê wan jî biweşîne. Ji ber ku ne navê wan ne jî naveroka wan ên neçapbûyî dîyar dike em nizanin ku heta îro ew çap bûne an na.

Kitêbek bi navê **Kurdistan'lı Fîlozof Ehmedê Xanî** di 1996-ê de li Ankarê hat weşandin ku nivîskarê wê Medeni Ayhan e. Nivîskarê kitêbê li gora ku ew dinivîse ev xebat di zîndanê de di bin şertên dijwar de amade kiriye ku ji du sê çavkaniyan pê ve tu tişt li ber destên wî tunebûne. Meriv vê bêîmkaniyê di rûpelên kitêbê de dibîne. Her çendî kitêb li ser jîyan, dewr, berhem, bîr û baweriyên siyasî, felsefî û tesewufî yên Ahmedê Xanî ye jî bi kil û kêmasiyan dagirtiye. Gava meriv wê dixwîne dibîne ku nivîskar ne ku karibûye van aliyên Xanî deyne ber çavên xwendevanan, lê di serê xwe de berê dinyayek xeyalî ava kiriye û Ahmedê Xanî li wê dinyayê aniye. Loma jî gellek fikr û baweriyên ku têkiliya wan bi Xanî re tunene wek ên wî hatine nîşandan. Heta gellek caran hin fikr wek ên Ahmedê Xanî hatine destnîşankirin ku Ahmedê Xanî bi eksê wan difikire. Piştîre diyar e ku nivîskar xwestiye hemû wan zanînên xwe yên di warê siyaset, dîrok,

¹³⁵ Dilovan; "çend helbestên (Xanî) ên nehatine çapkirin", Pirs, hejmar 7-8, sal 3, zivistan 1995-buhar 1996, r. 86.

edebiyat, felsefe û tesawwufê de birêje nava rûpelên kitêbê û têkiliyên Ahmedê Xanî bi wan re deyne¹³⁶. Loma jî mixabin hinde kedeka mezin a di bin şertên dijwar de berhemeka bi kil û kêmasî daye.

Her wiha em ji vê kitêbê tê digihîjin ku girtiyên ji doza PKK-ê ên zîndana Sağmalcılarê a Istanbulê xebateka kollektîf kirine û bi navê **Mücadele Tarihimiz Ehmedê Xanî'yi Anlatıyor** broşurek derxistine ku metnê **Eqîda Îmanê** jî pêre ye¹³⁷. Heta nivîskar di kitêba xwe de perçeyek ji vî metnê **Eqîda Îmanê** dide weşandin lê hema hema di her misrayeka wê de şaşîfî hene. Helbet meriv nizane gelo ev şaşîfî yên broşurê ne lê yên çapa kitêbê ne.

Di hejmar 29-ê a **Mamostayî Kurd** de ku di buhara 1996-ê de derketiye, meqaleyeka Farhad Şakelî ya bi navê "Sêsed Saleyî Mem û Zînî Xanî"¹³⁸ hatiye weşandin. Ferhad Şakelî bi munasebeta sêsed saliya **Mem û Zînê**, behsa wê yekê dike ku Ahmedê Xanî bi taybetî û kurd bi giştî ji alî medeniyet, kultur û edebiyata xwe di nav milletên cîhanê de nayên nasîn, kurd jî ciddî xebatekê nakin ku medeniyet, kultur û edebiyata xwe nas bikin û bi xelkê bidin nasîn. Ew her wiha rexne li wê yekê digre ku siyasetmendên kurd

¹³⁶ Ayhan, *Medeni; K, rdistan-lû Filozof Ehmedê Xanî, Ankara, 1996*

¹³⁷ Ayhan, *Medeni; K, rdistan-lû Filozof Ehmedê Xanî, Ankara, 1996 r.388 û 298-299*

¹³⁸ Şakelî, *Ferhad; "Sêsed Saleyî Mem û Zînî Xanî", Mamostayî kurd, hejmar 29, buhara 1996-ê, Stockholm.*

ronakbîr û edîbên kurdan ji bo berjewendiyên xwe yên siyasî bikar diînin. Di vê navberê re Ferhad Şakelî li ser tarîxa ronahîdîtina Mem û Zînê jî radiweste û îdîa dike ku ne rast e ku meriv sala 1995-ê bike sêsed saliya Mem û Zînê. Li ser van îdfayên wî me zêdetir agahdarî di beşê jiyana û berhemên Xanî de (di kitêa min de ya binavkirî –Mûrad Ciwan) nivîsiye ku hin agahî û îdîa li ser jiyana û malbata Xanî hene ku di cihên din de ez rastî wan nehatime. Di beşê jiyana Ahmedê Xanî de me cih dane van agahiyan jî. **139**

Bibirandinên 300 saliyê

Sala 1995-ê ji alî komele, enstîtu, rojname, hin dezgeh û kesên rewşanbîr ên kurdan ve wekî sêsed saliya ronahîdîtina **Mem û Zîna** Ahmedê Xanî bi semîner, konferans, civîn, sohbet û lêkolînên di vî warî de hat bibîranîn. Pîrozbahî û bibîranîneka wiha cara pêşîn di salên 1992 û 1993-ê de ji alî M. Emîn Bozarşan ve hat pêşkêşkirin. Bozarşan di 21-ê Adara 1992-yê de nameyek şand ji UNESCO-yê re û daxwaz kir ku UNESCO sala 1995-ê bike sala Ahmedê Xanî û bi vî awayî piştgiriyekê ji kultur, edebiyat û hebûna kurd re bike. Wî, her wiha ji hin rêxistinên nivîskaran û dezgeyên zanistî yên wekî unîversîtan re jî nameyek şand û hêvîkir ku piştgiriya daxwaza wî bikin. Her çendî ji bal hin rêxistinên nivîskaran ve piştgirî lê hat kirin jî UNESCO-yê ne ku daxwazek wiha qebûl nekir, bersîva nameya wî jî neda. Wî di 21-ê Îlona 1993-yê de

139 *Cûlemêrgî, Î; "Xanê û Xanî"; Nû Roj, 11-17 çileyê Pêşîn, Istanbul.*

jî nameyek ji rêxistinên kurdan re rê kir û daxwaz kir ku kurd sala 1995-ê bikin sala Ahmedê Xanî û bibîr bînin. Ev daxwaza wî bicîh hat û kurdan di 1995-ê de bi awayên cuda ev salveger bibîranîn¹⁴⁰.

Di 1995-ê de Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê sê civîn li dar xistin. Civîna yekê di roja 26-ê sibata 1995-ê de li Stockholmê hat lidarxistin tê de Mehemed Enwer û nivîskarê vê xebatê beşdar bûn û li ser jiyan, dewr, bîr û baweriyên Ahmedê Xanî yên millî, siyasî, civakî, felsefî û tesewwufî rawestiyan. Cara duduyan di 27-ê Gulana 1995-ê de, li Stockholmê bi navê Konferansa Ahmedê Xanî civîn hat lidarxistin. Vê carê li gel komeleya nivîskaran, Federasyona Kurdan û ABF-a Swêdî jî amadekarê vê civînê bûn. Prof. Joyce Blau, Martin van Bruinessen û nivîskarê vê xebatê bi gotarên xwe beşdarî vê konferansê bûn, ji gellek aliyên de li ser Ahmedê Xanî û bîr û baweriyên wî rawestiyan. Civîna sîsyan cardin li Stockholmê di 8-ê meha dehan a sala 1995-ê de pêk hat ku tê de Prof. Îzzeddîn Mustafa Resûl li ser maneya ronesansê û têkiliyên wê bi Ahmedê Xanî re gotarek da.

Bi amadekirina Komkarê, M. Emîn Bozarşan li 11 bajarên Almanyayê û li Swîsreyê konferansên li ser Ahmedê Xanî pêşkêş kirin¹⁴¹

¹⁴⁰ Bozarşan, M. Emîn; "Mem û Zîn xezîneyek e" Armanç, hejmar4(162), çiriya Pêşîn 1995, r. 6.

¹⁴¹ Bozarşan, M. Emîn; "Mem û Zîn xezîneyek e", Armanç, hejmar4(162), çiriya Pêşîn 1995, r. 6.

Komkar (Federasyona Komelên Karkerên Kurdistanê) di navbera 20-22-yê çiriya pêşîn(oktober) a 1995-ê de li Almanyayê li bajarê Meckenhaimê bi alîkariya Xaç Sor a Alman(DRK) û Weqfa Heinrich Böll(Heinrich Böll Stiftung) bi navê "Konferansa Navnetewî ya Mem û Zînê û Ehmedê Xanî" civînek amade kir. Kesên wekî Prof. Îzzedîn Mustefa Resûl, Prof. Şakirê Xudoyê Miho, Dr. Husên Hebeş, Sabah Kara, M. Emîn Bozarlan, Ahmed Aras, Prof. Celîlê Celîl û Mihemmed Enwer beşdarî vê civînê bûn û teblîxên xwe pêşkêşî vexwendiyar kirin. Teblîxa Prof. Îzeddîn Mustafa Resûl, "Di heqê Ehmedê Xanî de bi giştî agahiyeke bi rêkûpêk" bû. Li ser **Mem û Zînê** Prof. Şakirê Xudoyê Muho ji aliyê dîrokî, Dr. Husên Hebeş ji aliyê zimên, Sabah Kara¹⁴² ji aliyê dîn, M. Emîn Bozarlan ji aliyê hizra netewî, Ahmed Aras ji aliyê edebiyat û folklorê, Prof. Celîlê Celîl li ser berhevkirina nivîsara **Mem û Zîna** Ahmedê Xanî tevî şaxên zargotinê û Mihemmed Enwer li ser rewşa îroyînî de pêwendî û bandûra Ahmedê Xanî û **Mem û Zînê** li ser kurdan dazanînên xwe pêşkêş kirin. Teblîxeka Perwîz Cîhanî jî -herçî ku wî îmkan nedîtibû beşdarî civînê bibe- a ji aliyê civakî û fîlozofî hat pêşkêşkirin¹⁴³. Komkarê pişt re dokumentên vê civînê di nava kitêbekê de çapkirine.

¹⁴² Pişt re beşek ji teblîxa Sabah Karayî di kovara mehane ya bi navê *Nûbihar de derket. Binêre; Kara, Sabah; "Mem û Zînê de Felsefên Hebûnê"*, *Nûbihar, hejmar 37, çiriya Pêşîn 1995, Istanbul, r.3-18*

¹⁴³ *Nûbar, Mehnameya çandî, hunerî, edebî hejmar 37, çiriya Pêşîn 1995, Istanbul.*

Enstîtuya Kurd li Berlînê di navbera 24-26-ê meha 11-ê a 1995-ê de li Berlînê konferansek bi navê "Konferansa çand û hunera kurdî -Ahmedê Xanî-" li dar xist ku tê de li gel hin pirsên çanda kurdî li ser Ahmedê Xanî jî hat rawestandin¹⁴⁴. Hin lêkolîn û meqalên ku di vê konferansê de hatin pêşkêşkirin di hejmara 2-yê a kovara Lêkolîn de ku ji bal vê enstîtuyê tê weşandin hatin belavkirin.

144 *Di vê konferansê de yê ku li ser Ahmedê Xanî û Mem û Zîna wî rawestiyar ev beşdar bûn: Dr. Kemal Mîrawdêlî, Dr. Ali Kılıç, Cemşid Bender, Hüseyin Kartal, Rohat Alakom, M. Emîn Pêncwînî, Mehmet Dewran, Dilbixwîn Dara, Selim Fîrat, Abdurrahman Durre, Joyce Blau, Ahmed Tigris, Îkbal Hacibî, Xemgîn Bîrhat, Ozan Serhat, Î. Şerîf Wanlî û Mehemed Seîd Hesên. Li gorî agahdariyan, Dr. Ali Rîza Arslan ji hatibû vexwendin, lê ew di vê konferansê de beşdar nebûbû*